

Sernivîser
Qado Şêrîn



Derhêner
Xorşîd Şûzî

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî




hejimar '22' - Sibat 2014

شهرية تصدر عن رابطة الكتاب والصحفيين الكورد في سوريا

Cegerxwîn

DI BÎRANÎNA QADÎ MIHEMED

Xakî Kurdistan bi qurban pir ciwan û paqijî
Xwîn rijandin pir kurên te wa li her alî ri jî
Milletê kurd ta ku saxe ew ji vê rê nagerî
Aferî, aferî Qadî Mihemed aferî
Ev ne şerme têne kuştin em di rêça pêşketin
Da Tiroman zani bî em xweş nijad û milletin
Dê bikin em tim bi wî re dijminahî, berberî
Aferî, aferî Qadî Mihemed aferî
Qembera zerra atomî zereyek nabin ji dil
Serxwe najî milletê kurd ta ku ev zencîr li mil
Kes bi lavlav û bi dîlek vî berî nabin serî
Aferî, aferî Qadî Mihemed aferî
Ey Tiroman kuştina Qadî Mihemed ka çi ye
Qey edalet tim wisa ye, hukmê dîmuqratî ye
Lê bi kuştin û bi zindan milltê kurd namirî
Aferî, aferî Qadî Mihemed aferî



Seydayê Tîrêj

BILBILÊ DILŞADÎ

Ey bilbilê dilşadî hela, wer bike fîxan
Derdê me girane ey bira, birîna me kûr e
Gorî te bitin cerg û dil û mêlak ê hem can
Dengê te ye xweştir, ji ney û nay û bilûrê
Sê hawe te deng, yek ji sira bayê siba ye
Hawayê dî ji dengê xuşîna dehl û reza ye
Hawê sisîya ji bihna şemamok û gula ye
Lewra ku li dinyê tu bi nav û tu meşûr e
Karwanê me va bi rê ketî, lê şevreş û tarî
Serma ye terez kulyên di berfê her di barî
Bahoz e çelapek têne me, ji her çar kenarî
Warê me welat e ey heval, rêça me dûr e
Çar hawîr me diz û keleş in, têk dane dijmin
Me ji hev radiqetînin bir bi bir, heyf û mixa bin
Qet çarew umîda me nema ye bilbilê min
Meydan e ji bo hirç û çeqel, gur zûre zûr e
Meydane ji bo hirç û çeqel, rovî û keftar
Gorî te bim bilbil, ji serê darê tu wer xwar
Da pêk ve mijûl bim, bi xwe çend rojên di dijwar
Îro li me ferman e, li ser gerdenê şûr e
Destê tewqeyê îro ku em her du bidin hev
Çend sal û zemanên di xerab jîn em di gel hev
Dinya bi xwe dewran e, bizan geh roj e, geh şev
Geh tarî û dûman e û geh rewşen û nûr e
Dîna xwe bide nik bayê barîn ey birader
Sitêra sibê îro ji şerqê li me da der
Rewşen kirî Kurdistan, bi carek wê seraser
Nîşana sibê ye, fereca xêrê ne dûr e
Piştê wê sitêrê bi xwe berbanga sibê ye
Wê roj hilê rohnî têkeve şûna şevê ye
Karwanê me wê bighêje war û meqsedê ye
Çerxa felekê her dem bi fetl û ger û dewr e
Çexa felekê her dem bi fetl û ger û dewran
Hêvî û hawara me di Yezdanê dilovan
Unîd me her dem bi xwe serdarê li Berzan
Wek Tîrêj dibêje: jîn divê kotek û zor e.



HEVBENDA N.R.K. LI SÛRÎ

XELATA CIGERXWÎN DA NIVÎSKAR KONÊ REŞ



Komîta xelata Cigerxwîn a ji bo afirandina helbestê ya sala 2014an, biryar da ku xelata xwe ya îsal bide helbestvan û nivîskarê navdar Konê Reş, ji ber kar û keda wî ya berdeham di ber çand û afirandina kurdî de.

Xelata Cigerxwîn a ku di sala 2001ê de destpêkiribû, yek ji wan xelatan e ku Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî salane belav dike. Ta ana bi jimarek helbestvan vekiriye, ji wan: Seydayê Keleş, Bêbuhar, Mela Nûrî Hesarî, Mihemed Elî Hiso, Xelîl Mihemed Elî Yûnis, û Ferhadê Iqmo.

Hêjayî gotinê ye ku dê xelat bi bihaneya roja cejna helbesta cihanî di şahiyek taybet û li mala helbestvan a ku li taxa Xerbî li Qamişlo dikeve, radeştî wî bibe .

Di dûv re emê cih û dîroka şahiyê ragihînin

Stokholm
07/03/2014

Birêvebira xelatê

Su'ad Cigerxwîn

Bêwar Barî Teyfûrî

SEROKÊ NEMIR...

MUSTAFA BERZANÎ



Hewildana destpêka şerê ramyarî û cekdarîye a hemberî zebtkarên, nexastîyên, neyarên netewa kurd û Kurdistanêye.

Navê wî ji bo her kesê kurd ên bi şeref wek nasnama netewî evra û zîyarete, di dîroka mirovahîyêda serbilindî û sîyaneta gel ê kurde, senbola azadîya gelê kurd û KURDISTANÊYE, xilaskar û alvanê gel ê kurde ê ku bibû koleyê hezar salan, li bin bandoranda dihat rencandin, di nav sînoranda dihat înkâr û îmhakirin, bi jîyaneke bê şeref ra rû bi rû mabû. Mêrxasî û cesareta wî bû fidana zindîbûna heyîn û hebûna netewî . Ji bo jîyanek bi şeref, bi sîyanet û azad miletek, weletek careke din vegerande jîyanê Di nav cîhanek hov ,bê dad ,dagirker û bê bawer, tarîda bû ronikdarê dîroka miletekî dîrokî û kevna, bû zamîne jîyana gelê xwe ,bû wesîla dostaniya gelan, di dîrok û cîhana durî û xwîn xarda bû rênîşa Azadîya Kurdistanê Azad a hemdemî

Berzanîyê Nemir jo bo gelê kurd SEROK, mêrxas, ramyar, mijara salname dîroka azadîya gelê kurde, şerefa niştimanêye, tacê serê kurdaye, di dîroka Kurdistanê de serokekî altindar, nemir û zindîye. Gelê kurd ji stûxarîyê ,ji sîtemkar û talankarên dîrokê, ji hovên mirovahî yê xilas kir, gelê bindest, paşdamayî gîhande jîyanek bi rûmet, gîhande serbestîyê, cesaretê, ji bo rizgarbûna welat, ji bo azadîya netew kurd dijî dagirkeran seferber kir. Kurdistanê Azad berhem û pêşkêşa şoreşa Berzanî yê mezin ê nemire .

Berxwedan û serhildana bi navê Berzanîyê Nemir va girêday rizgar bûn û damezirandina Kurdistana Azad va hate dawî.

Kurdistanê Azad ji şaristanîke kevna, klasîk berbi şaristanîke modern dimeşe .

Miletê kurd li ser parastina nixên mirovahîyê biryar girtîye, bi vî avayî jîye û jîyaneke bi şeref îro dîrokêda didomîne. Li ser şaristanîke klasîk, li ser çandeke kevna modêrbûneke pêşketî hemdemî ava dike.

Bê şik Gêneral Berzanî qehreman -ekî nemir û navdare. Belê KURDISTANA AZAD BERHEMA CESARETA WÎYE, ji gelê kurd ra XELATA JÎYANÊYE TEWREBILINDE.

Iro gelê kurd û Kurdistan di dijî kevneşopîyê û cudatîyê bûye sînor, bûye alvanê wekhevîyê, bûye altindarê azaya gelan ên HERÊMA ROJHILATÊ.

Gelê kurd li hemberî talankar û sextekarên dîrokê bûye mertal.

GÊNERAL BERZANÎ di dîroka Kurdistanê da nav derekî zindî û bê hempaye.

Mustefa Berzanî navekî evra,
Mêrxasek dîrokî zindîye lewra
Ronahîya kurdan û KURDISTAN Ê
Sembola azaya tim niştimanê.
Bi wî hat naskirin kurd li cîhanê,
Navê wî nasnama kurd, Kurdistanê.
Ji xew rakir millet ji xewa kûr,
Rewşa gel guherî da îşiq û nûr
Serokê serokan navdar, qehreman
Navê wî yê bijî bi dem, dewranan
Serok bêhempaye ji bona kurda

Kurd bi giştî wîra dikin rêz, secda
Wî ji mera hîmê azayê danî
Ji bo gelê berdest bawerî anî
Wî bersîv da dijî neyarê kedxar,
Bû raperîna gel alvan altindar..
Bi ramanên wîva millet dilşad bû,
Bi mêrxasîya wîva millet rizgar bû
Ew bû binelîyê dilê milyona,
Lê bû tîrêj û derd bo cerdevana..
Gelê bê qehreman kole, hejare,
Bindest û bê hêze hêsîr, bê ware.

Pirtûkên Nû

Nasdana Kenê Girînokî Li ser Kurte çîroka Mihemed Hemo



Ev pirtûk, ku dora 110 rûpelan e, bi bergekî qehwerengî, yê ku di ortê de du rûpêçek hene, yek kenok û yek girînok, ji aliyê Dezgeha Cemal Irfan ve, di dawîya 2013 de, li bajêrê Suleymaniyê, bi tîpên Kurdî yê nûjen hatiye weşandin. Va dezgeha rewşenbîrî, bi hevkarîya navenda Margîrêt, li ser erka Dr. Taha Resûl ev pirtûk çapkirîye.

Derhênerê Pirtûkê û bergavakar Azad Ekkaş e, yê hunerî Yasîn Husên e . Ji pirtûkê 500 lib hatîne çapkirin. Ev xebata hêja di saya berpirsiyara giştî, xanima delal Mijde Ebbas Hidayet de, teva bûye . Li ser bergê paşîn, hêja Firat Cewer bi kurtî nivîsandiye, ku Ewrûpî pêşgotina ji pirtûkên çîrok û romanên re nanivîsin, û lew re li gor dîtina wî pêwîstî bi pêşgotinekê nine . Li ser bergê paşîn wûneyekê lêkirî pirtûkê, hozanvan û çêrokbêj Mihemed Hemo heye . ew dostekî hêja û Kurdperwerekî di nêv rewşenbîrên me de naskirî ye. Berê jî min li ser serpêka wî ya helbestî nixandî du caran nivîsandiye .

Tev di serî de, ez hez dikim di vê nasdanê de jî bibêjim, ku rastiya peyvê “çêrok” e, ne “çîrok” e, Mixabin kak Mihemed Hemo jî “Kurteçîrok” nivîsandiye, tew nizamî çima, û ez bawerim, ku hevniştên gundê wî jî dibêjin “çêrok”, ji ber ku ev nav ji “çêrêkirinê” hatiye, bi wateya Qalkirinê, an gotin li ser kirin an jî gotin li pey kirin. Çêrok ne ji çîrkirinê hatiye . Çîrkirin dengnav e wekî çewa derî dike çîreçîr gava nedirist be.

Kurmanciya Mihemed hemo paş 1000 sal din jî li Suleymanî û Hewlêrê bimîne, dîsa jî ya Kurdaxê ye. Kurdax, ew herêma çiyayê Kurmenc e, ku dikeve rojavayê bajêrê Helebê û bi peymanî Firensî-Türkî ya sala 1937ê jî herêma Iskenderonê (Niha: Hatay) hate cihêkirin. Li herêma Çiyayê Kurdan 365 gund hene, giş Kurd in, di nêv de pir hindik Erebi wekî koçkirî û “Hatî” dijîn. Bi egera Erebkirinê, navên gundan û navenda wan, bajêrê Efrîn, hatine guhartin . Bo nimûne, gundê “Nazan” bûye “Elmudellele”, hema gundên li herêmên derveyî “Rojavayê Kurdistanê” nehatîne Erebkirin, tevî ku ewana Erebi in, ne rûniştvanên gundê Nazan, ku tev Kurd in.

Di pirtûkê de, li ser rûpelên 106 û 107 navêd pirtûkên nivîskar hatîne rêzkirin, ku mirov dikane(1) bi rêya wan bêtir li ser jîyan û berhemên lêkirî pirtûkê raweste û bizane.

Nivîsevan pirtûka xwe ya giranbiha diyarî hêja “Mîr Celadet Beg Ali Bedirxan” kirîye, ku rast kesekî mîna wî tew berdestiya ziman û çanda Kurdî nekirîye .


Di vê pirtûkê de, du beş hene, bi hev re 13 kurteçêrok in, bi zimanekî asan û derxistineke paqij van kurteçêrokan derketîne ber rohnîyê.

Bêguman Mihemed Hemo van kurteçêrok bi xwe nivîsandine, hema şeweyê wê nivîsînê ji yê çêrokbêjiya kurdî ya kevnare ne dîr e. Eve jî ji ber wê yekê ye, ku lêkirî di lawaniya xwe de gelek guhdariya çêrok û efsaneyên me yê kurdî kirîye, ew rengê xweşik ji wan hilgirtîye û bi wan çavên rastînêz li civaka derdora xwe nêriye û bi ser de jî wî bi xwe pir ji çêrokbêjiyê hezkirîye û gelek kurteçêrok bi Kurdî û Erebi xwendine.

Ez naxwazim ji we re her tiştekî van çêrokan beloq bikim, da hûn pirtûkê bi xwe bistînin û bi xwe wan bixwînin, pêwîstiya we bi ferhengên zimanî tew nîne, ji ber ku lêkirî çêrokan bi Kurdîyeke zelal, asan û gelek di nêv gel me de belavbûyî, ev berhem ji me re lêkirîye.

Mizgîn Hesko

ROJA KU MÊR TEV GIRÎN



Wê gavê ez pir biçûk bûm, tiştê ku tê bîra min...na...na...tiştê ku dê qet neyê ji bîrkin...dê ta ez li darê jînê bêm di bîreweriyê de alandî bimîne... ku wê rojê jin û mêr, mezin û biçûk, dê û bav pêkve digrîn.

Bê guman tirseke seyr...na pîrhevokeke diran bixwîn ez di nav tevna sehew û tirsê de rapêça bûm. Min qet ne dizanî çî bûye...lê tekez bûyereke mezin bi ser serê gundiyan de hatibû

Dayikên me digrîn, hêsrên wan jinan ne diyardeyeke seyr bû...ji xwe dayikên me yê kezeb sohtî li hincetekê digerin da ku dest bi awazên giryanê bikin, û torînekî di nav pêlên rondikan de bi stranên xwe vejînin...û bejin û bala wî vebêjin.

Lê çima weha mêrên ku li gor normên civakî li gor sinc û rewîştên me yê heyî ku divêt tucarî negirîn.. weha hêsrên xwe şeşe şeş dibarandin...?

Roja 1 ê adara 1997-an bû...ez li qêrîna diya xwe şiyar bûm..min hema xwe avête ûçikên wê - Yadê...

Diya min dehfeq da min û ez ji xwe dîrxistim: Werin wê ji vir bibin....!

Tevgera wê ez bêhtir tirsandim û hema min dît ku qeflek ji jinên gund bi horebanî derbasî hundir bûn.. dayikên me xwe avêtin hev û mihrecana giryanê êdî bêhtir geş û gur bû

Ez jî kelogirî bûm...û bêtir di nav bagerên sehew û tirsê de nuq bûm, matmayî û tenegehiştî mabûm...

Xwîşka min î mezin ku ew jî digrî, ji nişkê ve bi baskên minî biçûk girt û ez ji nav wê xergeleyê dîrxistim...belê min jêpirsî:

-ma pîrka min mirî ye...?

-Na keçê na...xwezka bi pîrka me.

Bi bersivdana wê re hema çend jinên din derbasî malê bûn..xwîşka min ez weha di nav wê heys û beysê de mat hiştim û çû pêşwazîya wan.

Ez reviyam derveyî malê, li ber dîwêr bavê min û refek ji mêrên gund (Musilman, Êzdî, ta bi filehên gund) bê deng, bê axaftin ,bê dan û standin digrîn û hêsrên xwe bi zendên xwe yê badayî zuha dikirin.

Giryê bavan, diyardeyeke hîn diwartir bû, dilê min xumiyâ...kelogirî bûm- ma mêr jî digrîn..?

Û hey lo ji xwe bavê min..!

Yekemîn car bû ku ez wî mêrê kubar, ji xwe razî, paye û rewanbêj weha melûl, bê çar e, tengijî, çav tije rondik dibînim.

-yabo...yabo..?

Û hîna wilo... hevaleke hemtemenê min bi destê min girt û ez dîr birim.Min xwe avête himbêza wê û pirsî.

-Dikim dîn bibim....

çima hemû digrîn..çî bûye ...kî mirî ye....?

Hevala min hema bi lez destên xwe danî ser devê min

-Hişşşşş...dibêjin bavê mezin îro mirî ye.

- bavê mezin.... kî... haaa.. ango bavê mezin serokê kurdan Barzanî....?

-Erê keçê...dibêji n... mala me xirabû....serokê me mirî ye

- Na ...serok na mire... tu çî dibêjê...?

- Belê...mixabin... nûçe raste ...di radiyo yê de jî tezekirin.

- Barzanî, xwedîyê cêba reş...qelem zêr ...ku di dîlanan de dîlok an li ser dibêjin.

- Erê welah hevalê

- Ka were... em ê wêneyê wî bînin.

- Ji kû....li ba kesî wêne nîne...bavê min jî Barzanî ye...lê wellah wêneez dibêjim wî ne diwêrî wêne peyda bike û vehewîne malê....dê Ereba me bigrin.

- Were...di bixêriyê de bavê min wêne diveşêre...were em wêne derxin...û em ê têr wî maç bikin.

Ez û hevala xwe û komek ji zarokên gund yê li me civiyabûn derbasî bixêriyê bûn û min bi lez ax bi tiliyên xwe xepart û wêneyê dinav aleke rengîn de û di kîsekî naylon de veşartî derêxist û da destên zarokan...yeko yeko me ew maçkir û me berê xwe da derveyî male.. em ber bi refên bavan ve...wêne û ala rengîn di destên me de bi stran hatin.

(Cêba Berzanî reş e welatê min...welat welat dimeşe welatê min)

Û hema me dît ku govendek keç û xortên gund ji taxa jêr ber bi me hatin

(Herne pêş herne pêş... dem û dewr ya me ye

Welat çav li rê....bendewarê me ye)

Dayikên me jî bi tililî ji male derketin û dest bi dîlokê kirin:

Ez keçike kurdî me ho yeman û yeman sêva sor û spîme ho yeman e Xwedê

Barzanî bavê me ye ho yeman û yeman.rêber û pêşmergeye ho yeman e Xwedê)

Bavên me êdî li hev nerîn û berê xwe dane dayikên me:

Ey reqîb her maye qewmê kurd ziman

Naşike û daneyê bi tope zeman

Naşike û daneyê bi topê zeman

Kes nebê kurd dîmir in

Kes nebê kurd dîmir in

Kurd jîn dibin

Jîn dibin qet nakevê ala Kurdan

Beyar Robarî



Beyannameya serxwebûnê çareya hemû aloziyan e

Va dehe sal zêdetir hene, kû rêjîma Sedamê xwûnmij têkçuyî û ta niha em dibînin nekokî û aloziyên navbera Başûrî Kurdistanê û hukmeta navendî bidawî nabin û her rojê zêdetir dibin. Hukmeta navendî nexwaze yasek tenê ji ew yaseyên kû herdû layan li ser îmzekirinê bicî hûne, gor hin yase dustûrîne weka xala 140 ji destûra bingehîna Êraqê!!

Hukmeta Şîhiyan (Malkî û berî wî Îbrahîm Cehferî) bawerîya xwe bi dêmokrasî û mafê Kurdan tunene û naxwazin mafê Kurdan pêdin. Jiber wê me dît her demekê alozîk nû peydadikin, jibûna tiştên jê tene xwestin bicî nînin.

Wek zagona pitrol û xazê û bûdceta pêşmergan û kêşeya navçeyên kurdî, kû hîn li dervayî herêma Kurdistanê dimînin wek Kerkûk û Şêxan û Mendelî .

Û aloziya navbera Kurdan û hukmeta Şîhiyan piştî nexweşîya birêz Celal Telebanî kurtir bû, jiber kû cîgirê Telebanî Şîhî ye û wan posta serok dewletê ji xwe re bikaranîn.

Û aloziya dawîn kû Nûrî Malkî peydakirî li dijî gelê Kurd, birîna mehaniya karmendên hukmeta Başûrî Kurdistanê .

Gor ev gav dijî zagone û ji mafî Malîkî tune mehaniyê xelkê bibire, lê dîsan jî ev pêkanî. Herwisa ev yeka li gor ola Îslamî hamoşe (yanê herame) û gunehbarîk mezin, jiber Îslametî dibêje: Birîne stûyê mirovan û nebîrîne xwarina wan.

Li gor bîrûbawerîya min be, hukmeta Şîhî û hin hevbalbendên wan ji Suniyan di pilana wan de, kêşeyên navbera xwe û herêma Kurdistanê çareserîbikin. Ew li şona wê dixwazin carek din Kurdan di bin kontrola xwekin wek dema Sedem.

Û me bi çavên xwe dît çawa Malîkî hêzên xweyên leşkerî kişandin ser sînora herêma Kurdistanê berî çend mehan û gevgurî dan Kurdan û serokatiya herêmê birêz Meshûd Berzanî.

Jiber wê ez dibînim ti rê jibîlî raguhandina serxwebûna Başûrî Kurdistanê li pêşîya gelê me li vî perçî tune. Ev gava tenê kane çarakê ji va aloziya di navbera herêma Kurdistanê û hukmeta navendî de bidawî hûne. Ger Kurd vê gavê navêjin kîjan rojan be Kurd û Ereban (Şîhî û Sûnî) wê li rûyê hevdû bi çekan biseknin.

Wek ez dibînim hîro dem hatiye, kû Kurd serxwebûnê li vî perçî Kurdistanê pêkbînin û ji va aloziya tede xelasbin û welatê xwe bi şewak azad avakin.

Û çêtirîn roj jibo vê bûneyê roja 21 adarê ye .

Her Newrozek gelê meyî bîndest xweş û şad be û Newroza we hemîyan pîroz be.

Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

wergera ji erebî: Mustefa Reşîd



Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî - Xelek 6

Ola Zerdeştîyê di Çarçewa Dijberiya Mad û Fars da



Wek rewşa hemû olên din, bi derbasbûna deman ra, baweriyên pûtperestiyê, çi anîmîzîm û çi totemîzîm û pêra çîrok û efsaneyên nîgashî (xeyalî) derbasî *Ezdayiyê* (*Mezdeyiyê*) bûbûn. Ji çîna □îr û rêberên olî yê wê demê ra "Mog" dihate gotin . Vê çîna *Mogan* bi demê ra êdî bêhtir li kelk û berjewendiyên xwe temaşe dikirin û pir kesan ji wan dest bi karên sihirbazî û fêlbaziyê kiribûn. Ji ber vê rewşê ola *Ezdayiyê* êdî li şûn giyanê demê mabû û nikarîbû hevaltiya rewşa nû ya civaka *Ariyanî* bikira.

Zerdeştî û Baweriya Yekxwedayiyê:

Wek ku hatiye gotin, peyximber *Zerdeşt* li ber *Berê* (*zinar, hîm*) *Qadirî*, li kenarên gola Ûrmîyê ji dayîk bûye û ji salên 660 heya 583 b.z. jiyaye . Hin kesên din jî salên 630 heya 553 b.z. yan jî 628 heya 551 b.z. wek dema jiyana wî nivîsandine . Gava ew bûye 40 salî êdî peyximberî ragihandiyê û hewldaye ku gelê *Mad* bîne ser ola xwe. Wek çawa li hemû peyximberên berî wî û piştî wî jî hatiye; gel di destpêkê da ev hewldana wî ne pejirandiyê, êriş aniyê ser wî, bera wî daye û wisa neçar bûye ku here herêma *Bakhtiriya*; ew herêma ku navenda wê bajarê *Baxtir'e* (*Belx*).

Ev herêm niha di navbera Tacîkistan û Afganistanê da parvekirî ye . Serdarê wê herêma yê bi navê *Heysthasp* (*Heşt Esp*) ev ola nû pejirandiyê. Wisa tê gotin ev kes bavê *Darayê Yekem* yê *Padîşahiya Axemîni* bi xwe ye⁽¹⁾.



Wêne yê
Peyximber
Zerdeşt

Peyximber Zerdeşt careka din yekxwedayî vegerande *Ezdayiyê* û ola wî bi navê *Mezdayesna* hate naskirin. Navê Yekxweda jî kire *Ahora Mezda* (*Oremezd*). Ev bi zimanê Avestayî tê maneya (*Birêz, Payebilind, Bîrdar*). Ew xwedayê xêr û ronahiyê ye û kana her tiştê spehî û her tiştê bi sûd û feyde ye⁽²⁾.

Dîroknasên wek *Geoffrey Parrinder* û *John B. Noss* dibêjin: „Ew ola ku *Zerdeşt anî*, ola yekxwedayiyê bû û di warê sincî û rewîştê da yekane bû. Gava *Zerdeşt* bi navê *Xwedayê Bala Ahora Mezda*, *xwedayê Bîrdar axîvî*, *tiştêkî nû neanîbû holê*, ev nav di nava gel da naskirî bû. Ev *xwedayê ku Zerdeşt ew destnîşan dikir di wê demê*

da ji her kesî va dihate naskirin“⁽³⁾.

Dîroknas *Ammareh Necîb* dibêje: „*Ola zerdeştîyê di bingeha xwe da oleka yekxwedayî ye, ew doza perestina xwedayekî yekane dike; ew şerê pîrxwedayiyê û perestina pût, stêrk û hêzên surîştê dike ku di wê demê da li welatê Fars belav bûbû. Hemû dirûz (dua), nimêj û pendên wê yê pîrozî tenha ber bi vî xwedayê yekane va dihatin gotin û şandin*“⁽⁴⁾.



Perestgeha Zerdeştî li bajarê Yazd

Lê hebûna *Ehrîman* (*Engereh Mayno*) di *Zerdeştî yê* da wek hebûna *Satan* (*Îblîs*) di *Cihûtî, rîstîyan û Îslamîyê* da ye .

Ew sûcê "*Perestina Agir*" ku hin kes diavêjin ser *Zerdeştîyê* ne raste û bê bingehe. Ji ber ku roj û agir wek nîşanên ronahiyê yê Xweda ne û pîrozbûna agir di *Zerdeştîyê* da wek pîrozbûna *Kevirê Reş* di *Ke'be* bajarê Mekkê da ye. Gelo gava misilman li dora *Ke'be* digerin û bi *Kevirê Reş* tewaf dikin, tê maneya ku ew wî wek xweda dibînin? Helbet na. Rola agir jî di *Zerdeştîyê* da wisa ye⁽⁵⁾.



Zerdeştî di dijberiya Mad û Fars da:

Ji bûyerên dijberiya navbera *Mad û Fars* da tê xuyakirin ku *Ezdayî* baweriya fermî ya civaka *Madan* bû. Navê *Pîrê Ezdayî Mag* (*Mug*) bû ku vedigere ser êla *Magî* (*Mugî*).

Ev êl yek ji êlên *Mad* bû ku berpirsyara kar û barên olî bû; wek êla *Lawî* li ba *Cihûyan* yan jî êla *Qureyş* li ba *Ereban* berî dema *Islamîyê*. Dîroknasên Yûnanî navê (*Mag/Mug*) bi awayê *Magos* gotine. Ji lewra, ev gotin bi awayê "*Mecos*" derbasî zimanê erebî bûye; û wisa *Ereban* navê *Mecosî* avêtine ser hemû olên *Arivanivan*⁽⁶⁾.

Farisan di warê ramanî da ola *Zerdeştîyê* wek îdeolojî li dijî padîşahê *Madan Ezdehak* bi kar aniyê û dikanîbûn hin serleşkerên mezin yê *Madan* bi ser xwe va bînin; û wisa padîşahê farisî *Kohreşê Duwem* sala 550 b.z. zora *Ezdehak* bir û xwe kir padîşahê *Emperatoriya Madan*. Faris xebitîn ku *Ezdayiyê* ji holê rakin û *Zerdeştîyê* têxin cihê wê. Herwisa jî xebitîn ku nav û dengê *Magan* xirab bikin. Beşekî biçûk ji *Madan* ji vê dek û dubareya *Farisan* haydar bû. Yek ji wan Magê *Madan Gomata* (*Gewmata*) bû. Wî serhildanek li dijî padîşahê farisî *Qembêzê Duwem* sala 522-an b.z. pekanî û hewlda ku *Zerdeştîyê* ji holê rake.

Di vê derbarê da *William Durant* dibêje: "*Serhildana Gomata li dijî Farisan ji aliyê mirovekî oldar bû, alîgirê ola Magosî ya kevin bû û wî bi her awayî xwestiyê ku Zerdeştîyê wek ola fermî ya Emperatoriya Farisî ji holê rake*"⁽⁷⁾. Ji gotinên *Darayê Yekem* (*Darius*) tê têgihîştin - piştî ku agirê serhildana *Gomata* vedimirîne - ku di heft mehên serdariya *Gomata* da ferman hatiye dayîn hemû perestgehên *Zerdeştîyê* bêne kavilkirin. *Darayê Yekem* dibêje: "Ew perestgehên ku *Gomata* kavil kiribûn, min careka din ew wek berê avakirin"⁽⁸⁾.



Darayê Yekem, padîşahê Farisan

Darayê Yekem têkçûna serhildana *Gomata* kire behane, û rabû bi piştgiriya alîgirên xwe yê *Faris* dest bi qirkirina *Magan* kir. *Herodotus* di vê derbarê da dibêje: "*Û rabûn dest bi kuştina her Magekî kirin ku raste wî dihatin, û Farisên din jî amdebûn ku bidin ser şopa wan, xençerên xwe li her Magekî didan ku bi ber çavên wan diket. Mabû ku êdî koka Magan tevan bînin. Bi daketina tariya şevê ra qirkirin hate rawestandî û ew roj di *Salnameya Farisî* da bû rojeka navdar. Wan di wê rojê da her sal şahî bi navê qirikirina *Magan* li dardixin. Di wê rojê da nedibû ku kesekî *Mag* li dervayî malê bê dîtin; hemû di malên xwe da diman û dervediketî derva*"⁽⁹⁾.

Bi van bendkirin û êrişan û bi karanîna zorê li dijî *Ezdayiyê* ji aliyê padîşahên *Farisan* va êdî li pir herêman *Ezdayî* ji holê hate rakirin û *Zerdeştî* ket cihê wê. *Zerdeştî* êdî bû nasnameya çandî ya *Emperatoriya Farisî*. Parastina *Zerdeştîyê* bû maneya parastina nasnameya *Ariyanî* li dijî êriş û

dijminên dervayî. Ji lewra jî, gava *Emperatoriya Aşxanî* li dijî serdariya Selukî-Yûnanî sala 250-î b.z. hate avakirin, wan jî *Zerdeştî* hêşt, tevî ku ew bi bingeha xwe ne Faris bûn. Tê gotin ku ew ji bermayên Skîtan bûn ku ji bakurê *Derya Reş* hatibûn û di sedsala 7-an b.z. da talan anîbûn welatê *Ariyanan*⁽¹⁰⁾.

Divêt em bêjin ku *Zerdeştî* ola dewletê ya fermî bû di dema *Emperatoriya Sasanî* da jî (226 - 651 z.). Rola serokê oldaran *Mobez (Mobezan)* di binavkirina padişahê nû da wek rola *Papayê Vatikanê* bû. Tevî ku malbata *Sasanî* di bingeha xwe da Kurd bûn, wek *Teberî* jî dibêje. Lê belê ew di warê çandî da wek Farisan bûn, ola *Zerdeştî* wergirtibûn û bûbûn parêzvanên *Zerdeştîyê*⁽¹¹⁾.

Zerdeştî bûn, ew ne kafir û ne jî pîrxwedayî bûn.

Lê tevî wê jî welatê wan bû armanca talana erebî-îslamî. Lê belê ev talan çawa pekhatin?. Emê li ser vê mijarê di xelesa dahatî da binivîsîn.

Jêder:

- (1) Samuel Kramer. Efsaneyên Cihana Kevin, rûpel 294. Hamid Abdulqadir: Zerdeşt Peyxemberê Pêşiyên Îraniyan, rûpel 29. Dyakonov: Media, rûpel 340, William Langer: Kana Dîroka Cihanê, 1/91
- (2) Avesta rûpel 37. Dyakonov: Media, rûpel 57. Geoffrey Parrinder: Baweriyên Olî li ba Gelan, rûpel 123. Herbert George Wells, Kanên Dîroka Mirovatîyê, 3/750. Norî Ismaîl, Ola Zerdeştî, rûpel 9.
- (3) Firas Al-Sewax: Kana Dîroka Olan, pirtûk 5,

rûpel 30.

(4) Immareh Necîb: Mirov di Siya Olan da, rûpel 246.

(5) Derbarê Îblîs, perestina rojê û agir li Hamed Abdulqadir temaşe bikin: Zerdeştî Bîrdar, Peyxemberê pêşiyên îraniyan, rûpel 11 - 113.

(6) Dyakonov: Media, rûpel 143, 146, 383. Herodotus: Dîroka Herodot, rûpel 80.

(7) William Durant: Çîroka Şaristaniyê, 2/406

(8) Dyakonov: Media, rûpel 401.

(9) Herodotus: Dîroka Herodot, rûpel 255 - 256.

(10) Herodotus: Dîroka Herodot, rûpel 298. Dyakonov: Media, rûpel 250.

(11) Al-Tabari: Dîroka Tabarî, 2/39. Mehmûd Şit Xettab: Rêberên Vekirina Welatê Faris, rûpel 23.

Muhsin Abdulsahab Al-Muzaffar: Erdnîgriya Baweriyên û Olan, rûpel 257.

Ji bo bîranîna Seydayê Tîrêj,

SEYDAYÊ TÎRÊJ DI ÇEND RÛPELAN DE (kurtejiyan û dem)



Ey hevalê minî rind

Çi li bajêr, çi li gund

Xewna te ya pîr giran

Ji bo laşê te derman

Çi xewneke rast û xewş

Dilê te pê maye geş ...

* * *

Wê xweşxwanan bixwênî

Çavê dijmin derênî

Ew xwendin û zanebûn

Nîzik dikin serxwebûn

Xortên wek te pîr zana

Gerek bêjin nezana

Bere destên hev bigrin

Di vê rêkê de bimrin

Belê.. her wiha jî helbestvanê gewre Cegerxwîn evan gotinên nazik dibêje û bersiva Nayifê Heso dide, yê dawî bi çoşek mezin tê nasîn li nav gelê xwe bi navê : Seydayê TÎRÊJ .. Ew xwediyê gava çeleng, ku di rîya helbest û torevaniya Kurdî de avêtiye..

Di derbarê helbesta Kurdî de, di vê dema dawî de, bi zaravê Kurmancî dest pê kir, bi du navdarên gewre: Yek jê Seydayê Cegerxwîn bû û yê din jî Seydayê Tîrêj bû.. Bi rengê klasîkî, berê xwe dişopîne û di derbarê vê yekê de, carekê wisan bi vê wateyê dibêje:

(Ez li helbestê bi rist, awaz, rêzband û li naveroka wê dinêrim... Ev her çar tişt wê dikin helbest)

Kurte helbestekê davêje ser mebesta xwe û dibêje:

Ma rûmeta şî'rê çî ye ?

Ne d' xizmeta millet de bî

Ronahiya şî'rê çîye?.

Pesnê welat ku tê d' nebî

Çibkim ji wê şî'rê rijî

Danegire sewdan û mejî

Derdê dil û can nakujî,

Çaxê ku cewher têt'nebî

Ji vê yekê xuyaye ku Seydayê Tîrêj, rengê helbesta hilbijartiye ji şeweyê kilasîk e.. Tev bi êş û azarên millet û welat girêda ye, û nexasim yekî welatparêz be, ku karibe hest û daxwaz û hêvîyan, wiha bi cih û war bike, bi zimanekî pak û rind, û bi raman û dilekî paqij ...

* * *

Hilbestvanê Kurdî gewre Seydayê Tîrêj, li gundê Nicim ê nêzîkî bajarê Qamişloka rengîn , ji hêla rojava navbera wê û bajarê Amûdê ve, yanî li ser rîya navbera herdiwa de, ya ku 10 k.m roavayî dorî Qamişlokê ye, ber sînorê Sûrî-Turkî hatiye dinê û ji dayik bûye, li Kurdistana beşê Sûriya, di sala 1923 an de..

Bi navê duristî: Nayifê Heso ye.. kurê Biro, ji êla û eşîra Bobilana ye.. Lê bi navê Kurdî şêrîn li nav gel hatiye nasîn bi navê: Tîrêj, û ji ber hezkirina gel jêre, dibêjinê mamosta Tîrêj, an seydayê Tîrêj.. û bi rastî wî jî tîrêja xwe avêtiye dil û mejiyê gelê xwe .

Ji malbatek cotkar e.. ji maleke gundî û hejar e, ango bê erd û emlak e, û bi xwe jî biçûkê birayê xwe bû, herwiha di jiyana temenê şeş-salî de, ji gundê Nicim koçdikin û diçin gundê Sêmitika, û gava ku li wir bi cih û war dibin dere ber Melle,-wek heyamê berê- li ber destê Mellê gund (Ibrahîmê Golî) xwendina olî - Quranê û çend pirtûkên olî û tiştin din dixwîne , heyanî sala 1937ê.

piştî Melle hin şanê zîrekî tê de dibîne û bi temîna Mellê xwe, diçe bajarê Amûdê û xwendina

Mektabê Fermî dixwîne, ta bi rêza pêncan ..an ta sala 1943ê. û li ber destê wan mamosteyên gewre, yên wê demê, wek : Qedrî Can, Hemze Beg û Meksîyê di wê demê de; berpisyarê Mearif (goçela perwerde kirinê) bû li welatê Sûriyê, çaxê dagirkirina Firinsa li welatê Sûriyê.. û bi xwe Meksî yekî girîngtirîn bû di şoreşa Pêx Seîdê Pîran de, di sala 1925 ê li derdora bajarê Amedê.

Û li wê navbera zanistî, pîr tişt naskir, pîr navdarên milletê Kurd naskirin, ew welatparêzên çak û ronakbîrê demê, mîna: çegerxwîn, Osman Sebrî, Nûredîn Zaza, Qedrî Can û Mellayên Kurd û pîrrin dî .. Bi rastî li wir, ruh û hestê welatparêzî li cem bi xurtî afirî û çêbû.. û di bin akama wan navdaran de jî, evîna helbest nivîsê li nîk wî şax veda, ku da bi tor û wêjê dikaribe rolek mezin bilîze, di nav tevgera milletê xwe de .

Lê xuya ye ku, Seydayê Tîrêj bi şeweyê Cegerxwîn hatiye girêdan, piraniya dema xwe pêre dibûrand, ta ku tevî (Koma Ciwanên Kurd) bûye, di rojên xweyî pêşîn de, çaxa damezirandina wê de, lê mixabin.. Piştî heyvekê hate pişaftin, bi şerpola Turkan li dagirîya welêt Sûriyê: destgirta Firinsa..

* * *

Bi rastî wan dema çarîka pêşîn li papelîska bîstan û gava şerê Imperetoran dest pêkir, nexasim şerê cihanê yê pêşîn, li nav ewan dewletên dagirkeran? piştî serketina hinan û daketina hinan, pîr tiştên nû li darketin, yek jê hin dewlet çêbûn, ku berî hingê ne li ser nexşa cihanê bûn, û hin wek gelê Kurdan milletekî bindest ma .

Lê mexabin çerxa felek.. milletê Kurd xwe dît dûtî parên ji sepêhatî yê vê buyera mezin ve, tew nexasim milletê Kurd xwe dît parkirî çar perçe, li nav çar millet û nejadan.

Ev yek ji hêlekê û ya din jî ew bû ku di bin akama şoreşa oktober ya sosyalist, li qada Sovyatê gava ku li darket, sala 1917an de, her wiha jî, ramanin nû daketin nav milletan bi rengê serxwebûn û xoybûn, bi navê pêşketinê û wekhevîyê, ji ber pîr dixî ketibû navbera Beg û Axa û yên bi wan re mîna şêx û mella ji hêlekê, û navbera hejar û

belengazan mîna, cotakar û karkiran ji hêleke din ve.. lewra gelê Kurd dest bi xebat û tevgera xwe kir ji ber xwe ve.. û her wiha, em naxawiz pir div-dirêj bikin ji ber ev ne mebesta meye .

Di bin akama van raman û buyeran de, Seydayê Tîrêj bêçar ma karê bidizî bike, û di sala 1938 an de, tevî tevgera rêxistina Komela Xoybûn dibe û dest bi kar-xebatê dike, ta navbera salên 1941-1943 an, gava bibû belavkirê belavokan li gelê herêma Kurdistanê, ta digihand qeza Mêrdînê û deşt û çiyayê wê, helbet van belavoka gel hişyar dikirin, ta ku çelxa Turkan aciz bû ji van tevgeran, ta carekê bi xwe cih li Seyda teng bû, da ku Cendîrme wî negirin, cilên jinan li xwe kir, da ku ji dest wan rizgar bibe, li bajarê Mêrdînê bi xwe.. ta dawîya rawestina Komela Xoybûnê û pişaftina wê , piştî hate girtin û yesaxkirin dema koçkirina Firinsayê û tewakirina dagerkeran ji xaka Sûriya ve .

Belê bi rastî ew salên ji 1937-1946 an, ji jiyana Seyda bi tevayî wêna xwe jê naskir û riya paşeroja xwe jî girt, çî ew raman û hest ji hêla çandayî, an civakî û konevanî, an ew tekoşîna siyasî, ku bi kar û xebata gel û welat hate girêdan, ta dawîya jiyana xwe .. Wî jî kar-xebata xwe tev gelê xwe, bo welatê bindest û çar perçe kardikir, ku karibe tev rêxistin û sazêyên wê, milletê xwe ji zor û sitema dijminan azad bike .

Bi xwe wan ramanan û him jî wan bûyer û tevgeran, giyanê welatparêzî û him jî millet perwerî bi xurtî li cem Seydayê Tîrêj çêkir, ku ji bo berxwedan û xebatê bike, da li gor demê bin û ji vê yekê jî dest bi karê hêz û konevanî kir, gava tivlî xebata Komela: Xoybûnê bûbû, bi dilekî soz û germ, ji wê çaxê de Seydayê Tîrêj temenê xwe tev de, xist xizmeta gelê xweyî bindest de.

Lê îca tevî xam û pênuşa xwe û rist û helbestê xwe bi hest û ramanan pêça, û xwe avêt nav gel.. çî bi şeweyê helbestê ve, çî bi hêla çîrok û folklorê ve, ew daxwaz û doza yekîtî û berxwedanê dikir hertim, çî bi evîni û çî welatî bana, bi hestekî naz û durist dihûnand ewan hestên xwe.. da tohîlan hişyar û şîn be.

Ta bi xwe jî, Seydayê Tîrêj bû yek ê dudiwa ji mezintirînên toreya Kurd li Sûriyê, piştî helbesvanê mezin Cegerxwîn, bi şeweyekî resenî, wek çawa Cegerxwîn ew bersiva navdar bonî wî da .

Bi wî şeweyê nû li darket, çî çandayî, çî civakî, çî netewî.. Belê bê ku bête jibîrkirin cora evîni jî, çimkî helbestên Kurdî bê stranî nabe – belê mebesta min ne ku stran bi xwe – lê awaz û rim tede heye bê goman ji ber naverok, bi movik û rêz û bende , pir bi vî rengî li gasînê dibû, ji ramanê azadiyê û serxwebûnê, daxwazkirê yekîtiya gel û hev girtin û xebata wî bû, bi rastî tevî ruhê helbest û toreya Kurdiyati bû, di jiyana wî de, ku bi bîr û baweriya karê rola konevanî dikir tevî xam û pênuşa çak bi tore û ristê ve.

Wekû tê zanîn, yekem helbest rist û nivîsî, ew jî di sala 1943 an de bû, gava ku xwest here Beyrûtê, cem Mîr Kamîran Bedrxan, perpisyarê govara Ronahî, Stêr û Roja Nû, nexasim govara Roja Nû.. Bi daxwaza hevalbendê Komela Xoybûnê.. Bi hevalê xwe re, Osê Hersan re, ew helbesta yekem Nivîsbû bi navê:

“Kerwanê Dewletan” bû, Ji wê çaxê jî, tîkeli di navbera wan de çêbû, ku di wan govaran de dinivîsî

û belav dikir, û herûher bihtir bi ziman û çanda Kurdî hate girêdan.

Belê.. Piştî herfandina Komela Xoybûn, Seydayê Tîrêj xuyaye bê tevger neditebitî, çimkî tevî partîya: Koministê bibû, bi tevgera wê demê, tev hevalê xwe û serekê tevan Cegerxwîn, ta demekê ku di sala 1952 an de, di çaxa serokê Sûriya; Edîb Dîşeklî de, hat girtin bi êş û sikince demekê ket zindanê, bi vê girtinê.. hin berhem an pirtûkek ji karê wî, talan kirin wan şovînyên wê demê, bêy ku zanibin çî talan û bindest dikin, tevî çend pirtûkên mitalî jî pêre, dûvre .. piştî Seyda ji zindanê Derdikeve, dide pey berhemên xwe, ku karibe vegeerîne, li vir û li wir, bi pirs û daxwaz, û alîkariya viya û wiya, ta carekê bi temînî çû cem perpisyarê (Em), yê ser destê wî hate girtin û talankirin, û çawa soz dayê ku jê re vegeerîne, lê mixabin ew soz neçû serî, çimkî ew kes mir û ew ta qetîya, û pêre berhemê pirtûkekê wînda bû, xuyaye -mixabin- ta bi ebed.

Lê ev ne tenê mebesta wî bû, ku dema partîya Kurda damezrandin, di sala 1957an de, tîkeli pêre bi xurtî danî, lê ne bi endamî, belê wek hevbendekî dilsoz..

Û wiha da em vegeerîn disan bi hev re jiyana Seydayê Tîrêj bişopînin.. Ji ber mercên aborî xwendina xwe kuta nake û vedigere, piştî kutabûna niv xwendinê, li Amûdê sala 1943 an hate gundê Girkeftar û lê bû Melle, çend salan ew û hin ji malbata wî .. Ji wir jî barkiriye, di sala 1957 an de, an bijêre û li gundê Ereba: Sekfan bûye nivîskar û Melleyê gund .. Berpisyarê gund serekê Eşîra Cibûriya: Ebdilezîz El-Muslit bû, û li wî gundî jî li hirêma Hisîça bi temamî, nêzikî bîst û pênc salan didûmîne, û dawî ji wir xwe bar dike bi malbatî, diçe bajarê Hisîça, ew jî di sala 1971an, li taxa Ezîziyê, beşê Salihîyê li gundê Miftî bi cih û war dibe, û bi coşeke mezin di derbarê helbesta kilasîk de ji dil dişopandîne, ji ber pir gavin çak, di tor û wêjeya Kurd de avetîye, bibû dengêkî pêwîst di resenîya helbesta Kurdî de , ne li Sûriyê tenê, bi baweriya min li tevaya Kurdistanê jî, belê piştî belavbûna helbestên wî bi stran û awaz bûn ser zimana.. û nexasim :

Ey bilbilê dil şadî hela were bike fixan

Derdê me pire ey lo bira birîna me kûre..

Di wê salê de jî, wek me gotî bardike gundê Sekman, nav êla Cibûriya, ta ji wir jî bardike bajarê Hisîça di sala 1971an de, ta tevî rêza Partî dibe, li wir ji nûve.. Pir pê xweş tê ku miletê Kurd rabû berxwedanê.. û pir kêfa xwe anî bi Barzanî ku şoreşa başûrê Kurdistanê li darxist, bi rist û sirûdan pesnê şoreşê dida, tev şîn û şadîyên welatê xwe, çî cejnên Newroz an avdarê bana, çî navdar û pêşmerge û şehîd bana , û çî keç û jinên Kurd bana, tevayê azadî û serxwebûn û wekhevî bana.. hd .

Bi xwe Seydayê Tîrêj dilsozekî pakbû, bo doz û daxwaza gel û welat, ji ber tevî xama xwe di riya wê de bû, ji vê pêve nizanîbû ,.. û dida xuyakirinê da ku helbest û helbestvan serkêşê civaka xwe be, êş û azêrê wî bi ziman bike û bide xuyakirinê, çî cejn û kêfên wî, serketin û serpêhatîyên wî xuya bike, ji ber eve rola rewşenbîr û nivîskaran .

Ev welatparêzî xuyaye di tevaya berhem û erkê pirtûkên wî de, pir bi şopemayên xwe ve dişopand ji tore û çanda Kurd, mîna ristên Mellayê Cizîrî û distana çak “Mem û zîn” ya mîrê helbesta Kurdî resen Ehmedê Xanî û nexasim mamoste û him jî hevalê riya wî Cegerxwîn, yê pir jê vedida û pir ketibû bin akama wî de, tevî bi xweşî helbestên kilasîkên Ereban yê giran dixwendin û pir caran ji Mutenebî û Ebû Ela Elmierî û Entera. Yanî navdarên Erabên Kilasîkên mezin, xwedanê Mueleqatên kevna dikir .

Bi rastîya xwedê, Seydayê Tîrêj, destê wî sipî bû di alîkariya xortên nû hatî de, ku pir caran xweşgotin dida wan, bi hêvîbû ku wê şûna wî, vala nemîne û her wê riya helbest û tore û çanda Kurdî bigihînin asteke berfirehtir û herdem digot di civînen xwe de: bixwîn in û binvîsîn in, çî nûjin û çî serbest be, yan kilasîk û rêzband be, çî bi zimanê Kurdî be, yan bi zimanê biyanî be, ji ber ku Seydayê Tîrêj bawermend bû, çimkî xortên ku bi vî karê şaristanî radibin Kurdin, wê bi xwe berhemên wan jî bi Kurdayetiya xwe diyar bikin, û wê tîkeli xizmeta tore û çanda Kurd de, çî xort û mijûlên bi helbest û akama xam û pênuşê.. Seydayê Tîrêj, dest li piştê dixist û pir caran pêşgotin ji berhem û pirtûkên wan re dinivîsan, dinivîsî bê dixî, xwe li ser kesekî mezin nedikir, wekî pir tawûsan li nav me, çimkê ew didîtin şaxin ji dibistana xemilandî ..hd.

Berhemên Seydayê Tîrêj jî bi xwe, piraniya wan helbestin, heyani nuha sê pirtûk dehênaye û çapkiriye ew jî evin:

1. (Xelat) di (1990)î de.. helbest, li Siwêdê hate çapkirin bi alîkariya dost û hevalan, piştî çapek bi hijmareke kêr, li 1amê sala 1985 an de, bi pêşgotina D. Zengî .
2. (Zozan) di (1990)î de helbest , ew jî li 1amê hatiye çapkirin bi pêşgotina D.Zengî .
3. (Cûdî) di (1998) an de, li bajarê Beyrût hate çapkirin û ew jî bi pêşgotina D. Zengî.

(Serpêhatîyên Kurdan) di (1992) an de, ev pirtûk hemû kurteçîrok in, ji folklorê Kurda ye, li 1amê hatiye çapkirin, û bi xwe jî ji weşanên govara Zanîn e û bi alîkariya berpisyarê wê Ebdulbaqî Huseynî ye, ji bajarê Qamişlo, di dawî de wekû tê zanîn, Mamoste: Tewfîqê Huseynî wergerand zimanê Erebi di sala (1996)an de .

Her wiha jî ... Mixabin dawîya jiyana - kêr an zêde - zû tê, qeda bi dunyê Keve.. Seydayê Tîrêj çû ser dilovaniya xwe, piştî jiyaneke tijî hezkirin û helbest, di xizmeta tore û çanda gelê Kurd de, di roja 23. 03. 2002an de li bajarê Hisîça.. Can ji laş firiya, û bajarê tevî birîndar li dûv xwe hişt û çû..

Lewra Seyda di dawîya demên xwe de pir bi qedir û hawa bû, ku Seydayê zîrek Tîrêj, sê caran hatî xelat kirin:

- 1– Xelata mehrecana helbesta Kurdî li Sûriyê.. 1995 an .
- 2– Xelata – 100 – saliya rojnamegeriya Kurdî.. 1998 an de .
- 3– Xelata koma Helebça, ya folklorê Kurdî li Cizîra Sûriyê.. sala 2001 an de.

Ji malpera tirej.name

Bêwar Barî Teyfûrî

Newroz cejna dîrokî ye



Di nav gelên rojhilata nêzîk û navîn de gelê kurd yê herî kevnareye. Kurda di dîroka van herêmandan dewseke (şopeke) barbicav hiştine.

Ev gelê kevnar, mîrxas û dîrokî xemleke mezin daye çand û dîroka gelên cuda û pêşdaçûyî, dewlemendbûna kultur û menewîyata wanda roleke girîng leyîstîye. Dibêjin gelê bê çand bê kesayete. Her cejn merasîm, urf -edet nirxeke çanda gele, him jî pareke bin geha çanda netewî ya dîrokîye .

Her gel jîyanêda anegorî menewîyata xwe çanda xwe diafrîne. Eyd-cejn, merasîm û li wanva girêdayî erf-edetên cuda-cuda di pêş ketina çanda netewî û cîvakî de roleke gellekî mezin diliyizin.

Di van cejn û merasîmde helwesta mirovan li derbarê jîyanê de tê xuya kirinê. Dem tî dubuhurin hinek cejn, eydên kevn an wêneyên xwe duguherin, an jî ji hiş û bîra gel dertên, lê hinek cejn, eyd jî hene ku çiqasî jî dem bî derbazbin jî di her demîda terî û jîr dimînin û bi coşîya gur, bi heytêhol tî pîroz kirin.

Ji van cejn yek yê herî kevnar cejna Newrozêye . EV CEJN ev çend hezar salin bandorî li ser menewîyat û zêhnîyata mirovan û gelan dike.

Newroz di dîroka gelê kurdada û jîyana wanda cîyekî hêja û maqûl girtîye û digire. Cejnên ku bi qedera gelanva, bi rizgarî û şoreşêva tîkîlyên wan hene, an jî bi wanva girêdayîne (di alîyê gelanva) di bîranîna wanada hertim dijî, an jî derbazî jîyana wan, derbazî dîroka wan dibe her dem bi hub û hizkirin, bi şadîmanî, bi coşîyek alavî tê nîrxandin, nîrandin û parastin.

Newroz di efrandarîya gelê kurdanda cîyekî pir bi rûmet û sîyanet digire .

Newroz jîyana meda sembola serhildanê û rojbûyîna azadîyêye, nîşana rizgarîyê ye .

Newroz destpêka buharê, vejîna tebîetê (siruşt) ,silava jîyana nû û vemirandina zulm- zorê û sîtemêye.

Newroz destpêka emrekî bi rûmete, wekhevîye, nêt û meramên qencin.

Newroz altindarî û parastina mafên mirovan ê xwezai û gerdûnîye .

Newroz cejna xastekên pîroz ê mirovahîyêye .

Newroz ji bo kurda cejne dîrokîye, cejna şêidane, .

Newroz ji bo kurda SERKEFTIN û serbilindayîye

Newroz salname kurd û Kurdistanêye

NEWROZ RONAHÎYA PÊŞEROJEYE

NEWROZ JÎYANE A BI ŞEREF

Dîrok dide kifşê di berî zayînê, li berî heyamê me hukumdarên Assûrîyayê li ser axa Kurdistanê û li rojhilatêda hetanî 400 salî desthilatdarî kirine.

Berî zayînê 612-salê 2610 sal berîya me 21-ê adarê bi serwêrtîya mîrxasê efsanewî (lêgendar) Kava xaka Kurdistanê û gelên rojhilatê ji bin bandor û dagirkerîya Assûrîya yê tî azad kirinê. Dû vê altindarîya dîrokî ve dewleta kurd a yekemîn Mîdîya tê ava kirinê. Jî vê bûyerê şûnda her sal 21-ê adarê tê hesibandin çawa destpêka edlayê, biratîyê, wekhevîyê, emrê şa û aza, roja nû. Bi kurdî nohroj- Newroze.

Bi nave newrozê girêdayî gellek lêgend û cîrok hatine gotinê . ji van lêgêndan yek jî bi nave hadad ê engal Kavayêva girêdayîye. Navê Kava li Kurdistanê.

Sembola azadîyêye .

Li Kurdistanêda lêgend weha destpêdibe..... wextekî li Kurdistanêda bi nave Dehoq hokum darekî zalimî, bê bext, bê wîcdan hebûye. Ew gellekî qeddar bûye, hertim bobelat anîye li serê gelê Kurdistanê. Rojekî li ser mile vî kujerî du damarê wek mer şî dibin. Çiqas hekîm û loxman derman çê dikin ku evî hukumdarî devxwî ji vê xezebê xilazkin, lê car lê nedibû .

Dawîyê da hekîm û loxman dicivin biryar dikin ku hero mîjûyên du xortên kurd bidine wan meran ku zirarê nedin hukumdar û wî xeza nekin. Wê rojê şûnda hero du xorta dukujin mejûyê wan didin van mera. Binelî, gundî di dest wî zalimî tengazar dibin.

Rojekê dîsa mirovên wî kujerî tî ber derê Kava ewladê wî dawîyê dixwazin .

Kava mirovekî hesinkar bû, ewî bi hesina mirov çêdikir. Kava heyşt zarê xwe qurbana Dehoq dabû. Lê vîcarê yê dawîyê ê neha nade.. Miqabilî Dehoq ê zalim û bê xweda bê wîcdan cînar û gundîyan beşdar dike sozê xwe dikin yek êrîşî li ser qesira wî dikin.

Kawa bi çakûçê xweva sere Dehoq ê xwîn mîj dipercqîne û wî dikuje, leşkerê wî tar-mar dikin. Kawa qesira wî zulmkarî de rûdinê dibe hukumdar.. Gundî hevdu dicivin Kawa dibêje--- îro şûnda li welatê me wê xwîn nerije, kesek ê sîtem û zorê nebîne, emê dewletek, jîyanek nû serrastkin, agir an vîxin, govendan bikşînin, bila roja îro-bîst û yekê adarê roja cejnêbe, roja undabûna zordestîyêbe, destpêbûna emrê şa û aza be, bila rênîşa azadîyêbe NEWROZ...

Ev lêgend ji kûraya dîrokê tê. Lêgêndêda rastî heye Qewimandin li ser rastîyê, heqîyê hatîye efrandin

EW rastî, buyer îro jî li ser axa Kurdistanê didome. Gel dijî merê çar ser şer dike. Geç û xortên niştîmanê bi laşên xwe agirê Newrozê gur dikin û ronayê, azayê di gelê bindest û berdest ra tînin.

Îro agirê Newrozê dilê hemû kurdê welatparêz de vîdikeve û zûtirê li welatekî serbixwe û azadda agirê Newrozê yê ronîbe, ev agir ji bo kurda

sembola jîyanek serbest û serbilinde.

Belê Kurdistan bi xwîna şêidanva ava dibe û em her kurdên bi namûs şerefeke mezin dikşînin, serkeftin dixwazin û dibêjin... ** Heta dibî çêleka çil (40) salî bibe boxê rojekê** an jî ** mirina bi şeref ji emrê bindest çêtire **.

Îro em bi ruhê xwe, bi ramanên xwe, bi nefesa xwe, bi xwîna xwe êrîşî li ser merê çar ser dikin, em rêça KAWA didomîn. Heqê kurdan tune vî şerî bidin der. Hesreta me, daxwaza me, ola me, bawerîya me Kurdistanê. Kurdistan gazî dike, hîvî dike, gelê kurd xwe hertim pêş dixê, jîyanêra dimeşe û dîroka xwe bi xwîna xwe dinîvsîne. Bi bawerîke mezin jîyanek bi şeref, bi sîyanet didomîne, çandek nûjen diafrîne, li dîroka mirovahîyê de belgeke nû vedike, belga wekhevîyê, qehremanîyê û vê belgeyê bi xwîna xwe a sorva dixemlîne, belê kurd îro cejna azadîyê li qadada pîroz dikin, nêzînkî armanç û daxwazên xwe ên tewrebilind dibin. Agrê Nevrozê heya kurd hene venamire yê bişuxule. Ev agir bê şik ê bibe helebêtî (meşel) li welatê şêidan de.. Em kurd bi bawerî hîvîdarê wê roja aza a bi rêzin....

EW ROJÊ BÊ

Ez bawerim ew rojê bê

Ew qezenca şêidane

Hêsrên cavên dayikane

Ew hesret û armanca milyonane.

Ew roj bawerîya MEZLÛM DOXAN

Daxwaza REWŞEN, ALKAN

Û rênîşa şêidan

Ez bawerim ew rojê bê

Ew hesreta gelê meye

Ew xelata şerê meye

Mizgîna şêidane

Ew rojeke aza nuhe

Ew rojeke pir bi rêze

Ew rojê bê.....

Newroz pêşeroja kurdane

Newroz ji bo gelê kurd cejne dîrokîye û mecalâ çaresarkirina pîrgirêkane. Newroz ji bo mirovên kurd jîyanek bi wete û bi rûmete.

Newroz dîroka çarenûsa kurdaye .

Newroz ji bo kurdan vejîna safîyê, biratîyê, wekhevîyê, azadîyê, yekbûna gelan, lihevhatinê, aşîtyê, lêborînê, çewsandina zulm, zorê, koletî yê û dîdema pêşerojek ronîye.

Newroz salnama azadîya gelê Kurdistanêye, Zindî bûna suruştê û gelên mezlûme .

NEWROZ sembola berxwedana jîyanêye....

Dr. Ehmed Xelîl



Kesayetiya kurdî Lêkolînên civaknasîn

Xelex - 14

Hizra ayînî kurdî

Wergêr: Heyder Omer



Milet û hizra:

Mirov ne komek berikên dolava ye, ku giyan di yekê de ye, gewde diya din de, hest di ya sisiê de, hizra di ya çarê de, hiş di ya pêncê de, raman di ya şeşê de, derûn di ya heftê de, ageh di ya heyştê de, bîrî di ya nehê de, zanîna yekser di ya dehê ye. Organîzekirina mirov bi vî awayî bela ye, ne ji ber ku tenê ev yeka destpêkeke zanîni ye rê li pêş me wenda dike, belê bi ser de jî realîteyê ji hev dixê, û bivê ne vî şirovekirinê çewt dike, şînkirinê (tehlîl) jî hev dixê û encaman bela wela dike.

Mirov zindiyekî dînamîk e, pêkahtên wî tene livandin, pêre jî bi rejeyên cûrbecûr li gel hev têkildar dibin, û ji hêlên gewdeyî, giyanî, hizrî, agehî û zanîna yekser de bersivên sînorkirî dide. Di çarçewa vî şirovekirina mirov de wateyên tîrmên (hizrane, hişane û ramane) tev li hev dibin, ev tevlihevî di pirtûkên tîrmên felsefeyê de xuya dibe, di wan pirtûkan de em cidahiyan giran di navbera van her sê tîrman de nabînin. Pêre jî em dikarin weha bibêjin, ku tîrma (hizrane) jî ya (hişane) firehtir e, eva jî jî ya (raman) firehtir e. Tîrma hizrane (General mentality) tê nasandin, ku ew „tevayê rûçikên gelemper û nimûneyên zanîni ye, yê ku miletek, ji warên sinçî, politîkî, aborî, çandî û şaristanî pê tê naskirin“ (1).

Hizra milet çarçewa ramanî ya li ba wî miletî serdest e, rêberê dîtin û boçûn û tevgerên wî miletî ye, bingeha zanîni ye, ku taybetmendîya wî miletî formole dike, û xweristîya bersivên wî sînorkirî dike. Fîlozofê civaknasîna zanîni; Karl Manhaym weha diçe, ku endametiya miletekî wusa dide xuyakirin, ku ew kesana hemî li gel xwe û kesên din û xweristê (xwezayê) bi awayê wekhev, û bandora hizreke li hev hatî, û di çarçewa ramanî ye gelemper li hev hatî de têkildar dibin (2).

Hizir rûdawa kesayetiye ye, pêre jî berhema hevtêkiliya genan û êkolojiyê û çandê û rûbirûtiyan e, ne şûngirtî û bi tebat e, belê hino hino tê guhertin, lê gava milet, ji her warên giyanî, ramanî, derûnî, civakî û aborî de, bi kûranî û giranî pêrgî serûbinhevkirinê êdolocik dibe, hîngê guhertinê hizrî jî lezok dibin.

Rola entilcênsiya di guhertinê hizrê miletan de nayê veşartin, wek nimûne, em dikarin li rola îslamê, di guhertina hizra erebî de, û rola şoreşa hevbeş (sosyalîst) di guhertina hin aliyên hizra rûsî û ya çînî di serdema sedsala bîsetem de, binerin.

Hizra milet di her tiştên biçûk û mezîn de xuya dibe, lê di êdolociyên ku rêbertiya miletî dikin de, û wusa di helwestên hukardar de, û gava wergirtina biryarên mezîn jî bi awayê berz diyar dibe.

Miletê ku baweriya wî ya giyanî û felsefeya wî ya jiyani li ser rêbaza (gelê Xweda yê bijar e), çî eşkere û çî veşartî, ava dibe, bi carekê hizra wî wek ya miletê, ku baweriya wî ya giyanî û felsefeya wî ya jiyani li ser rêbaza (yekitiya heyînê) ava dibe, nabe; hizra pêşî ber bi destdanîna ser kesên din de dihere, ku wî bipişêfe yan jî tune bike, lê hizra din ber bi (hevtewawî) ya li gel keşên din de dihere, çî ew

kesana mirov bin, çî sewala û dar û kevir bin.

El-Cahêz (sala 255 k miriye) di serdema erebî îslamî de bala xwe dida şînkirina (tehlîl) hizrê miletan, û weha didît, ku hizra yonani yekeke tîrî şînkirî felsefî ye, û ya çînî yekeke piratîkî ye, vî lomê jî gotiye: „Yonani sedeman dinasin, lê dest bi kar nakin, niştevanên Çînê jî dest bi kar dikin, lê sedeman nanasin, ji ber ku ewana (Yonani) pendiyar in, û evana (Çînî) çêker in“ (3). El-Cahêz di gotineke din de weha diçe, ku niştevanên Çînê mêldarên pişeyê ne, û Yonani mêldarên pend û wêjeyê ne, û Farisî mêldarên dastlatê ne, û Tirk mêldarên cenga ne (4).

El-Hemezanî (Ibin El-Feqîh, piştî sala 290 k miriye) dibêje: „Farisî hişdartir in, û Rom jî zanatir in, û pişeyên Roman hene“ (5). Dîrokna El-Mesûdî (sala 345 k miriye) hizrê û êkolojiyê li gel hevdu dibestîne, û dibêje: „Xurasan (6) seriyar mezin dike, gewdeyan gewre dike, hişan nazik dike, niştevanên wê hişdar in, vîna wan pêşîn e, kûr diramin, û xwedî boçûn û texmîn in“ (7).

Di serdema nû de jî, cidahiyan berbiçav di navbera herdu hizrê Rohilatê û Ewropayê de hene, her weha cidahî di navbera hizrê gelên ewropî, avakerên şaristaniya nû, de hene. Eger em li rêveçûna zanîni jî sedsala (16) de veşerin, em dê bibînin, ku hizra Îtalî mêldara wêje û huner e, û ya Elmanî mêldara tîrorkirina zanîni û felsefeyên mezin e, û ya Firansî mêldara şoreşê û cîhana derûnê û heyînê ye, û ya Îngilîterayê mêldara politîkê û aborê ye, û ya emerîkî mêldara felsefeya piragmatîkî ye, ta radeya ku mirov dişê bibêje: Piragmatîk kilîtê kesayetiya Emerîkî ye.

Li gor van nerînên derbas bûne, gelo taybetiyên hizra ayînî kurdî çî ne? Berî bersivdanê, divê em baweriyên Aryanî yê kevin binerin, ka rûçikên wan yê gelemper çî ne? Ji ber ku hizra ayînî kurdî şaxekî wan baweriya ye.

Baweriyên Aryanî:

Lêvegera milet keleha wî ye, rêberê wî ye, ku di demên tariya bobelatên mezîn de, bi riya wî rêberî ber bi xwenasîni de dihere, miletê bê lêveger miletekî bê dûhatuwe jî ye, milekî her dem di bin gef û gurên hilweşandinê de ye. Serdarên êdolo ciyên dirinde, li dirêiya dîrokê, her tim miqate bûn, ku lêvegerên miletan bişkênin, da wana bi hêsanî ji rehan de hilkin, û dest bidin ser wan. Ev yeka pirçar bi ser Kurd de hat, nemaze jî ji dema gêrbûna dewleta Med sala (550 b. z) de, lê evê yekê jî dema, ku qeralê Farisan Qembîz wesiyet-nameya xwe dij Medan sala (522 b. z) danî de, bi awayê dirindetir dest pê kir, vî lomê gava mirov rûpelên dîrokê tev dide, tenê hin perçeyên baweriyên Kurd beriya Îslamê dibîne, eger wan perçeyan bide ser hev tenê boçûnê ne tewaw, ku di bin zora guman û texmînan de dimilmil in, dibîne.

Êdî ka em hin pijaqên wan perçeyên şikestî bidin ser hev. Piraniya Kurd nûka mislman in, û beşek ezdahî ne, beşê sêyem kakayî ne (Ehlî heq), û beşê çarem jî qizilbaşî ne.

Di evan her sê baweriyên ayînî (ezdahî, kakayî û qizilbaşî) de, çî kê m çî zêde, hinek bingehên bawerî kurdî kevin hene, lê ka baweriyên kurdî kevin çî ne?

Li vîrê, tişt tev li hev dibin, û tu di nav agahiyên mijgirtî de wenda dibe, û di nav boçûnê hevdi de şê û mêt dimîne. Tiştê hatiye naskirin ew e, ku Kurd beriya îslamê zeredestî bûn, pêximber Zeredest bi xwe jî kesekî medî bû, û zeredestî li ser xaka Med diyar bû, lê hinek kes hene, dibêjin ku ne tenê Zeredestek hebû, belê sê hilgirên vî navî diyar bûne; yê yekem sala (3000 b. z), yê duwem sala (2040 b. z) û yê sêyem sala (1060 b. z) li cihêkî nêzikî gola Ormiyayê diyar bûn, û pirên boçûnan wusa diçin, ku Zeredest di navbera salên (660-573 b.z) an (630-553 b. z) an (628-551 b. z) an jî (618-541 b. z) de diyar bû (8).

Ji bilî cidahiyan li ser kesayetiya Zeredest û dema diyarbûna wî, cidahî li ser bawerî/ayîna zeredestiyê jî hene. Tiştê hatiye zanîn ew e, ku entilcênsiya Med li dijî pêximber Zeredest rabû, wek çawa êla Qureyş jî li dijî pêximber Mihemmed ra bû. Eger ne wusa be, ma çima Zeredest ji şûna xwe li Ormiyayê ber bi Belx de (nûka li bakurê Efganistanê dikeve) koç kir? Weha hatiye zanîn jî, ku ji serdema Darayê yekem de, tevî ku ola Mezda di nav beşekî cemawer de şûn girtibû jî, lê zeredestî ola Faris û Med bû, her wusa mirov ji rêveçûna nakokiya Faris û Med tîdigihêne, ku entilcênsiya Farisî ola zeredestî wek sîbera êdoloci jî bo gêrkirina dewleta Med dixebitand, ev yeka tê wê wateyê, ku ewana awayekî din yê zeredestiyê, ku li gel pirojeya wan ya împertorî hêja ye, ji xwe re çêkiribûn.

Bi ser de jî hatiye zanîn, ku Îskenderê Mekdonî sala (331 b. z) welatê Med û Faris dagîr kir, û fermana sotina Avesta (pirtûka pîroz ya zeredestiyê) da, Avesta li ser duwanzde hezar perçên çermên çêlekên hatibê nivisîn. Her weha fermana hilweşandina perestgehên zeredestî (malên êgir) û kuştina oldarên zeredestî jî da. Paşê, di serdema Parthî/Eşganî (249-247 b. z) de, Avesta bi bîst yek beşan careke din hate kom serhevkirin, û piştî gêrbûna Eşgan, Erdeşêrê yekem yê sasanî, ferman da, ku deqên Avesta ya Eşganî, yê belav bûne, di deqekê de werin komkirin, ew deqa jî bû pirtûka pîroz, û di serdema Saborê yekem kurê Erdeşêr de, lêgerînê bijîşkiyê, û stêrkan û paşxwezayê jî zanistên Hindistanê û Yonistanê bi ser wê deqê ve kirin, û cidabûnê boçûnê ayînî dest pê kirin, Sabor jî fermana lidarxistina komcivîneke pîroz jî bo çareserkirina wan cidahiyan da, ewê komcivîni forma dawî ya deqa Avesta nîşan û sînorkir, û ew bi ser bîst û yek sûreyan de parve kir, her sûreyek du sed rûpel digire. Avesta, di pey re, di serdema îslamê de careke din wenda bû, û pêbawerên zeredestiyê ber bi Hindistanê de reviyân, û tiştê jî Avesta, ku di destê wan de mabû, parastin, ew jî

hin perçe ne, ne bi qasî çarîkeke deqa resen in(9).

Guhertina Avesta ya pircar ne sergêra (piroblem) tekane ye, ku li pêşberî lêgervanê baweriyên pêşiyên Kurd rû dide, belê bi ser de sergêreke dîne pirgirêkî jî heye, ew jî bingeh û çawaniya baweriyên pêşiyên Kurd û hemî Aryaniyan di dema berî zerdestiyê de ye, ew baweriyên ku ola Mezda, ya ku bi Xweda Mezda (pendiyar) tê naskirin, berzitiirîna wan e. Xweda Mezda jî bi vexwendeka ji bo siçan û avakirinê navdar e, û ew ne Xwedayê êl an gelekî ye, belê Xwedayê cihanê û hemî kesa ye. Xwedayekî din heye, ku Kurd û hemî Aryaniya pê bawer bûn, ew jî Xweda Ahora ye, Zeredşt jî herdu Xweda bi yekî; Xwedayê baqil (Ahora mezda) tev li hev kirin, û Aryaniyên kevin jî ew bi durvê nivmîrovî, ku bi formekî gulover î bi basik formîle kirin(10).

Ji bilî her du Xwedayan; Mezda û Ahora, gurûpekî Xwedayên din jî hebûn, her yek ji wan bi navê (Deyo/Daiw); Xwedayê ezmên, dihate bi navkirin, û yek ji wan mezinê Xwedayên Hind-Ewropiyayan bû, xêrxwazî û xêrkirin berzitiirîn rûçikên wî bû, ew jî (Deyaws pîter / Diyuvuh Piter)e; Xwedayê hindî yê nûka, bi xwe. Yekî din ji wan Xwedayan, (Ziyos Pîter / Zeus pîter)ê yonanî ye, û yek jî (Co-Pîter / Jupiter)ê romanî ye, û yek jî (Tawuos)ê ezdahî ye, ku di zerdestiyê de bûye Xwedayê şerî(11).

Xwedayekî Arî yî din, Mîsra / Mîthras jî heye, berî Zerdest û di pey re jî bawerî bi Xwedatiya wî hebû, ew Xwedayê peymanan, parêzerê maf û rijîmê, û dijberê hêza şer û xeydê û destêwerdanê û xwedîtînê bû, û wek xwedayê hêzdar dihate salixdan, şervanan li ser piştên hespan, beriya biçin cengê, awayên perestînê jê re pêşkêş dikirin, Zerdest ew jî tev li ola xwe kir. Mîsra di awayên perestina zerdestî de gelekî payebilind bû, Xwedayê tavê bû, Avesta ew wek parêzerê herî çavbel salix daye, Romanan jî ew bi durvê xortekî ciwan, ku şûrek daniye ser qirika gayekî, formole kiribûn. Baweriyaya bi Mîsra heya çaremîn sedsala pey zayîna Îsa dom kir(12).

Digel hindê, baweriyaya Zurvanî / Zurwanî jî heye, ku ji navê Xweda Zurvan hatiye wergirtin, ew jî xwedayê ji warê cîgeh û demê de her heye, qedera destladar e, ji dûr de bandorê li mirov dike.

Li ser Zurvaniyê nîrînê cida hene, tê gotin ku ew cûreyekî perestina Aryaniyê ya berî zerdestiyê ye, lê Jîfrî Barinder weh diçe, ku Zurvanî awayekî zerdestiyê ye, piştî ku zerdestî bûye ayîna duduyatî, ku li ser hebûna du Xwedayan ra dibe; Ahoramezda; Xwedayê qencyê, û Ehrîmen; Xwedayê şer û neqencyê, û zurvanî, li gor baweriyaya, ku dibêje şerê bingehîn yê celebê mirovaniyê mirovaniyê di şimitînê û çewtiya hişî (Kêm- zanîne), û di destêwerdana, ku ji hêla keresteyî (madî) de di şehwetê de, û ji hêla hişmendî de di nezanîne de rû dide; zurvanî jî Boziyê (Bodî) ve nêzik dibe .

Semowêl Kirêmer dibêje: „*Tiştê nêziktirî texmînê ew e, ku zurvanî berhema têkildariya zerdestiyê û şaristaniya Babil li gel hevdu ne, di duwemîn nivê serdema exmînî de peyda bû*“ (13).

Bi kurtahî, zerdest baweriyên Aryaniyê yên kevin jilhev xistin, û careke din bi awayekî nû dane ser hev; her du baweriyên mezdi û ahori tev li hev kirin, û tek bawerî jê peyda kir, Xwedayê wê yê mezin Ahoramezda (Xwedayê xêr û qencyê) bû, li hemberê jî Ehrîmen (Xwedayê tariyê) bû, ku hin caran bi navê Engiramayniyo (giyana şer) tê

Navandin, Ahoramezda ji bo rêvebiriya cihanê hinek alîkarên din dixebitîne; wek Mîsra û Sipîntamayniyo (giyana rewa/pîroz) dijberê Engiramayniyo, û Sirawşê ku qafên îblîsan perçe dike, Firtiragna (Behrem); Xwedayê cengê û serkeftinê, û Raman ku parêzerê baş bû, Xwedayê aştiyê û vehesiyê û parêzerê komelê bû. Hewl û karkirina ji bo pêşvebirina cihanê û tewawiya wê, xala hevbeş bû di navbera zerdestiyê û baweriyên aryanî yên beriya wê de, ne dagîrkirin û destdana ser cihanê(14).

Felsefeya pêkhatinê di kelepûra kurdîde:

Baweriyên aryanî yên kevin di serdemên pey Zerdest de pêrgî tevlihevkirinê û jihevixistinê û wendakirinê bûn, vê lomê jî axiftina li ser hizra kurdî beriya îslamê dê ne wek ku tê xwastin be, mirov wê nikaribe wê bi awayê rêbazî yê hevgirtî berpêş bike, lê tevî vê yekê jî hin xêzên gelemper hene, dikarin rêbertiya mirov bikin, da bigihêne bingehên kûr yên hizra kurdî ya ayînî, yek ji wan xêzan ew e, ku heyîn li ser (cûrbecûriyê) ra bûye, lê ev cûrbecûriya li ser lihevkarî û hevtewawiyê (hevgirtinê), ne li ser hevdijîtiyê, hatiye dame ziranandin, ango (cûrbecûriya di çarçewa yekbûnê de). Lê divê were zanîn ku yekbûn ne yekîtiyê ye; yekbûn hevkarîya li gel kesê din e, hevpîşki ye, beşdariya kesê din e di wergirtina biryarê û çêkirina bûyer de, lê yekîtiyê tekirin û xwedîtina di ser yê din re, û nepejirandina hevpîşki û hev beşiyê ye.

Berzitiirîn rûdawên (cûrbecûriya di çarçewa yekbûnê de) dudu ne:

Rûdawa yekem: Wêneyê Xweda Mezda di hizra aryanî de, rûdawa yekem e, ew ne Xwedayê êl an gel bû, belê Xwedayê cihanê û hemî kesa bû. Ev rûdaw heya îro jî di ayîna Ezdahî de diyar e, kesên ezdahî/eyzdî ne tenê xêrxwazên ezdahîya ne, belê xêrxwazên hemî kesa ne, bi ser de jî divê ji bîr nebe, ku ezdahiyê û kakeyiyê û qizlbaşiyê hin bingehên mezdi parastine. Nîşaneke din heye, dide xuyakirin, ku ew baweriyayn, ji zerdestiyê pirtir, berdewamiya mezdiyê ne; ew jî baweriyaya bi yekîtiya heyînê, dihevixistinê û jihevbirina giyana ye. Ev cûreyê baweriyê ne berhema hirza ayînî, ya li ser yekîtiyê ra dibe ye, belê berhema hizra ayînî ya li ser (cûrbecûriya di çarçewa yekbûnê de) ra dibe ye.

Xelîl Cindî, ku yek ji rewşenbîrên ezdahiyê ye, li ser ezdahiyê û zerdestiyê dibêje: „*Kesên ezdahî, yên bi awayê kor, dibêjin, ku ezdahî berdewamiya zerdestiyê ye, helwesta wan politîkî û bê bingeha dîrokî an ramanî û ayînî ye, dubarekirina xwezîyên kesayeti ye, xwediyên vê helwestê, eger pirojeya wan bi serkeve, bê ku nizanibin, dibine hevparên şikênadina baweriyaya ezdahî*“ (15).

Rûdawa duwem: Têora pêkhatinê jî rûdawa duwem e. Berê jî bi me re derbas bû, ku êkolojiya çiyê hevtêkiliya li gel cîgeh bi her sê aliyên wî ve (dirêjî, ber, bilindî) li gor her du têgehên (guloverî/xelek û tijîtî/miştî) di hundirê kesê Kurd de çespan dibû. Ev yeka ji hêla efsanî de, bi durvê zîmbolî (Mandela/Mandela) hate berceştkirin (gewdekirin), ew durvekî gulover e, xaçeke, ku xêzên wê, yê bi dirêjiya hev , zîmbolên her çar hêmanan (av, xak, agir, ba) ne, tê de ye, û hin caran jî heyşt xêzên, ku hevdu dibirrin, û kenarên wan bi qasî hev in, û zîmbolên her çar hêmanan û her çar semta ne (rohilat, roava, bakur, başûr) tê de ne. Ez wusa diherim, ku têora çar hêmanan bingeha

bingeha xwe li ba çiroka aferînê û pêkhatinê ya Somer dibîne, ji ber ku Xweda (Gî) erd/xak e, Xweda Apsu/ Apzo û Xweda Tiamat/Tiyamat nûnerên avê (ava kûr) ne, Xweda Enlil an jî Ellil nûnerê bê ye, û Xweda Oto; Xwedayê Tavê jî nûnerê êgir e(16).

Mandela, wek zîmbol, bi Ariyan re gîha Hindistanê, û tev li baweriyaya hindosî bû, û di gelek wêneyên hindosî, ku ji xelek û çarkoşeyên bi ser hev de guvaştî ne, pêk tên, de diyar bûye . Di kelepûra kurdî de jî hin rûdawên zîmboliya (Mandel/Mandela) hene . Wek nimûne:

1. Xweda Innîna (Eşter/Eştar) di baweriyên samî de xanima ezmên e, zîmbolê wê jî stêrkeke, ku di hundirê xekekê de hatiye neqşinkirin, û heyşt an jî şanzdeh tîrêjên wê hene. Ev Xweda gîha welatê Girîkan, û bi (Efrodêt) hate navandin, Romanan jî perestiya wê bi navê (Vinos) kirin, bingeha wê jî somerî ye.

Efsaneke somerî li ser çiroka wê û mêrê wê (Demûzî/Temûz);

Xwedayê berdariyê/şoviyê heye, Berê jî me gotibû, ku Somer ji pêşiyên Kurd bûn, ku ji erdnîgaiya şaristaniya Helef ya kurdî, ber bi jêr de cûn başûrê Mezopotamyayê (17) .

2. Li gor zanista gerdûnî ya zerdestî, gerdûn ji çar xelean pêk tê, ew jî ev in: Xeleka stêrkan, ya heyvê, ya tavê, û şahnişîna (ronahiya bê dawî) ya Ahoramezda, ev xelean û her çar semtan li hev tên(18).

3. Nîkîtin dibêje: „*Kurd jî mîna gelên mayîn bi taybetmendiya sihrî ya xelekê bawer dikin, an jî wê di dor xwe re çê dikin. Gava kesê kurd dixwaze li cihekî dûr û ne nas raze, xekekê li dora xwe çê dike, da xwe ji giyanên şerxwaz biparêze*“ (19). Eger ew Kurdên, ku Nîkîtin çêla wan dike, misilman bin, bê guman ev taybetmendiya sihra xelekê awayekî din e ji awayên rewa/pîroz yê Mandela di baweriyaya mezdi ya berî zerdestiyê de, û hin jî rewayîya xelekê di baweriyaya ezdahiyê de berdewam e. Her ku ez dîmenên gulover yê semaya folklorî ya Kurdên qizilbaş dibînim, ji Min re tê çespanandin, ku valakirina kelepûra kurdî ji bingehên wê yê kûr, gelekî dijwar û ne hêsan e

4. Her kesê zerdestî, çi nêr û çi mê be, gava gîha sala tewaw (mêritî û jinîti) divê kembera rewa/pîroz (kost) li xwe bigerîne. Kost jî zîmbola hevgirêdana li gel Xweda ye, û ji hiriya sipî tê çêkirin(20).

Hîn jî kembera rewa li ba ezdahiyê berdewam e, û li ba Kurdên misilman bi nîşanên folklorî diya re . Ev yeka dê sayî xuya bibe, eger em li wan kemberên mezin binerin, ewên ku nûka hinekê biçûk bûne, ku mêrên Kurd li newqên xwe digerin, her weha zîmboliya kembera rewa di cilên kelepûrê de jî xuya ye, ew cilên ku jina kurd di heyamên netewî de, wek cejna Newrozê, li xwe dike, nemaze jî li rohilat û başûrê Kurdistanê.

5. Dema em biçûk bûn, û hin caran serên mê dêşîn, û germa me bilind dibû, dayikan, sibehên çarşembê, em dibirin ba pîrejinekê, ewê jî hinek mij ji ser sêniya nanbijêrê bi tiliya xwe ya şehdê ra dikir, xaçeke kenarên wê bi qasî hev bûn, li ser eniyên me çê dikir, û di ber re jî hinek xwedabang (dua) bi kurdî digotin. Hejayî gotinê ye em bibêjin, ku roja çarşembê, nemaze jî yekemîn çarşemba meha nîsanê, li ba someriyayn pîroz bû, û hin jî li ba ezdahiyê wusa ve . Xaca kenar bi qasî hev îf. bi

xwe zîmboleke mezdi ye, digel hin bingehên mezdi û mîsrayî derbas kiristiyê bûye, ahenga cejna jidayikbûna Mîsra, roja (25)ê çileyê pêşin ji her salê, yekek ji wan bingehan e, ku di ayîna kiristî de bûye cejna jidayikbûna Îsa yê kiristî, û roja yekşembê (Sunday / Sonntag), ku bi wateya roja tavê ye, jî bûye ya pîroz, ku bi xwe jî (roja tavê) ye, ya ku li ba Ayîna mîsrayî pîroz e, û mîsrayîkirin jî bi avê û qurbanan nê û meyê pêk dihat, û paşê jî nan û mey, li ba kiristiyê, bûne zîmbolên gewde û xwîna Îsa(21).

Bi kurtahî, felsefeya pêkhatinê, di kelepûra kurdî de, li ser texmîneke heyînî tevyî ra dibe, (cûrbecûriya di çarçewa yekbûne de)bingeha wê ya sereke ye; ev (cûrbecûrî) bi hevtêkiliya her çar hêmanan (av, xak, agir, ba) li gel her çar semtan (rohilat, roava, bakur, başûr) rû dide, û (yekbûn) jî bi formê xekekê (gulover) rû dide; ango texmîneke, ku (tijîtiya / miştiya) hevbest, hevtêkel û hev tewaw, ne (valahiya) ber wendabûnê, gewherê wê ye. Pêre jî ew texmîneke keresteyî dîyalîktîkî heyînî ye, ne yekeke êdyal e, ku di ser heyînê re ye û jê cida ye. Berê jî, di rûpelên vê lêkolînê, yê derbas bûne de, me bandora êkolojiya çiyê li ser formolekirina vê texmîne diyar kiribû. A nûka jî, ji ber ku em gihane vê encamê, pirseke din bi qirika me digire, ew jî ev e: Gelo çî bandora wê texmîne li ser taybetmendiyên hizra ayînî kurdî heye?

Taybetmendiyên hizra ayînî kurdî:

Berztirînên wan taybetmendiyên, li gor ku em dizanin, evên jêrîn in:

1. Mêldariya ber bi yekîtiya heyînê: Ev mêldarî xwedî semteke teswwufî felsefî ye, hizra ayînî kurdî, bi vê yekê, ji felsefeya bozî/bodî de nêzîk e, ew felsefeya ku pêşî li erdnîgariya hindî diyar bûye. Ev erdnîgarî, li gor Avest, li kêlek sînorên Aryana–Vîdca (welatê gelên Arî) dikeve. Eger em ji bîra nekin, ku Arî, di navbera salên (1500-1200 b. z) de, ji hêla bakurê roava de derbas Hindistanê bûne, Sîdhata Gotama Boda (Siddharta Gautama) jî di navbera salên (563-483 b. z) de jiya bû, û li bakurê Hindistanê diyar bûbû; eger em vê yekê ji bîra nekin, wê ne dîr be, ku hizra bodî li gel baweriyên aryani, û yê kurdî ye kevin, zor têkildar be(22).

2. Hevbestiya dilsoz li gel xwezayê (sirûşt): Rewresmên (merasîm) cejnên ayînî kurdî yê kevin, ku Newroz berztirîna wan e. di hembêza xwezayê, nemaze jî di çiyên, de pêk tên. Bi bweriya me, ev yeka di baweriyên ayînî kurdî kevin de, bi sedema tevlêbûna li gel xwezayê ye, û şopên wê di zeredeştî de mane. Pirtûka Avesta bi rêzgirtina rûdawên xwezayê mişt e, wusa jî xwedanabgeke zeredeştî dibêje: „*Ez nimêja tewaw ya rewa ji bo van cihan pêşkêş dikim; deveran, çêreyan, xaniyan û kaniyên wan, avê, xakê/erdê, geyayan, vê xakê, wî ezmani, bayên rewa/pîroz, heyvê, stêrkên bê jimar, xweyîtiya tevgerê*“ (23). Di awayekî perestîya zeredeştî de jî wusa hatiye: „*Em qurbanan pêşkêş dikin, ji hemî kaniyan û ji cobarên avê re, ji geyayan re, ji darên daristanê re, ji hemî xak û ezmanan re, ji hemî stêrkan, heyvê û tavê re, ji hemî ronahiyên bê jimar re, ji hemî sewal re, ji hemî dirindeyên avî re, ji dirindeyên ser xakê re, ji hemî lawirên baskan li hev dixin re*“ (24).

3. Kurd kesên din bêçareyî baweriyên xwe nakin: Kesê Kurd kesên din neçareyî baweriyên xwe nake, ne bi awayê talanê zorane, û ne jî bi awayên vexwendekên dostan e. Di dîroka pêşîn

Kurd de, me nedîti ku ewana şahnişîn û dewletên ayînî ava kirine, û ne jî bi mebesta belavkirina baweriyên ceng ajotine. Her weha Avesta dide xuyakirin, ku zeredeştî ayîna mîletên Arî bû, û yekeke aştiyane bervedêrî bû, dijminatîya wê tenê ber bi gelên Toranî de bû, ji ber ku Toraniyan her tim gef û gur didane welatên Ariyan. Ev dijminatî jî di bin sîbera împeratoriya Farisî de gur bû. Ezdahî berztirîn nîşan e, ku hizra ayînî kurdî dijminatîya kesên din nedikir. Rast e ku ezdahî ayîneke çarçewkirî ye, lê pirojeyên berfirekîrî hilnegirtî, û mirovên xwe bi mebesta talankirina kesên din, û xistina wan bi sîbera ezdahiyê, perwerde nekiriye (25).

4. Bingehên kûr yê hizra ayînî kurdî şûngirtî

ne: Bingehên ayînî kurdî yê kevin di hizra kurdî de şûngirtî ne, bi Kurdan re derbas çanda îslamê bûne, û di hinek boçûnên sofitî û felsefeyî yê rista feqetîya îslamê de hatine berceştîkirin. Wek nimûne, belavbûna awayên sofitiyê (Qadirî û Neqşebendî) di nav Kurdên misilman de, yekek ji wan rûdawa ye, pêre jî em wusa dibînin, ku hizra ayînî kurdî li gel felsefeya yekîtiya heyînê zor têkildar e, vê lomê wê ne susret be, ku hin rêberên felsefeya tesewwufî di nav kurdên misilman de diyar bibin, wek sofiyê mezin Ebo El-Qasim El-Cuneyd (sala 297 k / 910 z miriye), ku ji xelkên bajarê Kurd Nehawend e, û cangoriyê ramana sofitiyê Şîhab El-Dîn El-Suhrewerdî (sala 586 k miriye), ku ji xelkên bajarê Kurd Suhrewerd bû, û pirên din jî.

5. Mêldariya zanistî hişmendî: Piraniya mezinên feqeh û ramanbîrên Kurdên misilman, di axiftina xwe de, mêldarên rêbaza zanistî hişmendî felsefî ne. Hin zanyarên ayînî îslamî dijberên felsefeyê ev diyarde nîşan kirine. El-Şîhab El-Alosî di pirtûka xwe (Seyrana dilan / Nuzhet El-Qulob) de nîşan dike, ku gava Şêxê neqşebendiyê; El-Şêx Xalid El-Neqşebendî (sala 1827 z miriye) derbas Bexdê bû, gotebêjê Îraqê El-Nûr Elî El-Suwêdî El-Bexdadî, di nav kesine pir de, gote wî: „*Kirinên zanayên Kurdên îro gelekî erzane, ewana bi zanistên felsefeyê re mijûl dibin, û dest ji yêrî din, wek tefsîr/şirovekirinê û hedîsê berdidin, bervajî kirinên zanayên Erebe tev digerin*“ (26).

Ebo Elî El-Cubbaî (sala 303 k / 916 z miriye) û kurê wî Ebo Haşim El-Cubbaî (sala 321 k / 933 z miriye) jî rêbaza zanistî hişmendî dixebitandin, her du ji mezinên Mutezîle bûn, û bi navê gundê (Cubbê) hatibûn naskirin, ev gund li erdnîgariya lorî (Feylî) li başûrê Îraqê dikeve. Dadger Ebdil-Cebbar El-Hemezanî El-Esed Ebadî (sala 415 k / 1025 z miriye) jî, ku ji xelkên bajarê Esed Ebad e, li rohilatê Kurdistanê ye, yekek ji wan zanayên Mutezîle ye, her weha hatiye zanîn, ku gurûpa Mutezîle di xebatên li ser pirsên ayînî de, siwarên hiş û zanistiyê bûn. Di serdema nû de jî Seîde Nûresî (Bedî El-Zeman 1873–1960 z) di nav zanayên Kurd yêrî ayînî, xwediyên rêbaza zanistî hişmendî de, li bakurê Kurdistan, bi nav û deng e(27).

6. Nepejirandina olperestiyê û rêbazperestiyê:

Kurdê oladar li gel hemî ol û rêbazên olî yêrî din tolerans e. ev cûreyê mêldariyê koka xwe li ba felsefeya (cûrbecûrî di çarçewa yekbûnê de) dibîne. Ji bo vê yekê emê helwesta zanayê Kurd Seîde Nûresî, ku li dij cenga, ku dewleta Osmanî daye ser Ermen û Nistoriyan, bikin belge, Nikîtîn dibêje: „*Mela Seîd yek ji pirên rewşenbîrên Kurd bû, bê tirs û saw dijberê têkoşina rewa rawesta. Destlata Tirkan ew ji bo helwestên wî zîndan kir, û ji bo ku*

wî fetweyek da, ku ew ceng ne têko şîneke rewa ye, ew dane ber dadgehê. Ji bo bervedêriyê di dadgehê got: Ka em mukur bîn, ku min fetweya bi vê naverokê daye, li gor rêbazên Serîetê (ayîni) û li gor zagonên çêkirî, ez ne perpirsiyar im, ji ber ku min fermana kuştina keşên bê guheh, ku kesekî naşinin, di şerîeta me de nedîtiye. Her weha zagonên, ku têne xebitandin ji riya kuştinê nadin, belê ewana mêldarên mafên mirova ne. Ji hêla fetwedayînê jî, ez bawer im, ku xwedatirsî û zanîna Şêxê îslamê û dadmendî û dilovaniya Xelîfê, ku ew jî firehtir e, rê nade fetwaya kuştina xelkên xizan (kirstiyên Nistorî) û talankirina mal û milkên wan, ewên ku, ji destpêka îslamê de û heya îro, çek li hember misilmanan ra nekiriye, û ceng li dar nexistine“ (28).

Di vê gorepanê de, dixwazim bîn zimên, ku rehme lê bavê min, ê ku gelekî oldar bû, rojekê ji rojan li hember ol û rêbazên olên din ne olperest bû, hema carekê jî bi nehezî û dijminatî li gel xelkên olên mayîn têkildar nebû.

Tê bîra min, gava Muradê ermenî yê rehme lê, yê ku firaxên baqil (baqir) sipî dikirin, her biharê di hate gundê me, pirê êvaran dibû mewanê bavê min, şîv li gel hev dixwarin, û heya nîvê şevê pev re daxifn.

Her weha tê bîra min, ku hin pîşekar û firoşvanên gerok, bawermendên rêbaza îmamî (ceferî / şîî) bûn, pirê caran dibûn mewanên bavê min, wî jî bi awayê dostane pêşewaziya wan dikir, û gelek Kurdên ezdahî jî dostên bavê min bûn, bi rêzdariya payebilind li gel wan têkildar dibû. Ne tenê bavê min ewqas tolerans bû, belê hemî xelkên gundê me, jin û mêr, bi vî awayî bûn, rojekê min gotineke erznan, der mafê bawermendên olên din, ji wan nebîhist. Ez dikarim teqez bikim, ku piraniya civaka Kurd hilgîrên vê rêbaza mirovane ye.

Diyardeya olperestî û rêbazperestî, ku li ba hin kesên Kurd hebe, çî ji kevin de û çî jî nûka, ne yekeke resen e, belê ji derve de derbas hirza ayînî kurdî û civaka kurdî bûye, û Kurdên ku ev diyarde derbas civaka kurdî kirinê, ji dibistanên çanda havî (xerîb) û biyanî derketine. Bi gotineke din: Ewana şagirtên mamosteyên olperest û rêbazperest in, bûne (hespê Turwada), ku olperestan civaka kurdî pê qul kirine, û çanda neheziya kesên din, ji her du warên ayînî û rêbazê de, di hin kesan de çandine. Bi ser de divê rola polîtîka Osmanî jî ji bîra nekin, ewê polîtîkê hin Kurdên oldar bêageh kir, û berdane ser efseyên wan, yêrî kiristî û ezdahî û qizilbaş.

7. Nebûna pêgirtîna dîmenên ayînî:

Kesê Kurd xwe li gel dîmenên ayînî derveyî nabestîne, û awayên oldariyê kopî nake. Eger tu di navbera pêwr û mêzînên dîmenên derveyî û kopîkirina awayên oldariyê re li kesê Kurd binêrî, heye (belkî) tu bibêjî, ku ew ne oldar e, lê rastî ne wusa ye. Kesê Kurd, ji her waran de, dîmenên derveyî û awayên oldarî yêrî formole jî di nav de, ne mêldarê çarçewkirinê ye. Oldarê Kurd, di kûraniya xwe de, xwedî xwedatirsiya sinçî ya bê deng e, ew ne oldarê dengdêr e, ewê ku li her derekê xwe berz dike, û oldariya xwe diyar dike, wek ku di bazarê de ye, û bang xelkê dike û dibêje wan: dibêje wan: Binerin, ez bawermend im, ez oldar im, ez xwedatirs im!

8. Nedurûfî di warê ol de: kesê kurd ne mêldarê durûtiyê ye, di helwesta xwe ya ayînî de eşkera ye, ew yek ji sisiya ye; oldar e, pêdiviyên ol pêk tîne, lê xwe bi vê yekê nabîne, an nîv-oldar e, an jî bê ol e (zanistewan e), û eger bixwaze jî, nikare vê yekê veşêre, lê di heman demê de, û her tim rêza oldar û zanayên ol digire. Dikarim wusa biçim, ku ew li gor saloxana (Ayîn ji bo Xweda û cihan ji bo tevan) tev digere.

Basîl Nîkîtin, pirên taybetmeydiyên hizra ayînî kurdî, bi kurtahî, di vê gotina xwe de diyar kirin: „Ji warê ol de, tevî ku kesê Kurd ayînê dixwe bin berjewendiya eşîra xwe jî, lê hinek hene tev li giyaniyan dibin, nemaze jî di warê tesewwûfê de. Ev giyaniyan mirovê Kurd ber bi pelandina Xweda de têve dide. Ev pelandin taybetiyêke îranî nîşankirî ye, û ji ber baweriyên kurdî, yên ku rehên xwe di îslamê û di hin baweriyên dine pir kevin de dibînin, şax daye. Ev yeka li gor sedemên dîrokî, ku li gel cîgehê Kurdistanê hevbest in, tê şirovekirin; ew cîgehê ku bûye riya hevpêrgîya olên kevin, yên li ser xaka Asiyaya kevin diyar bûne, dikeve(29).

Jêder û çavkanî:

- (1) Ebdil-Xenî Îmad: civakanasiya çandê (Sosyolojiya El-Seqafe), rû 332.
- Şewqî Celal: Hişê emerîkî dirame, (El-Eqil El-Emerîkî yufekkêr) rû 9, 10.
- (2) El-Cahêz: Nameyên (Resaêl) El-Cahêz), 3/216.
- (3) Jêdera berê, 3/214.

- (4) El-Hemezanî (Ibin El-Feqîh): Pirtûka welatan, (Kîtab El-Buldan), rû 199.
- (5) Xurasan nûka di navbera bakur-rohilatê Îranê û bakur-roavayê Efganistanê de parvekirî ye.
- (6) El-Mesûdî: Zeviyên zêr, (Muroc El-Zeheb), 2/63.
- (7) Semowêl Nûh Kirêmer: Efsaneyên cihana kevin, (Esatîr El-Alem El-Qedîm), rû 294. Jîfrî Barinder: Bweriyên ayînî yên gelan, (El-Muqtedat El-Dîniyye leda El-Şuob), rû 133. (8) Zinar Silopî: ji bo Kurdistanê, (Fî sebîl Kurdistan), rû 287.
- (9) Avesta, rû 8. El-Meqdîsî: Destpêk û dîrok, (El-Bedi we El-Tarîx), 3/153. Mehmûd Şit Xettab: Serdarên vekirina welatê Faris, (Qadeto Fethî Biladî Farês), rû 30.
- (10) Deyakonov: Med, (Mîdya) rû 378. Mehmûd Şit Xettab: Jêdera berê, 14, 15. Ebdil-Hemîd Zayêd: Rohilatê nemir, (El-Şerq El-Xalêd), rû 653, 655.
- (11) Deyakonov: Jêdera berê, rû 368. Xelî Cindî: Ezdahî û ezmûna dijwar, (El-Eyzziyye we El-Îmtihan El-Seib), rû 70-71.
- (12) Jîfrî Barinder: Jêdera berê, rû 125 - 126. Arnold Tuwênbî: Kurtelêkolîna Dîrokê, (El-Muxteser li dîrasatî El-Tarîx), 2/187.
- (13) Semowêl Kirêmer: Jêdera berê, rû 312. Biner: El-Şehrîstanî: Milet û bawerî, (El-Mîlel we El-Nîhel), 1/234. û Jîfrî Barinder: Jêdera berê, rû 123-125.
- (14) Avsta, Yasna, Haytî, 1, rû 45, not 10, û haytî 57, not 33, rû 168. Avesta, Yaşt 1, not 33. Nûrî Simaîl: Ayîna zeredestî, (El-Diyane El-Zeredestîyye), rû 81.
- (15) Xelîl Cindî: Jêdera berê, rû 288.
- (16) Semowêl Kirêmer: Ji tablowên Somer (Mîn

- Elwah Somer), rû 70, 75, 163. Siptîno Moskatî: Şarîstaniyên Samî yên kevin, (El-Hedarat El-Samiyye El-Qedîme), 75.
- (17) Fadil Ebdil-Wahêd: Ji Somer heya Tewratê, (Min Somer îla El-Tewrat), rû 149, 165. Siptîno Moskatî: Jêdera berê, rû 256 - 257. Ebdil-Hemîd El-Zayêd: Jêdera berê, rû 148.
- (18) Avesta, yaşt 22, rû 632, not (1).
- (19) Nîkîtin: Kurd, rû 379.
- (20) Avesta, yasna, haytî 9, rû 77 - 78, not (3). Avesta, yasna, haytî 2, ru 49, not (49).
- (21) Avesta pêşgotin, rû 33. Harî Saxez: Gewrebûna Aşor, (Ezemet Aşor), rû 309. Xelîl Cindî: Jêdera berê, rû 33.
- (22) Biner: Semowêl Kirêmer: Efsaneyên cihana kevin, (Esatîr El-Alem El-Qedîm), rû 248.
- (23) Avesta, yasna, haytî 66, not 18, rû 68.
- (24) Biner: Avesta, yasna, haytî 44, not 11, rû 140. û Avesta, yaşt 5, not 9, rû 409. Zendavesta, deqên Pehlewî, Dadistan û Mînox û Xerad, rû 849.
- (25) Biner: Avesta, yasna, haytî 44, not 11, rû 140. Avesta, yaşt 5, not 9, rû 409. Zendavesta, deqên Pehlewî, Dadistan û Mînox û Xerad, rû 849.
- (26) Ebdil-Hey Bin Ebdil-Kebîr El-Kîttanî: Serecema serecem û çespanan, (Fihres El-Feharês we El-Esbat, 1/374).
- (27) El-Zehêbî: Jînenîgariya zanayên comerd (Sîyer El-Elam El-Nubela), 15/63, 17/244. El-Zîreklî: Zana (El-Elam), 3/273, 6/256.
- (28) Nîkîtin: Jêdera berê, rû 344-345.
- (29) Nîkîtin: Jêdera berê, rû 27.

Dr. Ehmed Xelîl (Sozdar Mîdî)

Çavdêriya zimani: Mustefa Reşîd



Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî
Xeleka Taybet - Newroz 2014

Çima Oldarên Kurd Yên Îslama Tundrew Lanetê Li Cejna Newrozê Tînin?

Newroz cejnêka dêrin û kevin ya gelên *Ariyanî* ye ku ji hezarsalan da gelên *Ariyanî rojhilatî* pê şadîbin. pêdiviya mijara vê cejnê bi lêkolîneka zanistî û îjîdil (jîdil) heye.

Di kûraniya wê ya efsanewî da gelek rastiyên girîng yên çandî, olî û ramiyari (siyasî) hene. Zanî û tîgîhîştina van rastiyan bi kêrî çareserkirina pir arîşeyan tê ku di dîroka gelên *Ariyanî* da ji pir kesan ra ne avêne û zelalîn.

Sebareti bi neteweya Kurd, vejandina şahiya cejna Newrozê wek nîşana derbirîna hişyariya neteweyî di dema nû da tê dîtin, û peydabûna hişyariya niştîmanî kurdistanî piştrast dike; herwisa ew yek tê maneya nepejirandin û redkirina hemû proje û pîlanên pişaftin û asimîlekirinê ku dagîrkerên Kurdistan ji salan da bi ser me da sapandine. Gava gelê Kurd agirê Newrozê pêdixîne, ew bi vê yekê wan demên tarî diçirîne ku sazemanên dagîrkeriyê ew pê dopêç kiribûn, û dixwaze bide xuyakirin ku nasnameya wî ya dîrokî kurdayetî ye, ew ticar nasnameyeka bêgane û sexte hilnagire.

Bi vî Awayî Lanet li Newrozê Anîn!

Tevî girîngiya cejna Newrozê di warê neteweyî da, oldarên Kurd yên *Îslama Tundrew* lanetê lê tînin. Me dîmeneka balkêş û bi fêş dît, ku oldarekî Kurd yê *Îslama Tundrew* ji Başûrê

Kurdistanê, bi navê "*Ebdul Semed*", xwediyê rîşeka dirêj mîna rîşên oldarên *Îslama Tundrew* yên Erebiştana Seûdî, Misir, Pakistan û Şîşan, bi hêrs û bi kîn dibêje: "Newroz ne cejnêka îslamî ye, ne rewa ye ku hûn pê şabîbin û ne rewa ye ku Newroz wek cejnê bê binavkirin. Pêximber Muhemed bi Newrozê şanebûye. Tenha du cejnên Misilmanan hene: Cejna Rojîyê û Cejna Qurbanê. Lidarxistina cejna Newrozê ji tewrên ne bawer mendane (kafirane)". Li vê linkê temaşe bikin:

<https://www.facebook.com/photo.php?v=267574516742745&set=vb.202350039931860&type=2&theater>

Bi rastî gelek gengaz û mimkin bû ku ew dîmenên wisa balkêş û bi fêş li welatê me peyda nebûbana. Ev çend salin ku axa Kurdistanê bûye warê hin çandên siyasî bêgane, ewên ku me ji hev belav û şerpeze dikin, hest û ramanên me dipêçînin, berê me didin ser rê û şopên nepenî û nediyar.

Belê gelek gengaz û mimkin bû ku qîreqîra oldarên wek "*Ebdul Semed*" li welatê me nehatiba bihîstin. Lê belê peydabûna hin bûyerên din mîna vê bûyerê, rê li ber van tiştan vekirin: Îro dora 200 xortên Kurd ji Başûrê Kurdistanê li Sûriyayê li aliyê *Îslamewiyên Tundrew* li dijî gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê serdikin. Ji hêla din va. bê serm û bê

şerm û bê perwa hin endamên koma îslamî yên Parlemeta Kurdistanê di dema bihîstina sirûda niştîmanî kurdistanî *Ey Reqîb* da ranewestîn ser xwe.

Helbet, encam dê ev be, gava li her derê dibistanên oldarê Toranîzmê Fethullah Gülen her roj jehra xwe berdî serî û laşên keç û xortên me li Başûrê Kurdistanê.

Ev diyardeyên tirsnak û xeternak bûn sedem ku em li ser qîreqîra vî oldarê Kurd yê *Îslama Tundrew* rawestin. Ev mijar ne mijareka wisa surîştî û sade ye. Ev bûyerê êrişeke li ser neteweya Kurd bi giştî û tê maneya bînpêkirina rûmeta me ya kurdistanî. Vê bûyerê dîmenek anî bîra min ku di dehsalên 80-î yên sedsala derbasbûyî da, dîsa di roja cejna Newrozê da, ez raserî oldarekî Kurd hatim ku bawernameya xwe ya zanistiyê ji beşê *Şerî'eta Îslamî* wergirtibû û wek Îmam û pendbêj di mizgeftê da kardikir. Gava min destê xwe da wî û got: Pîroz be!. Pêşî dest da min, lê zûka destê xwe paşva kişand û got: Te çima got: Pîroz be?! Min got: "Newroz pîroz be". Got: Na, na, Newroz ne cejna misilmanane; misilmanan tenha du cejnên xwe hene: *Cejna Rojîyê* û *Cejna Qurbanê*.

Di wê demê da ez xwendekarê majîsterê li zanîngeha Helebê bûm. Navê mamostayê min *Dr. Fexreddîn Qebawe* bû. Ew bi oldarî û serboriya

xwe li ser jêderên bermaya îslamî naskirî bû. Helbet, wî dizanî ku ez Kurdîm û ji herêma Efrînê me. Divêt em di vê babetê da bêjin ku her helebiyekî resen bi her awayî hewldide ku zeyta mala wî ji zeyta herêma Efrînê be. Di wê demê da jêder û pirtûkên li ser dîroka Kurd peyda nedibûn. Sazûmana Be'sî, erebkera çanda şovênîst, her jêder û pirtûkeka li ser dîroka Kurd, veşartibû, yan jî bend û qedexa kiribû.

Di hevdiyênê da li gel Dr. Fexreddîn min lidarxistina kurdan ya cejna Newrozê anî ziman. Wî got: Ev ne ti arîşe û pirsgrêke; berdeyam kir û got: Dibêjin ku di dema Xelîfe Ali Bin Ebi Talib da, di rojeka cejna Newrozê da jêra şîraniya Falûzec wek diyarî pêşkêşkirin. Xelîfe Ali dît ku ev Falûzec gelek xweşe. Got ev bi çi yadê tê pêşkêşkirin? Jêra gotin ku ev bi yada Newrozê ye. Xelîfe Ali bi nazikî û nermbûna rewanê xwe nasdar bû, rabû got: Bila her roj Newroz be. Divêt bête gotin ku ev Falûzec ji simîd, rûn û şekir tê amadekirin. Bi kurmancî jêra "pelûl" tê gotin. Lê hevlekî min, mamosta Es'ed Geredaxî dibêje ku ev şîranî li Rojhilatê Kurdistanê jî heye û li wir jêra "palûde" dibêjin.

Jêderên Ereban li ser Newrozê çi Gotine?

Piştî derketina min ji kişwera tarî ya Be'siyên Sûriyayê, li ber min ew deriyê nepenî yê jêderên qedexa hate roxandin. Ji min ra hate xuyakirin ku gava Ereban Kurdistan û welatê Farisan talan kirine û bi darê zorê dane ser Dewleta Xelîfeyan, wan wê hîngê cejna Newrozê bend û qedexa nekirine. nekirine. Gelên Ariyanî bi berdeyamî ev cejn li dardixistin. Ev belgeya ku me li jor binavkir, dide xuyakirin ku hên di dema xelîfeyê çaremîn Ali Bin Ebi Talib da ev cejn zindî bû. Ali Bin Ebi Talib pismamê Pêximber Muhemedê û malxiyê keça wî Fatimayê ye; ew di sala 40 goçî, 660 z. da hatiye kuştin. Pendbêj Bexdadî gotiye: Nû'man Bin Merzuban, bavê Sabit (bapîrê Îmam Abu Henîfe) ew kes bûye ku di rojeka Newrozê da Falûzec diyarî Ali Bin Ebi Talib kiriye û wê hîngê gotiye: Bila her roj Newroz be! û di rojeka cejna Mehrecanê da jî gotiye: Bila her roj Mehrecan be!¹

Divêt em bêjin ku "Cejna Mehrecanê" jî navê cejnêka din ya kevin ya gelên Ariyanî ye ku di destpêka payzê da ye. Ev nav ji peyvên "mihir" (roj) û "can"(giyan) pêkhatiye; yanê "giyanê rojê". Lidarxistina van herdu cejnên di demên piştî heyama Xelîfe Ali Bin Ebi Talib ra berdeyam kir. Li gor belgeyên dîrokî, xelîfeyê Umewî Mu'awiye Bin Ebi Sufyan(sala 60 goçî, 769 z. wexer kiriye) karê berhevkirina bacê (diravên salane) dide Abdurehman Bin Derrac ku here ji welatê Îraqê bicivîne. Ew ji rûniştivanên herêma Al-Sewad (başûrê Îraqa niha) bacê dicivîne ku ew salaneya xwe ya cejnên Newroz û Mehrecanê bidin wî. Ew ji wê herêmê deh hezar hezar dirhem, yanê deh milyon dirhem dicivîne.¹

Di heyama Abbasîyan da jî lidarxistina cejna Newrozê berdeyam dike. Di rojeka cejnê da agir dihatê dadan. Abo Bekir El-Solî derbarê agahdariyên xelîfeyê Abbasî Al-Radi Billah(sala

329 goçî, 941 z. wexer kiriye) dibêje: "Di salekê da rojeka Newrozê du rojan diket meha rojîyê. Ji lewra, biryar hate dayîn ku agir du rojan pêş destpêka rojîyê bê pexistin, û wisa komên gel agir dadan û av rijandin"¹.

Di wê demê da pir caran rojeka Newrozê wek bîngeha nivîsandina hin bûyeran bi kar dianîn. Wek nimûne, digotin filan bûyer şeva Newrozê, yan rojeka Newrozê, yan berî Newrozê, yan piştî Newrozê pêkhatiye¹. û wisa lidarxistina cejna Newrozê di heyama Bûweyhî û heyama Selcoqî da jî berdeyam kiriye. Di heyama Eyyûbî (kurdî) da, ji Newrozê ra "Newroza Sultani" dihatê gotin¹.

Ji bo girîngiya Newrozê di heyamên îslamî da hin wêjevan û torevanên mezin pirtûkên bi navê "Newroz" nivîsandine. Yek ji wan wezîrê dewleta Bûweyhî, wêjevan û zimanzan Al-Sahib Bin Ebbade(sala 385 goçî, 995 z. wexer kiriye). Navê pirtûka wî: Kitab Al-E'yad we Fedail Al Newroze (Pirtûka Cejnên û Qencyên Newrozê ye). Yekî din jî helbesvan û wêjevan Ali Bin Harûn Al Munecime(sala 352 goçî, 963 z. wexer kiriye). Navê pirtûka wî: Kitab Al Newroz we Al Mehrecane (Pirtûka Newroz û Mehrecanê)¹.

Çima Niha Lantê li Newrozê Tînin?

Di destpêkê da dixwazim bi awayekî zelal bêjim ku ev bêhtirî 25 salane min destpêkiriye ez bi Kurdistanê û mirovayeti bîrbikim (bifikirim), û ez helwestên xwe dîrî her taboyekê bistînim; çi olî bin yan tişteki din bin. Lê belê, va ye oldarên Kurd yê Îslama Tundrew bi behaneyên olî lanetê li nîşan û sembolên me yê Kurdistanê tînin. Ka em jî behaneyên li gor asta wan bidin ber çavên wan û ji wan bipirsin: Va ye Xelîfeyên Îslamê û di destpêka wan da Îmam Ali cejna Newrozê heram û qedexa nekirine; wan di wê rojê da diyarî wergirtine. Ji lewra, çima hûn di kanalên televîzyonê yê esîmanî da diqîrin û li ser menberên mizgeftan fetwan didin û lanetê li Newrozê tînin? Gelo hûn ji Îmam Ali bêhtir ji Îslametiye fêhmdikin û zanin? Yan jî di pişt peyvên we da hin tiştên din hene?

Ji sedî sed di pişt peyvên wan da hin tiştên din hene. Oldarên Kurd yê Îslama Tundrew "Tabûra Pêncan" dinimînin ku di kûraniya çand û civaka me da hatine çandin. û va ye ew di qad û meydana me ya siyasî da partiyên îslamewî peydadikin, wan aleyan hildidin ku li ser "La Îlahe Îlallah Muhemed Resûlellah" dinivîsînin. Di pey ra jî wê şûrên şer jî lê zêde bikin wek mamostayên wan yê Selefîst û Birayên Misilman. Heger em van wisa di civaka xwe da berdayî bihêlin, ewê keç û xortên me di warê ramanî û giyanî da ji nav me birevînin, wan bi ava xwe bişon û veşon û wisa bi rêya hilbijartinan be jî wê xwe bigihînin serdariya welêt û nema dest jê berdin; wek mamostayên wan Birayên Misilman li Misir û Turkiyayê. Hîngê wê fêş û ecayîbên giran li Kurdistanê xuyabikin.

Di destpêka wan tiştên bi fêş û ecêb da, ewê Sirûda Netweyî Kurdî Ey Reqîb û cejna Newrozê jî holê rakin; ewê kod, salane û bacê bavêjin ser Krîstîyan û Cihûyên Kurdistanê; ewê kurdên

Kakayî, Elewî û Êzîdî wek nebawermend (kafir) bi nav bikin, rijandina xwîna wan, talankirina jin, zarok û milkê wan helal bikin; wek berê jî hin kurdên me yê kor kiribûn. Ewê sinetkirina keçan û pençekirina rûyê jinan ferz bikin û di pey ra ewê koletiyê û rakîşandina carîyan bê sînora rewşa bikin. Qirbackirina mirovan, birfina dest û stûyên mirovan û kevirkirina wan li pêş gel wê bibin ji karê rojane. Hir tiştê ku peywendiya xwe bi rizgarkirin û serbixweyiya Kurdistanê ra heye ewê ji holê rakin, û Kurdistanê bikin wîlayetêk ji wîlayetên xilafetê.

Belê, lanetkirina Newrozê û qedexekirina wê ne ji vala hatiye. Li hin cihan, di pişt perdeyê da Oldarên Tundrew yê ji neteweyên ku Kurdistan dagîrkirine rawestiyane. Ew rûyekî din yê hevalbendên wan yê faşîstin. Lê ew hên ji wan jî fêlbaztir û tirsnakirin. Ew dijmînen here mezin û gewre ne li dijî dewleteka Kurdistan ya serbixwe. Belê ew kesin yê ku mejiyên oldarên Kurd yê Tundrew dadigirin û dilê wan bi kîna li dijî nîşan û sembolên me yê neteweyî tijî dikin; ew berîk û girîfanên wan bi pere û diravan dadigirin, wan dikin leystik û wek xençerên jehrê dixin sîngê neteweya me.

Ey gelê me yî Kurdistanî! Gelfî rewşenbîr û siyasetmedarên me yê bijarte! Bi dirêjahiya dîrokê herdem wisa bû ku dijmînen hundirîn li ser gelan ji yê derveyî tirsnakir û xeternakir bûn. Ji lewra, nabe ku em çav li ser vê diyardeya oldarên Kurd yê Îslama Tundrew bigirin. Divêt em bi hişyariyeka bilind li ser vê mijarê rawestin. Ew ji me ne û di nav me da ne. Lê ew hatine xapandin û ji erkên me ye ku em wan hişyar bikin û wan ji ramanên tirsnak yê Oldariya Tundrew rizgar bikin. Heger ew nehatin rêya rast û durist û her li ser belavkirina jehra Oldariya Tundrew berdeyam kirin, divêt em bi şidandineka xurt biçin ser wan û neteweya xwe ji şerê wan biparêzin.

Ji bo agahdariyên bêhtir li gotara "Oldarên Rizgariyê û Oldarên Îslama Tundrew li Kurdistanê" di bin vî lînkê da binêrin:

<http://www.gemyakurdan.net/gotarin/gotari/item/13175-2013-08-11-10-24-26>

û her wisa li gotara: "Oldarên Kurd yê Îslama Tundrew" di bin vî lînkê da temaşe bikin:

<https://app.box.com/s/fms29rkpsmlr3isbulwr>

Tikaye gotarê daxînin û bixwînin.

û Çi dibe bila bibe, divêt Kurdistan seranser rizgar bibe!

Jêder

¹ Pendbêj Bexdadî: Dîroka Bexdadê, 15/448.

¹ Miskeweye: Tecarib Al-Umem we Te'aqib Al-Himem, 2/22 û 5/182, 225.

¹ Abo Bakir El-Solî: Exbar El-Radi Billah we Al Muttaqi Lillah min Kitabil Ewraq, rûpel 142.

¹ Ibn Al-Esir: Al-Kamel fi Al-Tarix, 8/162, 543. Miskeweye: Tecarib Al-Umem we Te'aqib Al-Himem, 5/81, 6/456, 7/495.


¹ Ibn Al-Esir: Al-Kamel fi Al-Tarix, 10/20.

¹ Yaqut Al Hemewî: Ferhenga Wêjevanan, 2/698, 5/1991.

Xorşîd Şûzî

Bîranînên Têkoşerekî Kurd

Ehmedê Ebdirehman Axa Kurê Şahîn Axa Şûzî ...



Xelek – 8 –

Şêx ji Şahîn pirsî gotiyê: ma Arif beg û Adil beg digel hevalên xwe li cem tene?

Li Şêx vegerand: belê li cem min bûn, lê ji beriya heftekê çûne gundê Arincê cem Osmanê Endelîb muxtarê gund.

Wê şevê em bûne mihvanê wî, camêr pezek ji mere şerjêkir, sibehê zû em çûne ser kaniya gund, piştî me limêja xwe kir, Şêx ji mere got: Divê hin ji me herin gundê Arincê, û hin ji me bimîn vir.

Min ji Şêx re got: Ez hêvî ji Şêxê xwe dikim, kû em tev bi hev re herin Arincê, hemî qûnaxa Çar seeta ye, eger hevalên me li wirbin gelek başe, û eger hevalên me ne li wirbin, emê tevde bi paş de vegezin.

Şêx li min vegeza, û got: Kes ji hevalan deng nake ji te pêve,... Min li Şêx vegeza, û got: Şêx min, êla Xelîl û Xavîta ne li hev in, û eger hinek qasidên me bibînin berê wan li Arincê ye, dibe wan bikujin, lê wextê em tev bi hev re bin, em gelekin, ji ber wilo ez hêvî dikim em tev herin.

Şêx dîsa li min vegeza, û got: Birazî, ez ji te ne razî me, çi dema ez rêkê bidim tiştêkî, tu wî tiştî ji hev bela wela dikî, ez wiha ji tere erêkirin nakim,... Min lê vegeza: Şêx min, xwe ne tengijîne, ev dîtina min bû, û dîsa wek tû dixwazî em di bin emrê tede ne, tû çi bêjî emê wê bikin.

Em hemî tevde meşîn ta em gîştin çiya yê Arnûsê Miksê, Çiyayekî pir mezin û bilinde, avên kaniyan ji nivê çiyê diherikin binê çiyê. Li milê rojhilat ve newalek kûr û firehe, sê gund di newalê de ne. Em ji milê rojava ve çûne nivê çiyê, û em çûne milê rojhilat rûniştin, li himberê rê ya diçê Arincê. Em man rûniştî qederê seetekê.

Şêx Ebdilrehman gazî min kir, û em ji hevalan piçekê dûr ketin, Şêx gote min: birazî, dilê xwe ji min megre, ez poşman bûm li ser ew gotinên min ji tere dan. min lê vegeza: Şêxê min, tû çi ji minre bêjî ez ji te naxeydim, dilê min ji te namîne... Şêx bi destê min girt û em vegezan cem hevalan.

Dema em gîştin cem hevalên xwe, Şêx bi dengê bilind got: gelî mîrxasan wê kî herê gundê Arincê?.. Ebdilrehmanê Mihê gote ezê herim Arincê,... Şêx dû hevalên din pêre kar kirin, û reşbelega Xweyîbûnê da Ebdilrehmanê Mihê, û ji wanre got: wê reşbelegê bidin Arif beg yan Adil beg, wê we nasbikin.

Ebdilrehmanê Mihê digel herdû hevalên xwe dane rê ta ji ber çaqvê me windabûn. hersê peyayên Ermenî ji Şêx re gotin:

Şêxê delal sê peya bi tenê te rêkin ne diruste, eger leşkerin turk rasta wan bînin, nikarin xweş dest hilînin, eger tû izna me bidî emê herin bi dû wande.



Şêx ji wanre gote ne gereke... hêvî ji Şêx kirin kû izna wan bide, û me tevan gote Şêx bila herin bighin hevalan... Şêx gote wan herin lê bilezînin da hûn bighin wan.

Piştî hersê meşîyan, Şêx di ber guhê min de got: birazî, dilê min bi çûna hersêkan ewle nabê, û Ebdilrehmanê Mihê peyayî dil paqije lê nezane, ez ditirsim bê bextiyê lê bikin, divê tû bilez bighê wan,... min da ramanê xwe, û min ji xwere got, divê ez gotina Şêx neşkînim, ji ber wê gelek bitengijê ji min,... ji bo welê min gote Şêx, gotina te di ciyê xwede ye,... Min çentê belavokan û muhra Xweyîbûnê da Şêx, û min û hevalekî me, tifengên xwe dane milê xwe û em bi rê ketin, me lezand ta em gîştin hersê hevalên xwe yê Ermenî.

Em tevde meşîyan ta em gîştin nêzîkî gundê Arincê, gund di newaleke kûr de bû, mipeyak rêkir

gundê Arincê, cem muxtarê gund Osmanê Endelîb; û Ebdilrehmanê Mihê bi dû peyan ve bi dû wan ve çûne nêzîkî gund, Ez peyan ve bi dû wan ve çûne nêzîkî gund, Ez hersê hevalên me yê Ermenî mane ber rê, seet li dor heştê sibehê ye, dengî teqandina fêşekê ji aliyê serê çiya kete gu hê me, bi lez em her çar sekinên, me dengê fişkek din kir, min bi dorbîna xwe bi aliyê serê çiyave nerî lê tiştêk ne xwiya ji min, yek ji hevalê me derkete ser kûpeke bilind, û bi dorbînê meyzande bi aliyê kû dengû fişekan jê hate, lê tiştêk ne dît.

Em mane li ciyê xwe qederê seetekê, peyayê me ji gund vegeza, û gote me: muxtar ne li malê bû, ez mame li hêviya wî ta vegeza, û ji min re got:

Ez destî Şêx maç dikim, jêre bêje, Arif û Adil digel hevalên xwe ji derveyî gundin, lê piştî roj herê ava wê vegezan cem min, bila Şêx û hevalên xwe bêne cem min, mal ji wan re vekiriye çi wextî bighin, emê tevde şev biwêrekî xweş bi hev re derbas kin.

Muxtar bi peyayê mere çewalek nan û penîr rêkirbû, me nîşan da hevalên xwe yê çûbûn milê gund kû vegezan. em tev bi hev re ketin ser rê ya vegezanê, û her yek ji me nan û penîrê xwe dixwê, ji ber em gelek birçî bûn.

Em meşîn qederê dû seet an ta em gîştin serê evrazê, em kêfêkê rûniştin me bîna xwe vekir ji ber rê bi jorve diçû, û em baş westiya bûn, piştî çarîkê me des meşa xwe kir, yek ji hevalan di pêşiya mede dimeşî, dema em nêzîkî ciyê xwe bûn, me dite hevalê me bi paşde bazda û berê xwe da me, dema gîşte cem me rengê wî zer bibû û dihejiya, lê deng jê derket û destê xwe bi aliyê jê vegeza dirêj kir, û bi dengê nîzin recifî digote...Şêx... Şêx....

..... Dumahî heye.....



Dr. Ehmed Xelîl.



Zincîra: (Kurd Di Kûraniya Dîrokê Da)

(Xelex 8)

Pêşiyên Me Yên Arî- Zagrosî

(Med / Mad)

3 - Qonaxa Imperatoriye

(625 - 585 b.z):

Piştî kuştina **Firaortîs**, kurê wî **Key Axsar** (633 –

584 b. z) bû şahê Medan; navê wî di hin jêderên din da ((Keyxisrew)e, ewa rêberekî zana bû, Med ji Skîtan rizgar kirin, ji nû va welatê Faris kir beşek ji şahnişîna Med, êlên koçer bi cih kirin, zagonên nû peyda kirin, leşker li ser bingehên nû organîze kir, tîrevan û siwar ji hevdu cida kirin, li gel şahê Babil **Nebopolaser**, li dijî şahnişîna Aşûr, hevbendî girêda û sala (615 b. z) êreşî şahnişîna Aşûr kir. Piştî gelek cengên dijwar (612 b.z) paytext Neynawa bi darê zorê stand û sala (605 b. z) şahnişîna Aşûr ji holê rakir, şahnişîna Medan bû gewretirîn hêz di Rojavayê Asiyayê da⁽⁵⁾.

Keyxisrew êriş ajot ser Skîtan jî, ew bi hêla rojava da reviyar, û xwe spartin şahnişîna Lîdiya. Keyxisrew sala (590 b. z) da ser Lîdiyayê û şeş salan cengê dom kir, li dawiyê hevbendiyek sala (585 b. z) di navbera Keyxisrew û Îlyatîs (shahê lîdiya) da hat damezrandin, herdu şahên li hev kirin ku çemê Halîs (Qizil Êrmaq) sînorê navbera herdu şahnişînan be, û **Estiyag** kurê Keyxisrew **Erîyes** keça Îlyatîs ji xwe ra wek jin anî⁽⁶⁾.

Bi rastî Keyxisrew şahê gelekî zîrek bû, serkêşên wek wî di dîroka kurdan da pir kêmin, konevaniya navxweyî û dervayî bi hevra dimeşandin; ji hêla navxweyî da gelê Med di hemî çarçewan da kir xudî hêzeka payebilind û ji hêla konevaniya dervayî da, dizanibû çawa hevabendiyên bi sîde tev şahnişînen derdora Mîdiya damezrîne, ku weha nekira wê qet nikariba imperatoriya Aşûr hilweşanda û wê nikariba sînorên imperatoriya Med ji Kendava Farisî da heya Enadolê û Derya Reş fireh bikira.

4 - Qonaxa Têkçûnê (585 - 550 b.z):

Piştî mirina **Keyxisrew** sala (585b. z) kurê wî **Estiyag** (Estiyagîs= Azhi Dahak) şûna wî girt, û tê xuyan ku di salên pêşî da ji serdema destlatdariya xwe, **Estiyag** imperatoriya Med firehtir kir, sînorên wê ji Efganistanê û Hindê da heya Derya Sipî diçû. Lê di salên dawî da, wî û entelegênsiya Med dest bi kêfê kirin, û her çû nakokiyên navxweyî peydabûn, û tevdirên Estiyag yê çewt jî bûn sedema wendakirina hevbendiyê li gel Babil û şahê Ermenistanê. Şahê Farisan; **Qoreşê duwem** kurê

Çavdêriya zimanî: Mustefa Reşîd



Qembêz - diya wî **Mendana** keça Estiyag bû - ev Derfet bi kar anî û hevbendî li gel **Naponîd** şahê Babil û **Yêrwant** destlatdarê Ermenistanê girêdan, û sala (552 b. z) li hember Estiyag rabû⁽⁷⁾.

Tevdirên Estiyag yê navxweyîya çewt, kir ku hinek endamên entelegênsiya Med li dijî wî bi dizî kar bikin, yek ji wan **Harpag** (Harpagos) mezinê serdarên leşkeran bû. Harpag hin ayîndarên mezin û dewlemend û rêberên Rêberên Med bi hêla xwe xistin û xwe dan kêleka Qoreş.

Cengeka mezin di navbera Estiyag û Qoreş da peyda bû. Li dawî, bi sedma xinizîya Harpag û grûpa wî, Estiyag di cengê da şikest, û wek dîl hate girtin. Di pê ra jî şahnişîna Med li derdora sala (550 b. z) an sala (549 b.a) bû parek ji imperatoriya Exmîn ya Farisî⁽⁸⁾.

Jêder:

1 – Diyakonov: Jêdera berê, rû 72, 143. H. G. Wêlz: Nişanên dîroka mirovaniyê, beş 2, rû 350. Hêrodot: Dîroka Hêrodot, rû 80. Arşak Savrastiyân: Kurd û Kurdistan, rû 32. Dîlaport: Welatê navbera du çeman, rû 308.

2 – Diyorant: Çîroka şaristaniyê, beş 2, rû 399. Diyakonov: Jêdera berê, rû 277.

3 – Diyakonov: Jêdera berê: rû 28, 143, 146. Dîlaport: Jêdera berê, rû 308. Diyorant: Jêdera berê, beş 2, rû 400.

4 – Taha Baqir û hinekên din: Dîroka Îranê ya kevin: rû 39 – 40. Mehrad Izady: Kurd.(bi zimanê îngilîzî), rû 32.

5 – Taha Baqir û hinekên din: Jêdera berê, rû 40. Diyorant: Jêdera berê, beş 2 rû 400. Mehrdad Izady: Jêdera berê, rû 32. odot: Jêdera berê, rû 80. Dîlaport: Jêdera berê, rû 320. Diyakonov: Jêdera berê, rû 284, 295, 296

6 – Hêrodot: Jêdera berê; rû 63, 64. Diyakonov: Jêdera berê, rû 302. Harvî Porter: Kurtiya dîroka kevin, rû 87.

7 – Diyorant: Jêdera berê, beş 2, rû 402. Merwan El-Midewwer: Ermen di navbera dîrokê ra, rû 119.

8 – Hêrodot: Jêdera berê: rû 96, 259. Anton Mortkat: Dîroka Rohilatê nêzik ya kevin, rû 350, 367. Diyorant: Jêdera berê, beş 2, rû 410.

Sozdarmidi@outlook.com

Navê Med di zimanê Aşûr da bi awayê (Meday û Matay) hatiye naskirin, di farisî da (Mada), di yûnanî da (Madî/ Mîdî –Medoi), di ermenî da (Mar-k).

Navê Medan di belgehên Aşûr yê sed sala nehemîn b.z da diyar dibe û Aşûr Medan bi „**Medên metirs**“ dinasînin û dibêjin ewana gelekî êlî ye, ti caran di bin serdariya şahêkî da nebûne yek. Hêrodot êlên Medan weha bi nav dike: Boussî, Parîtassî, Stîrokâtî, Arîzantî, Boudî û Magî. Arşak Savrastiyân dide xuyakirin, ku Med ji hêla erdnîgarî, dîrokî û çandî va berdewamiya Gotiyân'e⁽¹⁾.

Bi giştî çar qonaqên sereke di dîroka Medan da diyar dibin:

1- Qonaxa Belevbûnê

(1100 - 727 b.z):

Wek hemî pêşiyên kurdan, imperatoriya Aşûr di her demê da destdirêjî li Medan dikir, lewra cengên Medan li dijî Aşûr gelekî dijwar bûn, şahên Aşûr dajotin ser wan, ziyarên giran bi wan kirin, bajar û gundên wan hildiweşandin, lê tevî vê jî nikaribûn Medan bixin bin desthilata xwe, pêştirîn belgeyên cengên di navbera Aşûr û Medan da digihînin sala (835 b.z)⁽²⁾.

2- Qonaxa Yekbûn û Serhildanan

(727 - 625 b.z):

Di navbera (727 – 675 b. z) da serkêşekî Med î zîrek derket, navê wî **Deyak** (Diyako) bû, Deyako êlên Medan di bin sîwana federasyoneka êlî da civandin, zagon peyda kir, bajarê **Agbatana** (Hemedan) kire paytexta şahnişîna Medan û serhildan li dijî Aşûr gur kir. Lê **Sargonê sêyem** şahê Aşûr serhildana Deyako têk bir, ew jî sala (715 b. z) dîl kir û sirgunî bajarê (Hema) yê li Sûriyê kir, lê piştî demê ew vegehand⁽³⁾.

Di navbera (674 – 653 b. z), **Firaortîs** kurê Deyako desthilatdarê Medan bû, ewa serokekî jîr û jêhatî bû, êlên Medan careka din dane ser hev, gelê Faris xist bin desthilata Med û da ser **Neynawa** (paytexta Aşûr). Lê Skîtan hevbendî li gel Aşûr girêdan û şerê Firaortîs kirin, lewra êriş Firaortîs têk çû, û bi xwe jî hate kuştin. Skîtan dane ser welatê Med û di navbera salên (653 – 625 b. z) da 28 salan ew bindest kirin⁽⁴⁾.

Beyar Robarî

Ger tê sozbidî xaka teyê peyxembereki hûne!- 3



Pênsem hat ez ji dibistanê vegerîm mal, min dît Hejar berî min gihîştî male û xwarin amededikirî û xwarina xwe duxeye .

Min got bira: Xweş û can be û şansê min rinde te yî xwarin çêkirî.

Hejar: Ez çî bikim bira, birçîbûn dijware û ji siba Xwedê de wek tu zanî me çîçik zêtûn û zehter û zêt xwarî. Ev jî hidik maye demijmar bi sisê bin.

Min got: Tu rast dibêjî. Ez jî wek te me, lê belê min sendwîşek felafêl li dibistanê kirî û xwar.

Hejar: Ê te perê te hene û tu kanî bikirî û li di dibistana we buffet heye. Ema li ba me tiştêk wisa tune ye .

Min got: Raste. Bes çawa pere bi te re tunene? Berî çend rojan min xercîyek da te!

Hejar: Belê te da min, lê min pê lînûsin û pêwîstiyên dibistanê kirîn.

Min got: Xemnake ezê heneka din bi te dim.

Hejar: Sipas, bes ez naxwazim barê te giran bikim.

Min got: Berê teyî girankirî û çûyî!

Hejar: Lo em çî bikin, babo halê xwe tenike û zarok pirin. Em naçarin ji te xerciya xwe hincaran ji te bistînin.

Min got: Min negot tişt. Ka Çîlo li kû ye?

Hejar: Ew ji dibistanê hat û yekser çentê xwe kirehev û berê xwe da gerca navendî û hêvarî wê bi gund gîne.

Min got: Başê.

Hejar: Bira pêwîste ez teve te herim hîro?

Min got: Belê pêwîste. Tu ti tiştî nakî, bes tê li wir rûnî û bala xwe bi keçikê dî û paşê tê ji min re xeberdî te ew çawa dît.

Hejar: Lo dîtina min negirînge, ger keçik bi dilê te bû xelasû û çû.

Min got: Tuk e teve min herî û denkirinê zêde negereke. Tiştêk din ger hineka li wir ji te pirsîn tu kîyî? Bibêje ez şûfêrê teksîyê me .

Hejar: Şûfêrê teksîyê!! Çîma?

Min got: Wek ez bi te re dibêjimî û meke pilepil.

Hejar: Wek tu dixwazî. Lê bes wek tu zanî ez bişûfêriyê nizanîm û nejlî cara ez li pişt direksiyon rûniştîm!

Min got: Xemnake tu wer bibêje û bes.

Hejar: Xelas şûfêr.. şûfêr.

Me xwarina xwar û paşê me kincên pak li xwekirin û em hêdî- hêdî ji mal birêketin û me berê xwe da navenda bajêr . Min hejmarek ji kovara Al-Medar bixwere bir û em daketin Huloka Jêrîn û li wir em li otobûsê siwarbûn û çûn Mûnişiyê meydana kû li navenda bajêrê Helebê dikeve .

Li wir em peyabûn û dora sê-çar xulikan meşîn ta em gihîştin pêşiya sînemê. Min bala xwe dayê xalê Hemîd û xalojinê ve hîn nehatinî . Em hinekî li wir rawestîn û min cixarak vexist û kişand û

dibere me ji xwe re, li dîmen û wêneyên li ser dîwar û deriyê sînemê temaşekir . Em man ta xalê Hemîd û xalojinê ve hatin. Piştî silav dayîn û li hal pirsînê em herçar bihevketin û xalê Hemîd ket pêşiya me got: Bipê min din.

Em ketin dû wî û pir dûr neçûn û bi ser milê çepê de em fitilîn û ketin çarşiya jêre digotin ABARA . Li wir xalê Hemîd sekinî û got:

- Xarzê tu ev pankerta (qarma) hanê ya binavê Dr. Emîna dibînî?

Piştî min li jor nêrî û pankêrt dît got:

- Belê xal min dît, bes min nizam ew di qatê çendê de ye!

Xalê Nehso: Ev bijîşgeha wê ye û xemên qatan mexe, jiber em ke bi esensorê derên jor.

Min got: Beşe, keremke di pêşiya me de here, jiber tu rêkê zanî û duyemîn ji ma giştîyan mezintirî.

Xalê Nehso: Hane başê û ez hêvîdar hertim tu wisa ziman şêrîn û biperwerde bî.

Min got: Xal, Xwedê zane kû ez hertim biperwerde me.

Em ketin pê xalê Hemîd û pir dirêjnekir min dît xalo ket avahiyekê û em li du çûn û piştî çend mitran em li ber pêşiya hilkêşkê (esensor) sekinîn Esensorr piştî çend xulikan hat jêr û millet jê derket û em û çend kesin din ve ketinê û xalê Hemîd numra qatê pêncan lêda .

Herkî em ji qatê pêncan ve nêzîk dibûn kute-kuta dilê min zêdedibû û raman bi dehan fikir û raman di dihatîn û diçûn mejiyê min. Ê pirs li ser pirsê diçû û dihat û pest liba min herdiçû bilindibû!!

Hilkêşk gihîşt qatê pêncan û xalê Hemîd derî vekir û em jê derketin û bi hêla çepê ve em fitilîn û li hember me bijîşgeha dr. Emînê min dît. Em dora demijmar pênc û 17 xulikan gihîştin wir û xalê Hemîd bi destikê derî girt û bada û derî vekir û kete hundir û em jî li pê wî derbasî hundir bûn û birakê min Hejar li dawiyê giştikan ket hundir û derî li pê xwe girt.

Dema ez ketim oda bendewariyê ya bîmarvanan min dît li ser milê rastê hemşîreya diktorê berve me hat û bi rûcîkek geş bixêrhatina me kir û got:

Hûn hemî bixêrhatin û dest da me her yekî .

Ji bilî me du jinik û mêrekî ve li hundir rûniştîbûn û li benda dora xwebûn.

Hemşîrê bi erebî got: Tu bixêr hatî û ger ez neşaşim tu Ristemî neweye?

Min got: Sipas, belê ez Ristemim. Ê nave te çîye?

Hemşîrê got: Navê min Sû`hade.

Min got: Navek ciwane û tu bixwe jî gelek ciwanî.

Ew kenî û got:

- Sipas, keremke danîşe. Paşê li xalê Hemîd nêrî û pirsî û got: - Hûn ke çî vexwun?

Xalê Nehso li min nêrî û got:

Ji mamoste bipirse ke çî vexwe!! Ew hîro ji me

giştîyan girîngtîre û

jibo min çî bû dimeşe.

Hemşîrê got: Başê mamoste tu ke çî vexî?

Min got: Mila qehwe be ji kerema te.

Wê got: Serçavan û hûn.

Xalojinê got: Ji min re jî bila qehwe be. Ê berî tu herî qehwê çêkî ka bêje tu kes li ba diktorê heye ?

Hemşîrê got: Belê jinkek û merê wê ve, li ba diktorê ne.

Xalojin: Pirsek din.

Hemşîre: Keremke bêje pirsê xwe.

Xalojin: Smîra li vire an hîn nehatî.

Hemşîre: Smîra hîn nehatî , lê ez bawerim hindik maye bi virgîne.

Xalojin: Başê tu kanî hêdî herî qehwê ji me re, xêra çêkî.

Hemşîre: Berî ez herim qehwê çêkim divê ez xeberê bi diktorê dim dakû zanibe hûn li virin.

Xalojin: Helbet divê zanibe em gihîştinî vir.

Hemşîre: Jixwe wê jî ez tembîkirim û got, bes hûn hatin divê ez wê agadarbikim bihatina we.

Xalojin: Başê, ji mafî wê ye bizanibe em gihîştin vir.

Di wê navberê de derva hêdî tarî bû û çireyên çarşiyê ronîkirin . Min bala xwe dayê her du- sê xulikan hemşîre bi dizî li min dinêre û dikene .

Li gor baweriya min wê hajê hebû jibo çî em hatine bijîşgehê. Ê hebûna xalojinê bes jibo kes gûmanan neke û ti tiştî nabê me ew bixwere birîbû.

Herwisa li gor axiftina xalê Hemîd û pîreka wî bi hemşîrê re, xuyadikir kû ew berê xweşik hevdû nasdikin û hevdû dîtinî.

Pir dirêjnekir hemşîre ji kelingê vegerî û qehwê ji me re anî û danî ser masê û ligel qehwê qedehek avî vexwarinê jî anî .

Dema me qehwe vedixwarî min dît keçik girs û şalek sor di stû de û herwisa kebatek direj lê, bi hundir ket û silav da û yekser çû oda diktorê . Gava bihundir ket xalê Hemîd bi tiliya xwe li lingê min da û ji min re got: Ev Smîra ye.

Lê ez bawerim wê jî balbir kû yek ji du kesên kesê rûniştî ezim. Jiber dema silav da xalê Hemîd û xalojinê, wan li min nêrîn û ew hinekî sorbû.

Ez rastiye bibêjim dema xalê Hemîd tiliya xwe li lingê min da û ji min re got ev ewe, yekser kutekuta dilê rabû û xwûn di sere min de kombû!

Berî Smîra were ew jinik û mêrî ve çûn oda diktorê û demekê li wir man û dipêre ji cem diktorê derketin û çûn mala xwe. Meha kû ev buyer têda pêkhatî meha mijdarê bû û hinek padem sarbû. Jiber wê hêdî mirovan kincên germ lixwe dikirin.

Piştî hatina Smîrê û dema Emînê bangî me kirî da em herin oda wê, dora dehe xulikan derbas bû. Di wê navberê min avrêj serlêdankir û hinekî canê xwe vehesand.

Riyad Elî

Cîranên Taxê

Piştî gelek kesan lome jêkirin, jinişkave, bijîşkê taxê biryara xwe da, ku dê dilê Cîger, bi belaş, derman bike û vî tiştî hişt ku hemi cîran mat bimînin.

Çîroka Cîger, çîrokek dirêje û gelek tevlihevî tê de hene, ji ber ku wî pereyên bavê xwe, yê wê mîrasekî ji wî, xûşk û birayên wî re, ji rojên reş re bûn, giş li kabê, vexwerina araqiyê, û heşîşê, xerabiyên da bû, û di dawiyê de, can û dilê wî jî xerab bûn.

Û ji bilî alîkariya cîranên Cîger, bijîşkê taxê, razî nedibû, ku Cîger bê pere derman bike û di heman demê de, hemi kesên taxê dizanîn, ku ev bijîşk, kesekî bê dil karê xwe dike û gelek ji wan digot, ku bijîşkên Cîhanê bi tevahî li aliyekî û tenê yê me li aliyekî dine, rehmet di dilê wî de nîne.

Ma kê bawer dikir, ku ev bijîşkê bê dil dê dilê Cîger bê pere derman bike..!?

Tevî ku cîran bi Cîger re sekînin, lê wî jialiyê xwe ve, ti balkêşî ne dida wan û alîkariya wan bi tiştekî nedihesband, ji ber ku wî dizanîbû, ku zimanên wan weke bîcixeyekê ye û tucaran wî vehesî nahêlin.

Carekê, wîguhê xwe da gotinên wan û bihîst, ku çawa henekên xwe pê dikirin, herwiha, kesekî ji wan got : Bijîşkê bê dile, û nexweş jî bê dile û herdu alî li nexweşiya dil heyirîne !!

Roj derbas bûn û roja ku Cîger dê bikeve bin kêr û derziyên bijîşk, hat .

Wê sibehê, cîranê Cîger, ji bo bi wî, li ser riya nexweşxaneyê kevin, li ber deriyê mala wî sekînin.

Kesekî ji wan bang lê kir:

Cîger! Law Cîger! .. Ma tu ji xewê ranebûye..?

Û yekî din jî got: Tu li ku mayî Cîger..? Ma tu nizanî, ku ne ji me ba, tu bê pere ne dihata dermankirin..??

Cîranekî din bang li hevalên xwe kir û got: werin em derî bişkînin, hûn dizanin, ku xewa Cîger giran e..!!

Deriyê mala Cîger şikestin û bi lez, derbasî mala wî bûn, bang li Cîger kirin, da ku ji xewê rabe, lê ew dîwar livî, û Cîger jî cihê xwe nelivî.

Cîranekî bang lêkir: Ma tu ji Xwedê natirsî?? Ti berpirsiyarî di dilê te de tune?? Em giş li te heyirîne û tu jî xemxweriyê ji me re diyarnakî, ma bijîşkê taxê wê dilê me derman bike, lê yê te??

Lê wî nizanîbû, ku ew bi termê Cîger re diaxêve, ji ber ku Cîger emanet radestî Xwedê kiribû û ji mineta cîranên xwe xelas bûbû.

Niştociyên taxê, termê Cîgerê xwe rakirin û berê xwe dan goristana gund, û her kesekî di dilê xwe de gelek hêviyên qirêj û gemar veşartin .

Cîger mir, bila hemi cîranên wî vehesin, lê pîrsa cîranan ku bê bersiv mabû, ew bû, ku çima Cîger dê alîkariyên wan bê sude bike ..?



Hevpeyvîna Pênûsa nû bi dengbêjekî civaka Êzdî,

Hevpeyvîn: Kemal Tolan

TETERÊ ELİYÊ MAMED RE! -Xelex 2 -



Dengbêj Teterê Eliyê Mamed û K.Tolan

Kemal: Siheta te xweş be Xalê Teter, tû dikarî çend mînakên din jî, ji çêkirina kilamên rahmetiyê bavê xwe ji me ra bibêjî?

Teter: Belê, rahmetiyê bavê min ev sitrana Kolosê Aqo jî bi xwe çêkiriye:

De ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê ê ê...!

Fatimê digo, Koloso xweyî yê abvê min o,

Ezê bi hafa Şimza bavê Misto diketim, îro rê digunde,

Kulê tû bi kulbî, bikevî berê mala Ozmanê Emer,

bavê Wezîr, gamêşê qerboz siware, cahniyekî çavreşî nêr wa di bin de,

ketiye Şimza bavê Misto, silav kiriye, tevaya millet rabune ji ber de.

Ez bala xwe didime bavê Bişar, siwarê xoro, mîrê zirav, êba besrawî berdaye ser kêlîka mil de,

şal û şapikên Fransayî berdaye ser guzeka ling de,

Xwedê jî zane paxav nekiriye, ranebû ji ber de,

Fatimê digo Koloso, piştî xwe me de Ozmanê Emer, bavê Wezîr, gamêşê qerboz,

tû nizanî kula Şewlê Dela, qêrê Şêxevinda, Çah Şorikê maye di dil de.

Ê belê min go Xwedê jî zane, şade şudê Kolosê Aqo, bavê Bişar gelekî,

derbekê daye Ozmanê Mihê, Resulê Elî zavê salê, weke pirzika wa di binde bigir e, ew kul maye di dil de.

De ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê ê ê...!

Fatimê digo, Koloso xweyî yê abvê min o,

ne min go, piştî xwe me de Ozmanê Emer, vî koçerî, vî neyarî,

kula Şewlê Dela, qêrê Şêxevinda, Çah Şorikê maye di dil de.

Min dî Ozmanê Emer, bavê Wezîr ji xopana Şimzê rabû bi giranî,

xwe berdaye nav Malêbinyê, lêjneke qewîn ji Erika wa bi xwe ra anî.

Kul têkeve berê mala Emerê Şero, bavê kura wa di pêşiyê de,

Bi sê kemîna li pêşiya bavê Bişar, siwarê xoro de danî,

Du peyayên malik şewitî, li pozê qerepanka di pêşiya wî da şêrgelanî.

Min dî bavê Bişar, axayê zirav, maqulê giran, ji xopana Şimzê dageriya bi axatî,

lê belê filê Zêwikê, Xazarê Çaro bi sê denga li bavê Bişar kire gazî go,
Koloso mala te şewitiyo, Ozmanê Emer, bi sê kemîna li pêşiya te de şêrgê danî .

Şade şudê bavê Bişar, siwarê xoro gelekî li dinya yê, parsû stûrbû maqulo li xwe dananî, tevn û bertengê xoro şidandiye bi romanî,

gav ketiye silavgeha şewitî, wan hersê kemîna li ber bavê Bişar desthilanî, kul têkeve ber wan herdû peyayên li qerepanka, derba bi hespê ve danî.

De hêlî, sedcarî din jî bi min hêlî,

ji xêra mala Xwedê ra, hinga li Kolosê Aqo, bavê Bişar bû tengayî,

bila hingê Aqoyê bira bibûna piştîmêrî.

Fatimê digo, Koloso xweyî yê abvê min xweştiro,

ezê bi Şêhaniya şewitî di ketim, wa li wa kaşa,

tilî û pêçikên bavê Bişar, xwiyanakin ji gustîla, şeş pa ji van qaja,

Ez ne ketime ber kuştin û girtina bavê Bişar, ezê ketime ber wê yekê,

Cinazê bavê Bişar birne kambaxa Malêbinyê, nava wan neyara.

Ne wa bê, sedcarî din jî bi min ne wa bê,

şade û şudê bavê Bişarê Kolos, bavê Gindo gelekî li dinya yê,

gilikirye bîstûsê hep ji mala Remo digirtin,

berê wan dane hepsa Séertê, Betlîsê, Diyarbekir.

Ji gotinê dengbêjê berê, çar heb ne hatine malê.

Şade û şudê bavê Bişarê Kolos gelekî,

lêjne rakiriye ji xopana Beriyê,

ketiye dora silavgeha Baximza bavê Eyo,

dike û nake, keysa kuştinê li Ozmanê Emer na nî,

Berê xwe berdaye Gola Hamid, Kaniya Kelê, terş û sewalê Ozmanê Emer biriyê bi mêranî.

De ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê, ha yê ê ê...!

Fatimê digo, Koloso mala te şewitiyo, na be,

Şêwr û mişêwrên mala Zoro girane,

bêrî bavê Bişar, doz nabe lo o o o

Teter: Her wusa rahmetiyê bavê min, ji gelek kesan re kilama Seyrê û Biro jî gotiye û ewî digote min, min ev kilama Seyrê û Biro bi vî hawayî berhevki riye:

Wexta Biro nexweş ketibû, ewî bihîstibû ku ez jî di herêma wî de dengbêjekî baş im. Ji ber ku ewî zanî bû, êdî tu fitla wî ji ber wê nexweşiya ne başe tûne ye û ew hewdikare bisitrê, ew radibe rojakê qazidekî dişîne pey min û xwastibû ku ez herime cem wî.

Jixwe min di vê demê de, nû dest bi dengbêjîyê kiribû û kî ji bo dengbêjîyê bihata pey min, ez pê re diçûm.

Wexta ez çûme mala Biro, Biro gote min, min bihîstiyê ku tû jî dengbêjekî başî. Ez dixwazim tû niha guhê xwe baş bidî ser vê buyer û kilama ku min berhevki riye. Ez hêvîdarim ku tû jî vê kilama min ji xwe ra hilînî û ew bi xêra dengbêjîya te di gelek ciyan de bê gotin. Ji bo ku ev evîndariya min heta û heta li ser gelek zaran bêye gotin.

Min jî gote Biro serçavan, de ka kerem ke, buyer û kilama evîndariya xwe ji min ra bibêje!

Vêca Biro wisa bi wê nexweşiya xwe, buyer û kilama xwe ji min re weha got:

Biro got, Elî weke ku tû jî dibînî, bavê min Oso jî di vî gundê Barisil (ev gunda li ser herêma Batmanê ye) de gelekî dewlemend bû. Ez jî di wextê xwe de xortekî gelekî dilber û heta tû bêjî, î delal bûm. Bavê min Oso, timî digote kurê min Biro, lawo ji xwe ra bizewice û min jî digot, ez na zewicim.

Carekê hinga bavê min dîsa gotê min, lawo tû çima nazewicî?

Min jî gote bavê xwe, heyran ku tû birastî dixwazî ez bizewicim, divê tû min di nav dinya yê de azad berdî!

Bavê min got başe kurê min, de haşte ra vê hêstirê, kerê ji xwe ra barbîke ûdû hevalên xwe jî bixwe ra bive. Here heta ku tû ji xwe ra qîzeke bi dilê xwe peyda bikî û bîne pêre bizewice.

Ez rabûm tevî dî hevalên xwe va ji Barisil derketim û bi karwanî geriyam.

Em çûne aliyê gundê Bamerdê, Ridwanê, ketine deşta Xerza, hatine nav herêma Qubînê û min tû kesek ji xwe ra nedît.

Roja ku em hatin gihîştine herêma qeza Silîvana, me konê xwe li ser mêrga Tapa Barava (nêzikî bajarê Amedê ye) danî. Piştî ku em hinekî li ser mêrgê man û pêde, min dît, dî reş ji pişt me de derketin û hatine ser mêrgê. Gava hatin nêzikî me bûn, min dît va jineke ku, namila wê tev di zêrde pêçayî û bi kîloyan zêr pêve heye, hat ba me û got, merheba ji we ra!

Me jî gotê, merheba û ser çavan!

Ewê got, pîrse bê eybe, hûn ji kurine?

Min gotê, wele em ji Bişêriyê ne.

Jinikê got, hûn xelqê Bişêriyê ne?

Min gotê, belê wele em ji Bişêriyê ne.

Ewê got, bi Xwedê tiştê ku min bihistiye, kesê ku ji Bişêriyê be û ne dengbêj be tûne, bila raste?

Gava ewê wisa got, kêfa min gelekî hat û hêrsê min rabûn. Min dikir bibêjim, hima tû dinava me de kî bicibînî, ew dengbêje. Lê, min hew xwe girt û di cîh de gote jinkê, kilê çavên te ezim û ez dengbêjim.

Jinikê ji min pîrskir û gotê navê te bixêr?

Min gotê, navê min Biraîm e.

Ewê gote Biraîm, bila emrê min bi qurbana emrê te be û canê min jî bi qurbana canê te be! Bi serê şex Mîstefayê Tapa Beravakim, ezê niha herim şîva we çêkim û bînim. Lê tû bizanîbî, gava ez bêm, îşev xew ji min û te ra tû ne. Emê bisitrana bidinê ber hevûdinê, heta ku sibe li me ron bive.

Piştî ku jinik çû pê ve, em bawernakin ku ew cardinê were. Yekî ji me got, wele ewê bê û yê dinê jî got, de ka em hinekî xwe li hêviya sozê jinika Silîvanî bigirin. Min jî got, de bi Xwedê, gava ew îşev bê, ezê wê birevînim.

Demek derbas bû, me dît va ew herdû reşên me dîsa ji dûr ve derketin û hatin. Hatin, cefiniyek tijî pîrince û li ser serê wê jî tije mirîşken pijandî ye di nava me danîn. Hat li kêleka hevalên min û li ser çoka rûnişt û gote min de kerembikin, xwarina xwe bixwin.

Min gotê, de ka tû jî navê xwe ji min ra bibêje û tû çi kesî?

Jinikê got, navê min Seyrê ye û ez hêja qîzim.

Heta ewê navê xwe ji min re got, awir didane min, hevalên min jî cefîniya mezin valekirin.

Seyrê gote min, wele Biraîm te tu xwarin ne xwar.

Min gotê, Seyrê dilê min ji dîtina tîr nabe.....

Seyrê gote min, ne min beriya niha ji te ra gotibû. Îşev yek ji min, yek jî ji te ye û emê niha êdî bisitrana bidine berhevûdinê.

Teter: Bavê min digot, gava Biro di ber sitranê de ji hal ket û hewkarîbû kilama xwe tamam bike. Min gotê Biro, de ka tû êdî li min guhdarî bike!

Min rabû hinek gotinên ku ewî baş li hevûdinê ne runştandibûn, ji cem xwe va bi ser kilama Biro û Seyrê ve zêdekirin.

Min destên xwe kirine kerika guhên xwe û got:

Êdî kilama Seyrê û Biro gelekî dirêje, belkî gelek jî ev kilama nivîsandine, lewma min nehîşt X.Teter jî wê bibêje K.T.

Bavê min digot, hinga ku Biro ev kilama xwe û Seyrê bi deng û peyvên min hûnandî guhdarî kir û pêve, gote min, Elî wele miradê me bi hevûdinê ne bû, lê ez baş bawerim, ewê bixêra vî deng û xweş sitirana te, heta û heta li cem gelek evîndaran û li nava gelek herêman belabive. Eger ez îro jî bimirim, ez dizanim êdî ev kilma me, wê her û her sax be.

Buyera vê kilama ku ji ber gotina Biro, Seyrê û bavê min Eliyê Mamed hatiye afirandin, bi texmîna min di sala 1925-30 de buye.

Teter: Bavê min li ser hûnandina kilama **Mileto, mileto, mileto, mileto....** û **hay mileto** jî weha digot:

Ez rojekê çume gundê me Batranê û di peyra jî çûme mala zavê me yê ku li gundê Beybo bû dima. Gava ku ez ji mala zavê me derketim, dikim werime malê. Zavê me jî radibe diçe mala axê gundê xwe. Hingê navê axê gundê Beybo, Usiv Efendî bû. Hinga zavê me diçe civata Usiv Efendî, dibîne va sê dengbêjen ku ji welatê Serhedê hîtime jî di civatê de amade ne û ew bi hevûdinê re ketibûne pêşberka strana. Zavê me digot, gava Usiv Efendî li van her sê camêra guhdarî dikir, ji nişkê ve keser hatinê û gote beşdarî, ax ji xêra Xwedê ra, vêga ew dengbêjê ku li herêma Xerzan de deng daye jî niha li vir bûn a. Min bidîta, ka ewê çewa li dijî van her sê dengbêjan derketa.

Zavê me dibêje Usiv Efendî, wele ewê ku tû qala wî dikî, niha ji mala min derket û çû. Usiv Efendî dibêje zavê me, de here bi peykeve û wî bîne vêderê.

Hinga ez gihîştine wî hevrazê li hemberî Beybo yê, min bihist ku yek gazî min dike û dibêje, mam Elî, mam Elî!

Ez rawestiyam heta ew kes hat, min dît va zavê me ye.

Min gotê, çibuye kuro?

Ewî got, Mam Elî ka were Usiv Efendî te dixwaz e.

Ez vegeyriyam, hatime civatê. Min dît va sê dengbêj li berhevûdinê rûniştine, qîre qîre wane û disitrên.

Usiv Efendî gote wan camêran, de ka bila ev dengbêj jî bikeve nav pêşberka we.

Min gote wan her sê dengbêjan, hûn hersê li aliyekî û ez bitenê jî li aliyekî bibêjim. Ezê tenê jî weke we, sitranên miqamên herêma Serhedê û ne kilamên herêma xwe bibêjim. Ewan ji van gotinên min bawernekirin. Lê, me dest bigotina sitranan kir. Piştî demekê hersê dengbêj jî ji ber min rabûn, destên xwe danîne serhevûdinê û gotine Usiv Efendî, Xwedê em nikarin ji heqî vî camêrî derkevin.

Min jî gote wan dengbêjan, gerek hûn li her civatê de van kilamên nivco nebêjin.

Bavê min, ev şerê Bartasê di nava sihetekê de çêkiriye (ev gundê Bartasê di herêma Xerza de ye û hingê di bin bandora mala Cemîlê Çeto de bû. Bavê min digot, di wî wextê ku Cemîl avîtibû ser gundê Bartasê û Bartasê teslîm girtibû. Ez jî dî buyerê re çume civata Cemîl. Cemîl dibêje herdû dengbêjê xwe, de ka hûn jî kilamekê li ser bavê Feremez çêkin. Dengbêjê wî gotnê, bi serê bavê te, em hîna nikarin vê buyerê biserhevûdinê ve deynin. Min jî gote camêrekî, ji Cemîl axa ra bibêje, eger ew destûrê bide min, ez dikerim niha kilamekê li ser şerê wî bibêjim. Gava ev daxwaza min gihîşte Cemîl, ewî gote min de ka tû bibêje! Min destên xwe kirine kerika guhên xwe û min got:

Mileto, mileto, mileto, mileto..... û hay mileto

Gelo xayîno û ji xwe bêbexto,

Maqulo, dilê minî dilanî dîne, eva serê sê roja Cemîlê Çeto, bavê Feremez, siwarê çalo, kekê Bişar ketî nava eskerê Erika, Rema Pencinara dicivîne,

di şefeqa serê sibê de girtiye li kambaxa Batasê, li ser serê bavê zekiya diteqîne,

ezê bêjme bavê zekiya, maqulo, wez li bextê te me, tu li bextê Xwedê û rebê li jorîne,

tu piştî xwe nedî kurê Hacî Reso, mêrkê madiye, hevalê xwîna saren,

gava roja roj reş dibî, xwîn birêjê, mêr bêne kuştinê, wê rojê dû reşê na şixwîlîn, xwezî gava li bavê Zekiya bû tengayî, jêre derketa serê Eliyê Ozman, Xalitê Dawa, Ahmedê Fariz bavê Ebedîne..(Ev kilama Usivê Beso gotiye û min ji ber dengê wî nivîsandiye K.T.)

Bavê min digot, gava min kilam qedand, êdî Cemîl rabû ser xwe û got:

helal be ji te û dengêjîya te ra. Zêrek ji berîka xwe derxist û da destê min.

Teter: Bavê min li ser hûnandina **Kilama jinkeke dilkefî jî got:**

Ez rojekê di çemê Şako ra derbasbûm û min da hevrazê temo. Min dît jinikeke cindikiya ku teşiyê di resî got, wa kirîv û min got, wa!

Jinkê got, kirîvo wisa ne norîne, Weyso, Elo û Miho diheri, cînarekî me miriye û ku ew dengê te bihîzin, ewê erzê te bivin. Min rabû bêhnek da strana xwe.

Jinikê piştî bihnekê dîsa got, wa kirîv!

Min got, ha kirîvê!

Jinikê got kirîv, ez di bextê dîne te, ez di bextê dîne te deme, min zahf dilgirtiye û tû yê kilameke dilika ya hênîk, ji kirîva xwe ra bêjî, bila hepki ferça dilê min deynî!

Min destên xwe bilindkir, tilîkên xwe xistine kerika guhên xwe û got:

Lê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê.....

Kabê kubarê malê barkirine, danîne zozanê jorîn, li ser mala, li ser êhlê,

kembere zirave xwe nagire li newqê, li kêlekê, li tihêlê,

ez bi xwilama te wê girêdahnê, wê biçimê, wê fasahlê, wê tintêhlê,

rabe ezê gerdenê bozî beyazî, dev û lèn kaxezî, pozê qudimî, eniya kehvelî bigrim bi revînim

Ezê xwe bavê zozanê jorîn, tor û bextê bavê Selhedîn, fexê mala xels, reîsê êhlê

Belkî li min û kewa gozele gozelçînî bihata xêrê,

Narîne le lê, lê lelê, lê lelê û werdekê lê lelê, lê lelê, lê lelê.....

Jinkê got, ox xweyîk kirîv, Xwedê kurê te bihêlî. Hepkî felça dilê mîn danî, hepki bihna min derket.

Ez di bextê dîne te, ez di bextê dîne te deme, tû yeke dinjî fena vê bêjî....

Min dîsa got,

Lê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê, lê lelê.....

Kabê kubarê dilê min dilanî dîne, xwezila te zanibuya, bejna te çiqas di dilê min de şêrîne.

Bejin zirave, têt û kembera li bejnê, li kêlekê, li newqê, li tihêlê tew tinîne.

Rabe bila dilê te nemîne, ezê defdenî bozî beyazî, dev û lèvên kaxezî, pozê qudimî, eniya kehvelî bigrim, ji nava heval û holtaşa birevînim,

Ezê xwe bavêjime zozanê jorîn, tor û bextê bavê Selhedîne

Eger got, bêgara we bêgareke girane, micala pê tinîne,

Ez xwe bavê şêxê mezin, jêra dêjin Şêx Şahbedîne,

Xelqa delal nivê me temûz û tabaxê,

mîna kihêlek ji kihêlê Mistoyê Mîrî, bivî ser ava hewz, kanî, delavan bigerîne.

Hewqa serê xwe li min evdalî bilindikî, ser sima li min rebenî di weşîn

Narîne le lê, û werdekê lê lelê, lê lelê, lê lelê.....

Jinkê got, ox xweyîk kirîv, Xwedê kurê te bihêlî.

Hepkî felça dilê mîn danî, hepki bihna min derket.

Ez di bextê dîne te, ez di bextê dîne te deme, tû yeke dinjî fena vê bêjî....

Min gotê, de here lê bese ...

(Ev kilama jî rahmetiyê Usivê Beso gotiye û min ji ber dengê wî nivîsandiye K.T.)

Teter: **Tiştê ku niha di bîra min de maye, navên hinek kilamên ku bavê min bi xwe hunandine wehane:**

Kilama şerê mala Eliyê Unis, Şerê Seyîtxan, kilama evîndariya Şerîfê kurê mîrê Hewêriya û Edûla qîza Mistefê (Ez bawerim ev buyera jî li herêma Farqînê qewimiye...)

şerê Hesoyê Birahîm (Buyera ku Heso aniya serê Ahmedê bavê Emîne Perîxanê û dûre hinga Emero û Misto, Heso kuştine), şerê Sebriyê Siloqî, Kilama Şêxo û Meyro, Siva Heciya, Gewrê û Mele, Jineke li ser mezê û karê kubarê –

Mixabin, ez bi jimara kilam û sitranên ku bavê min çêkirine nizanîm. Lê ewî timî ev kilaman digotin:

Bavê Fexriya, Dewrêşê Evdî, Şêx Fexrî, Silêmanê Mistê, Bro û Seyro, Seyîdxan, Emer û Misto, Mededê, Şêxo û Meyro, Kolesê Aqo, Fîlêto Qito, Şerîf û Edê, Ozmanê Gewrê, Şerê Erenzê, Şerê Hesoyê Brahîm, Gewrê, Sêviya Heciya, Şerê Baximzê, Sebriyê Silokî, Şerê Reşkota û Sînika, Qolîbabayê Ronî, Nadilo, Keçika Baravî, Nûrê, Xelîlê Simê û hwd...

Kemal: **Xalê Teter, ev kilama Mala Eliyê Unis ku te bi xwe jî gotiye, te ji ber gotinên rahmetiyê bavê xwe girtiye ?**

Teter: Belê, ji xwe tû kes jî nikare tam bi tamamî weke hevûdinê bibêje. Lê, piraniya gotinên min yê rahmetiyê bavê min in

Kemal: **Xalê Teter, gava hinek dengbêj kilam anjî sitranên rahmetiyê bavê te disitrên û navê rahmetî bibîr na înin, tû acis dibî an na ?**

Teter: Bêguman, gava ku sitranbêj emeka camêran bibîrbînin, dilê meriv xweş dibe. Vêca, her kes u şîrê xwe û gereke meriv bi keda kesî ne leyîze.

Kemal: **Xalê Teter, Gelo! Ji nav stranên Xwedê jê raziye bavê te, ku tû herî zêde hez jê dikir û tû dixwazî îro lê guhdarî bikî kîjane?**

Teter: Kêfa min herî zêde ji kilama *Gulê mahrûmê çiya bilin den*, ez te nabînim, -

Serê daran û gulan na çîlpînim,

Tû gulan, di ser gula xwe de na hebînim....

ra dihat.....

Kemal: **Xalê Teter, çi cudefî dinavbêna adetên me û Almanan de hene û kîjan xwe in?**

Teter: Bi Xwedê, adetên me û Almanan qet berhevûdinê ve naçin û tûcarî jî em nikarin wekehevûdinê bivin.

Eva serê 34 salan, ez li Almanya yê me û hêja dostek anjî nasekî min yê Alman be tûne. Ez hêjî nikarim herim cem Almanekî û Almanek jî nikare qasekî were em bi hevûdinê re şewbêrkekê derbasbikin.

Tiştê ku ez û cînarên xwe dikarin ji hevûdinê fêhmdikin, tenê em ji hev re dêjin: Mion, Moin (Silav, Silav) ! De vêca, emê çawa ji hevûdinê fahmbikin

Kemal: **Xalê Teter, tû dikarî di dawiyê de, bahsa daxwaziyan xwe yê ku min nikarîbû anjî min ne anîne ser ziman bikî?.**


Teter: Xwarziyê Kemal, tiştê ku ez herî zêde pê diêşim, ev rewşa van zarokên me, yê ku bi tenê mezin dibin, kesekî hevalên wan yê Êzdî tûne ne ku bi hevûdinê re bileyîzin û ew wextê xwe bi tenê derbasdikin. Ez dibêjim, ev zarokên me zahf guhne ne û guhneyê wan jî kete stuyê me...

*Spasiyeke bi taybetî û gelekî ji dil ji bo xuşka Salîhe Acar, evê xanimê jî weke jinbir, xuşk û birayên xwe zahf alîkariya tomarkirina sitranên bavê xwe da min!

Kemal Tolan- Xemxwar û Berhevkarê Kevneşopên Êzdîtiyê

Hevpeyvîna Pênûsa nû ligel torevan û helbestvana kurd

Fedwa Gêlanî re



Hevpeyvîn: Ebdulbaqî Huseynî



Fedwa Gêlanî keça Eyn Dîwar, dilê Kurdistanê û cîgehê hersê perçên ku ji xarîta welat dighên hev .

Ewê xwendina xwe li zanîngeha Helebê li Sûriyê pêkanî, li wir zimanê fermî bes erebî ye, dema ku cihê zimanê kurdî di canda Sûriyê de tune ye, loma Fedwa bes bi zimanê erebî helbestên xwe nivîsandine.

Ewê helbest nivîsandin û biserket, paş re Bachelor di toreya erebî de stand, du pirtûkên helbestî afirandin (Sîya ku xwediyê xwe nasnake) û (Navên ku di carcewa xweyî kesk de ye), herwekî berhevoke weyî çîrokan heye bi navê (Mala apê seyid) .

Ji ber ku Fedwa ji malbateke niştimanperwêre, ewê ji rojên pêşîn ji şoreşa Sûriyê ku destpêkir ta îro, piştewaniya wê kir û gav bi gav wê dişopand .

Fedwa Gêlanî hatiyê nasîn di gelek çalakiyan de, çî di warê toreyî û çandî de û çî di warê sazî de, ew îro endama komîta birêvebire di Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriya, herwiha karê siyasî ligel tevgera niştimanî kurdî li sûriyê dişopîne.

Rojnameya (Pênûsa Nû) ev hevpeyvîn ligel wê kir:

Rojnameya (Pênûsa Nû) ev hevpeyvîn ligel wê kir:

1. Ligel hemî zanyariyên ku li ser rûpelên internêttê hene, û bi taybet di malpera Wikîpêdya de ku li ser te hatiye nivîsandin, Giringtirîn sitasyon di jiyana toreyî de linik Fedwa Gêlanî çine?

Bersiv: Stasyon gelek in, ez neşê ku li hemîyan rawestim, û nabe ku ez hinan tune bikim, tiştê ku ez karim bêjim eve; Gelekî hezkirina min bo xwendinê heye, û bi taybetî xwendina helbestan. Stasyon gelek in, a yekem ewbû ku wekû hemî keç û xortan, min dest bi nivîsandinê kir, paş re çûme za nîngehê ku stasyona didwan bû, li wir gelekî hişmendiya min derbarî

Helbest û helbestvanan de firehbû . Lê piştî demek dirêj ji zewaca min ku stasyona sisyan bû, dûrî atmosfera helbestê ketim, paş re kar bi dû ve hat .

Lê vê dawiyê helbest ji nû ve di can min de hişyar bû û min dest binivîsandinê dîsa kir, û li berhemên xweyî kevin vegeyîyam û ew ji nûve kiraseyk nûjen li wan kir.

2. Derbarî serbora teyî helbestî, ji ber ku tu bi helbesta xweyî bexşan hatiye naskirin, tu dikare hinkî li ser vê serborê biaxive, gelo kengî te destpêkir , ezmûnên ku hist ti helbestê binivîsîne çibûn?

Bersiv: Min xwe nêzîkî helbestê didît, ku helbest di hundirê min de dijî.. Min helbesta bi movik nivîsand, paş re a stranî û vê dawiyê a bexşan ku di rengê canê min de ye...

3. Tu bi zimanê erebî dinivîsîne, digel ku çêbûna te li Dêrka Hemko bû, ev bajarê nêzîkî baytexta zimanê kurdî (Cezîra Botan), çima bes bi erebî dinivîsînî û ne bi kurdî?

Bersiv: eve xaleke li ser min tê qeydkirin, çendî min hez dikir ku ez karibim bi zimanê dayîkê binivîsînim, hin hewldanên min di vê çerçewê de hene, û hêvîyek min heye ku ez karibim nivîsandina bi zimanê kurdî berdewambikim, digel ku ez ji nivîsandina xwe a erebî razîme, lê min dixwest ku bi zimanê dayîkî be.

Belê, nivîsandina bi zimanê dayîkî dimîne xewna minî a herî mezin .

4. Di toreya kurdî de, wekû di toreya erebî de, hin helbestvanên navdar û derhênan hene, çî nû çî kevin, Fedwa Gêlanî bi kî ji helbestvanên kilasîk hatiye bandorkirin, di vî warî de, kî ji wan (çî zilam çî pîrek) nêzîkî canê te ne?

Bersiv: Kîrara bandorê an di bin bandorê de bo kesê dahênan, hinekî zore ku bi nav bike, ez dikarim hin navên kevin bidim xuyanî, ewên ku ez bi toreya wan hatim sotin, min gelek berhemên wan xwendin, sûdeyê mezin min ji wan wergirt, lê ka cihê helbesta min, eve ez nizanim, lê belê kesên rexnevan vê dizanin, û karin zanibin bê helbesta min di bin çî bandorê de derbas bûye.

5. Tu ji kesên çalake di warê nivîsandinê de, û bi taybetî li ser Facebookê, li wir herdem tu helbestên xwe û hin nerînên xwe belavdike, û herwiha quncikek teyî nivîsandinê di rojnameya (Pênûsa Nû) de heye, rojnama HNRKS, tu çawa van alavên weşanê dinexîne, û çî nerîna te li ser rojnama Hevbendê heye?

Bersiv: şoreşa peywendiyê hiştiye ku derfet ji hemî kesan re vebe, çî kesên xwedî dahênan û çî kesên ku nû dest binivîsandinê kirine, herdu celeb di aynî cihê de dinivîsîn.

Derbarî rojnameya Pênûsa Nû, ew serbora pêşîne di warê ragehandinê û belavkirina çanda kurd de, di bin asmanê şoreşa Sûrî de, rojname dikaribû rewşeke giring di warê çandeyî de biafirîne,.. ez bi xwe her serê mehê bendawarî hejmarê taze me ji rojnameyê, herwiha ez jî yek ji nivîskarê wê me, ewê şûneke mezin di nava min de çêkirî ye.

6. Li ser babeta xelatan ên ku di warê afrandinê û karên çandeyî de têne belavkirin, em hez dikin ku tu li ser xelata dawî a ku dewleta Îmarat dabû te raweste. Gelo xelatên wiha dibin piştevanî Bo kesên rewşenbîr Bo dahênanê zêde bide, hestê Te çawabû û tu vê xelatê werdigre?

Bersiv: Ew bi xwe ne xelateke fermî bû, lê belê xelateke sîmbolîk bû, ji ber min şevê helbestî li wir pêşkêşkiribû,

Lê xelata herî mezin ew bû, ku min endametiya yekîtiya nivîskarên Îmaratiyan qezandir, û ew min gelekî şadkir.

Derbarî xelatan, ez dibînim tiştêkî hêjaye, û wataya wê ewe ku serbora mirovên dahênan dide berbiçav, û hin xelat hene ku hin pere jî jê tên .

7. Serbora te di warê sazî de, ji ber ku tu endama komîta birêvebire a Hevbenda nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûrîya yê, nêrîna te di vê tevgera dawî li ser meydana çandeyî dinavbera kurdên Sûrîya de çiyê? Ev nelhevîya rewşenbîran li bal me tiştêkî normale, an nêrîneke teyî cuda heye?

Bersiv: Şoreşa Sûrî hişt ku em nêrîna xwe di gelek tiştan de bugherin, di pêlê de gelek sazîyên nû hatin binavkirin, û ew tiştêkî başe, ku sazîyên civaka sivil pêkweirin, lê rewşa Hevbenda me a nivîskar û rojnamevanan serboreke taybete, ji her nivîskarî û rojnamevanekî tê xwestin ku serê xwe hilde ku sazîyek wiha bo wan hatiye peydakirin, lê di hê mi xabinyêye ku hin kes hene bes li navên xwe û hebûna xwe digerin. Û hin kes hene rapeşki van sazîyan bûne, tu xema wî nîne jibilî nefsa wî,.. li vir hêvîya min heye ji wan kesan ku ji ezîtiya xwe rizgar bibin, û berên xwe bidin karê hevbeş. Ji alî min ve ez dibînim ku komîta Hevbenda me dîrokeke wîyî xebatî heye di warê sazîyan de, û baweriya komîtê bi karê hevbeş heye, gereke ji her kesê rewşenbîrê ku dil heye sazîyekê durust bike, hinekî bi rame û zanibe çend

Sûdeya vê sazîyê heye û çend xerabiya wê heye, ji ber vê dema dawî me dît ku kesên van sazîyan durustdikin, mebesta wan xerabe .

8. Ji ber tu ji jinên pêşîn bû ên ku li ser şoreşa Sûrîyê nivîsandin, û bi wijdanê xwe têkilî wê bûn, nêrîna te ji vê serpêhatiya şoreşa Sûrî re çiyê , nemze ku dikeve sala xweyî çaremîn?

Bersiv: Şoreşa Sûrî bû qurban ji şoreşên buhara erebî re, û gelê Sûrî ba ca mezin di jiyane xwe de dide, ji ber dekûdolabî li ser gel û şoreşa wî re hatekirin, eger ne ev bane, ana şoreşa Sûrî wê biserketane, û ew xwîn bi vê pi rbûnê nedihate rijandin.

9. Destdanîna Partiya Yekîtiya Dîmoqrata (PYD) li ser herêma kurdî bi tenha xwe, karekî raste, an ji ber ku Partiyên Tevera Siyasî a Kurdî bêdeng maye, û calakiyên wan kêmbûne, evê hiştîye ku ev yek çêbibe?

Bersiv: Kêmasiya Partiyên kurdî berçave, lê alavên ku Partiya Yekîtiya Dîmoqrata ji destpêka şoreşê ve pêktîne na yê qebûlkirin, di vêt hemî partiyên me van xalên nelhevîyê çareserbikin, nemaze dijmin li ber derîye û hebûna me hemîyan hejdar (tehdîd) dike.

10. Pirsaw dawî, di dîroka toreyay jinan li welatê Nerwîc de gotinek heye dibêje; Dahênan pêşî, dûra jî nengerîya mirov tê, Fedwa Gêlanî ç di vî warî dibêje , gelo dahênanawê li pêş jî nengerîya wê ye?

Bersiv: Ez ligel vê hevokê me, jî nengerî li cem her kesî heye, lê dahênanî li cem her kesî tune ye, ew bi xwe tiştêkî taybete, dahênanî helawêrdine.

Ji bo min kes, balkêşiya min ewe ku dahênan li cem min gelek be, û têkeve xizmeta karê minê ku min hîlbijartîye.



Arşevê Oskan

*Helbesta Newrozê*

Roja sibê ye newroz bûka demî ye newroz
Çendi xweş û şêrînî çiçek hem mizgînî
Giyanê me hemiyar diki doz û vejînî

Roja sibê ye newroz bûka demê ye newroz
Li bejna welatê me kiraskî dike pîroz
Li qamişlo vaye berbang dide der

Roja sibê ye newroz bûka demî ye newroz
Buharê bi xwer tîne dost û yaran dicivîne
Bêhna gul û binefşan jiyanê dixemlîne

Roja sibê ye newroz bûka demî ye newroz
Saz û govend e newroz çira û find e newroz
Li şeva tarî û reş arê zerdeşt e pîroz

Roja sibê ye newroz bûka demî ye newroz
Kevalkî mezin çêkir navekî ciwan lê kir
Bi govend û bi şadî silavek bo me rê kir

Roja sibê ye newroz bûka demî ye newroz
Xweza bi xwe dixemilîne hêvîya dil diçîne
Tev zinarên kurdistan bera sipî dixemlîne

Roja sibê ye newroz bûka demî ye newroz
Li bejna welatê me kiraskî dike pîroz
Li mehabad jin dibe hêz û huner..

NEWROZ PÎROZ BE

2014

Inayet Diko

Boniye Cegerxwin



OMÎDÊN WINDAYÎ

Omîdên minî windayî
 Vane dîsa li jiyana
 Min vedgerin
 Di nav hizrê min de
 Xwe datînin
 Çî digrin
 Li ber dergehê
 Dilê min aza û serbest
 Vedwestin
 Vane
 Ji derbesta mirinê
 Bi dizî daketine
 Ji kerwanê behî daran
 Xwe veşartine
 Û di nav pêlên
 Seba sipîdê de
 Pêçayî îro
 Li min, xwe digrin
 Bi payebilindî dîsa
 Xwe bi jîn dikin
 Cihê xwe li cem min
 Çêdikin
 De ka êdî delal em
 Xwe Ji nûve, bi van
 Omîdan şabikin
 Ji nûve evîna xwe
 Geş û bi derûn bikin
 Evîn, bê deme
 Bê temen û bê
 Biryare
 Evîn, li her derî


Digere
 Bê sînore, bê cihe
 Bê ware
 Evîn daneke
 Xwezayî, ye
 Deryake firehe, bê
 Dawî, ye
 Pir bi pêle, dijware
 Evîndar tev
 Li ber
 Perava wê
 Radiwestin
 Bi hev mijûl dibin
 Gilî û gazina ji
 Hev dikin
 De ka em jî, wekî teva
 Bi hev Şa bibin
 Bi omîdên xwe re
 Ciwan û geş bi bin
 Jiyana ne tenê xem
 Û giryane
 Ne tenê êşe, ne jî sewşe
 Ne çime, ne çemale
 Jiyana
 Awazekî
 Lave, simfoniyeke
 Rewane, straneke
 Bê dawî ye, pir xweşe
 Pir ciwane, lê îro ji me re
 Êdî pir kur Te
 Û bê samane
 De ka em
 Vê carê jî, xwe
 Bi omîdên xwe re
 Rûpîroz bibin
 Were, da em
 ji nûve bi hêz
 Û bi tund bi bin

Dibî ku EW
 Ji me re
 Pêşerojêke lawaz
 Û bi ewle
 Ava bikin
 Dibî ku ramanên
 Me ji nûve
 Zelal û
 Ronî bikin
 Dibî ku
 Rêça jiyana me
 Bi kulîlkên buharê
 Eragîş bikin
 Were, zû were
 Bi barbanga sibehê re
 Derkeve
 Destê xwe bi ser
 Gul û çîçekan re bi be
 Û bîne
 Hin ji xunava
 Sipîdê
 Bi xwe re
 Ji min re bîne
 Da li ser dêmê
 Xwe y gewezî
 Raxînim
 Ji ser xwe rakim
 Bi carekê
 Êş û azariya
 Were, êdî bese
 Şevên me, tev
 Dirêj bûne, bê ronî ne
 Rojên me jî, kurtin
 Bê ewle û bê hêvî ne
 Bi dilovanî lave û
 Gazî dikim were
 Were, lê ger tu hatî
 Rêça xwe

Hinekî Kurt bike
 Li ti cihê raneweste
 Dereng nemîne
 Bi şepola bayêre
 Zû xwe bighîne
 Sivik were, bilezîne
 Ez li bende
 Te me
 Bi tenha xwe me
 Bendewarî ji nûve
 Pir dijware
 Bendewarî
 Êşe, jare
 Were dîsa, min
 Bi tenê nehêle
 Min netirsîne
 Li ti çîmenî
 Raneweste
 Xwe ne westîne
 Ti gula ji min re
 Ne çine, ne civîne
 Bese, omîdên me
 Yên windayî, vane
 Li me vedgerin, wekate
 Evîna me jî, wê xwe
 Ji nûve, vejîne
 Gulên buharê
 Tevî li me bicivîne
 De were êdî delal
 Nema min
 Bi tenê bihêle
 Ne ma min bitirsîne
 Bi agirê
 Dûriyê Nema
 Min xemgîn bike
 Nema min
 Bişewitîne
 Stockholm 2012-02 -05

Can Kurd

Lawî Kurd im



Ne piçûk im,
Ta nivîsarên evînî hilgirim
Ez ne dîn im,
Bi gulav û kenê rindan nafirim
Jan û nalî,
Êş û talî,
Wek zinaran çêkirim
Lawî Kurd im,
Ez bi lêdana neyarî nimirim
Lê nizanim,
Tu ji Bo çi parçe mayî,
Ey welat..!

Rêberên gel,
Dilbirînin,
Dilşikesin,
Bê xebat...

Rabûne hev,
Wek şivanêd ber çemên Zab û Ferat
Şerme lo,
Evqas nezanî,
Rabe ser xwe ro hilat
...

BERÊ,

Ez dilekî geş bûm,
Zimaneke xweş bûm,
Ji boyî tiya,
Ez cameke tijî av bûm,
Ji bona birçiya,
Sêveke baxê Îrem bûm,
Her dem dayîk û bav bûm...
Welatekî bi navê Mi diya,
Gelek bi deng û bi nav bûm...
Dema tariya, şevreşiya...
Ez çiraxekî tijî zeyt û dohn bûm
Ez ji bona mirovatiyê mûm bûm...
Bi ser min de hatin hêrişên hovane
Ji her aliyekî ve,
Ceng û talan e...
... Ê kuştina zarokan ...
Bû karê rojane...
Herifandin li ber çavên min,

Hemî kelat û kenat,
... Ê herifandin perestxane ...
Hêstir rijyan ji çavên şaristaniyê
Ji her malekê hate dengê şîniyê,
... Ê nalenala mêran e ...
Dilê min î geş, ku wekî dareke henarê...
Di mehên beharê,
Kirin dilekî bê evîn,
Her dem tijî kîn... û pir bi birîn...
... Ê Kurdistan li min Kirin goristan
Li min Kirin goristan
....

GULBAXÊ ŞEHÎDAN

Me dil dafe dîsanî,
Kezeb biryan e dîsanî
Bi hev re tîn dilîfînî,
Şev û bayên zivistanî
Ez û Agrî dinalînin,
Dilorînin ji wêranî
Dikin gazî li ber kêlan,
Li ser goran me dil danî
Li te digrîm welatim ez,
Ji bona te perîşanî
Çi nesrînin, çi rîhanî,
Tu gulbaxê şehîdanî
Xwîna dil dirêjînin,
Li rêka te gelek Xanî
Fîxanên min li gerdonê,
Dizîtin wek çem û kanî
Şeva tarî şemalim ez,
Li ber çavên te Babanî
Hejar û sed wekî Nacî,
Li dergahê te xêzanî
Bi feryadin, bi helbestin,
Bi hawarin, bi goranî
Dixûnin şalûl û bilbil,
Dikin hîvî ji Barzanî
Peya bit ew li nêva gel,
Wekî Bavê Xurasanî
Serî hildin suwarên te,
Wekî seydayê Pîranî
Biçin qada şer û cengê,
Bi rêzanî û mêranî
Welatim carekê dîsa,
Hilîn perda derîzanî

Bêwar Barî Teyfûrî



**ZINDÎYE
NEWROZ**

Zindîne meydan bona niştiman,
Rabûn serhildan torinê Medan
Ji bo azayê gel ê Kurdistan,
Dimeşe tamam bûye şoreşvan
Bo bijî Newroz agir li xwe dan,
Geç û lawên me bûne pêkrewan
**

Bi berxwedana zindîye Newroz,
Bi şeîda gel wê dike pîroz.

Newroz jîna nû ji mera xelat,
Ji Kewa dema ev roja felat.

Agrê Newrozê hingavt Rojhelat,
Bû cejn û vejîn hebûna welat

Remza azayê ev roja evra,
Mizgînê didin bi agir hevra
Suruşt jî şa dibe

Ku tê ev dem, kat
Girasê jîne
Xudike heyat..

Gelê ku bindeste
Di jî bê sînor,
Jîyan jêra dibe
Çawa dojeh, gor

Bedela azayê
Hertim xwîna sor,
Ew nay pêşkêş kirin
Dest fînin bi zor
4.03. 2012.

**NEWROZ E,
NEWROZ**

Bahar hat bahar,
Fesla altindar,
Zindî bûn kubar,
Vejiyan rizgar,
Têk çû koledar,
Aza bûn hejar,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Tune qetilkar,
Didome rozgar,
Ey gelê aldar,
Dîrokî navdar,
Li qada hercar,
Roja nû dîyar,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Ji Kewa xelat,
Roja nû felat,
Jîndarê welat,
Gelê rojhilat,
Kurdin avangard,
Cîhan bû abad,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Cejna azaye,
Bo me evraye,
Ji dema maye,
Îro gel şaye,
Yekbûn rewaye,
Eyda hêjaye,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Mizgînya jîne,
Da niştimanê,
Geç û xortên,
Ê Kurdistanê,
Ketin îlanê,
Gotin cîhanê

Newroze, newroz
Cejna we pîroz

Girtine dîlan,
Hatîn mêhrîcan,
Ewledên kur dan,
Temam şoreşvan,
Bi dil şadîman,
Gotin pir gelan,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Bi serhildana,
Bi qehremana,
Zekîye Alkana,
Mezlûm Doxana,
Bi pakrewana
Didome Newroz,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Bi van şeîda,
Azayê deng da,
Gel pêda-pêda,
Kişîya qada,
Koledar veda,
Jîne silav da,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Kedxar maf neda,
Kurd bûne hêzda,
Roja pîrozda,
Neyar ra doz da,
Jêra gor veda,
Miletê kurda,
Jîne seda da,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Gellek qehreman,
Bona Kurdistan,
Bûne berxwedan,
Bûne serhildan,
Agir li xwe dan,

Ku bijî Newroz,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Bi serbilindî,
Bi navek cindî,
Şeîdên kur dan,
Hemberî dew, doz,
Bûn agrê zindî,
Ku bijî newroz,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Bimire dewdoz,
Tunebe aloz,
Ronahîye tim,
Agirê newroz,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Kurd di be rizgar,
Dibe altindar,
Çawa Hesinkar,
Alt kir sîtemkar,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Zindîne meydan,
Ji bo Kurdistan,
Rabûn serhildan,
Torinê Medan,
Ku bike jîyan,
Netewa kur dan,
Gotin bi dil, can,
Newroze, newroz,
Cejna we pîroz

Bi berxwedana,
Her dijî newroz,
Kedxar bû aloz,
Roja nû pîroz,
Ey gel ê bi doz,
Newroze, newroz,
Cejna te pîroz.
3. 03.2012.

Beyar Robarî

Newroz



Xweş bûne û doze, Newroz
 Cejna azadî û serxwebûnê pîroz
 Bawerî û hêvî û xebat û soz
 Agriê hatî dadan li serê çiyê, poz
 Avakir wî arî, xweş roj New-roz
 Ji ser me rakir zilum û zor
 Bo sersal û sîmbol û doz

Newroz jîn û serxwebûne
 Bi buhahiyê wê, tu roj nîne
 Hemû kurdan berhev tîne
 21`ê adarê, roja şadî û hêvî û evîne
 Reqs û govend û xemil û zîne
 Vê rojê tu kurdekî, li mal nabîne!

Newroza me:

Kawa û Xanî, Qazî û Pîran
 Leyla Qasim, Zîlan û Dogan
 Apê Osman Sebrî, Cîgerxwîn û Bedirxan
 Û reqs û sema û dengê Meryem Xan û Şivan.
 11 - 01 - 1997

KESÊ HÊJA

Kesê hêja ... apê Mûsa¹
 Te xebatkir ey siyasetvanê Kurd, bi salan
 Nûçeya rojan bû navê te, li bajar û gundan
 Lo dilovan!
 Ji Şamê ta Efrînê, axa Kurdistan
 Tu nerevî ji meydan
 Û serî danenî li ber çaş û cendirman
 Ji te re derdbû, azadî û rûmetiya Kurdan
 Û stemkariya xizan û kesên perîşan

*

Kesê hêja ... apê Mûsa
 Zane û dagirtî, wek gulên û nûza
 Camêr û zîrek, lawê Robariyan
 Ked û xebata te, huşyarkirin mirov bi hezaran

Te parast mafê Kurd û xizanan
 Te şandin keç û xortên Kurmancan
 Jibo xwendinê li çûde welatan
 Ji Mosko ta Prag û paytexta Almanan

*

Hêja mam ... mamê Mûsa
 Mamo te xwest Kurd, zanebin
 Hêja mam ... mamê Mûsa
 Mamo te xwest Kurd, zanebin

1

Ne hertim bindestê neyar û dijim bin
 Û çarenûsa wî, lîska destên Amrîka û Rûs bin
 Û bazirganiyê bi pêşeroja wî nekin
 Çi teres û qopikin
 Dêndarê tene, rûpelên dîrok û xweş peyvin
 Xebat û bîreweriya te
 Jibo me, hêvî û bawerî û nirxên bilindin
 Roj biroj mamo, ji armanca te ve em nêzîk dibin.
 05 - 01 - 2013

¹ - Apê Mûsa:

Musa Mehmed Oso, sala 1920`an li gundê Basilê herêma Efrînê - çiyayê Lêlûn ji dayîk xwe bûyî. Ew bi salan li çol û çiyaran dijî. Jiber kû polîs li wî digeriyan, dema yekîtiya navbera Sûriyê û Misrê de û dixwestin wî bigrin û têkin zîndanê . Jiber kû ew endamê partiya komonîsta Sûriyê bû û daxwaza mafê kurdan dikir di hundir vî welatî de.

Malbeta wî hemû mêr dan bi darê zorê û gelek ji wan avêtin zîndanê. Çend pismamên wî polîsan seqetkirin û gelek jî ji kar û dibistanan derkirin . Dixwestin bi vî şeweyî zorê bi din ser wî . Wek tê zanîn, li dawiyê sala 1963 `an bi destê hin sextekaran ew girtin û kirin zîndanê.

Wî di xortaniya xwe de, gelek welatên sosyalîst serlêdan kirin û beşdarî gelek civînên gencên cîhanê bû, bi navê ciwanên partiya komonîsta Sûriyê.

Sala 1955 `an li Poloniya di civînek gencên cîhanê de, wî û Mam Celal Telebanî hevdu nas kirin. Ta dawiya jiyana xwe wî nikanî di ti sazîyên dewletê de kar bikira.

Sala 1962 `an ji partiya xwe bi tenê ew beşdarî hilbijartinên parلمانê Sûriyê bû û namzetiya vî partiye kir. Apê Mûsa meha kewçêrê sala 2007`an koça dawînkir û çû ser dilovaniya xwe.

Beyar Robarî



Bombekirina Heleb

Heleb, ev bajarê şêrîn û kevnar
 Biveşopan, rengîn wek çîçek û buhar
 Bi kela û sûr û xweş bazar
 Hîro tê bombekirin, bi bermîlên barûd û ar
 Bi destên xwûnmij û zikreşên kujdar
 Ji dest dinalin jin û zarok û sewal
 Hawar û nalîna xelkê wê dighê ezman
 Ê kesek nabê, ev jibo we pençek derman
 Ê netê dengê ji Rojava û nejt Ereban...!!
 *
 Heleb, bajarê pêşesazî û hûner û tev jiyan
 Çi Kurd, Ereb, Ermenî, Suryan û Tirkman
 Êzdî, Cihî, Fele, bêbawer û misliman
 Tê bombekirin bi destên segbavên bê wijdan
 Rêjîma Sûrî- mal beta Esed kurê manan
 Wek zincîre hercarê beşek mal tînin xar ...!!
 *
 Heleb, bajarê dêrîn
 Kêm bajar tu kanî wekê bi bîni li cîhan
 Warê Kawakbî, Heneno û Hemdaniyan
 Ew kurdên berî Eyûbiyan li vir kirinî jiyan
 Hîro tê wêrankir bi bermîl û bomban
 Bi destê hov û dirindan
 Mirov dimirin nebiyek û nedehan
 Heroj tîn kuştin, jin û zaro bi sedan
 Tev wê deng netê ji tu kesan ...!!!
 Tu di bêjî belkîm zimanê xwe xwarinî hemiyan
 Çi berpirsyarên Tirk, Ewropî, Emrîkî û Ereban
 Bes difroşîn Sûriyan sozên vala û derewan
 Bi namûstirin ji wan tev, orspî û gewadan
 *
 Gotina min jibo we Helebiyan!
 Berxwebidin xort û dayîk û baban
 Kesek netê alîkariya we ticaran
 Baweriya xwe mekin, bi wan parsî xaran
 Ê baş bizani bin mayîna rêjîma Esed,
 Xerabtire bised caran... sed caran

28 - 12 - 2013

Xorşîd Şûzî

QAMIŞLO...Xelex-1



WA surebayê evîniyê...
 Bi xwere rahêje bîna wê
 Ji bo hezkirin şîbe,...
 Ê xuncê xewan gulav de
 Eger ba û ronî nemediyê bikin
 Tû di mîne dermanê birînan, ...
 Ê kulîlka bexçan
 Wa daxwaziya temenê me, ...
 Ê birîna canê me
 Wa riwê bi xêrûbêr,...
 Ê mizgîniya xweşbûna me
 WA reyhana bînahiya welatê me
 Bihin li canê me çikiya,...
 Ji dûrbûna Te
 Me bêriya Te kiriye
 Ta rawestina mirinê
 Wêneyên teyî mane di çavan de
 Nikarin sax bikin birînen di dilan de
 Ew çî tîreke bê bext,...
 Li qedera me ya kor xist
 Bi rûsariyê hatin pêçan,...
 Hezekê dûrbûna Te
 Bi pêjina te hatin nixumandin, ...
 Evîndarên Te
 Xewnên xwe wînda Kirin
 Ji berdana zemînê Te
 Nema li cem wan j, bilî, ...
 Bîrarîna Te
 Çiqa buhaye axa Te
 Li cem zariwên Te
 Seyda yê helbestvanan Cegerxwîn..
 Xwest bînce şîrava te..
 Ê yekîtiyê girêde...
 Bi zemîna Te
 Ji mafê teye ti ji me bipirse:
 Çawa we dev ji min berda! ...
 Ê ji bîrkirinê re ez hiştîme!
 Ma we canê xwe firotiye, ...
 Di koşka pêrepindan de ?!
 Ta hûn ji dev min berdin, ...
 Bi bazdan û hisbûn?!!!

Kovan Kenho



Bi bin yek

Kîs serokê me kurdane
 Berzaniye û ocelane
 Kî rêberê me kurdane
 Berzaniye û ocelane
 Gelê kurda tev bibin yek
 Û PIŞTgiriye bidin wane
 Apo û berzanî di Şêrin
 Qedr û qîmet bi din wane
 Bidil xweşî û bidil geşî
 Sirûda bêjin ser wane
 Liser herdû Şêra bêjin
 Awaz û helbest û stirane
 Di bendiyê ji mer çê nekin
 Herdû stêrin li ezmane
 Gul û sosina bidin destê
 Pêşmerga û gerîlane
 VA yepekê vayepêjê
 Cane xwe Kirin qurbane
 Gelê kurda ûn Şerim nakin
 Ji xwîna va qehremane
 Şerê biratîyê nekin
 Nebê Kî berxe Kî berane
 Herdû Şêrin jîr û zêrin
 Xurt bikin biratîya wane
 Heger ûn bê yek ji warihe
 Zanibin yê dê jî cane
 Go tine vala nebê Jin

Ji ber her dû dibirane
 Pir mezinin li ber çvê min
 Herdû weka diçiyane
 Ji bê tifaqiya di nav me
 Em li werê xwe windane
 Bese îdî Şerme jimere
 Şerê li civet û kolane
 Nbêjin emin yê rast
 Û em ketina nav nezane
 Bi yek dengî bihevre bakin
 Yekîti ji mere der mane
 Bi yekî tiya miletê me
 Wê rizgarbê welatê me

Adar

EY DAR GULA MEYI RENGÎN
 RENG JI TE ÇÛ BÛYE JÎN
 MISK Û EMBER TIM JI TE
 BUHAR ÇIHAN BITE ŞÊRÎN
 GELKÎ KÛR BÛNE RAYÊ TE
 PEL GIHAN EZMANÊ ŞÎN
 LI DINYAYÊ BÛ ŞEWQATE
 HEWÎR DORÊ TE BÛ ZÊRÎN
 EM NÊZÎK BÛNE JI TE
 TU RINDIKA NE BARÎN
 SITRIYA JÊKIM JI DORA TE
 ŞÛNDE DEYNIM DARÊ ŞÎN
 AVA ÇÊM BIGIHÊNIM TE
 GERIM LI SER TE QET NEMÎN
 HEGER XILASBÛ AVATE
 EMÊ TE AVDIN BI XWÎN
 ZORDAR QUT BÊ JI BÊHNATE
 EW WÊ BÊHNÊ HEW DIBÎN
 ÇIHANÊ GEŞBÊ BI TE
 WA DAR GULA MEYI RENGÎN

Dotmam

Dotmama mi WA felatê
 Waçav reşê nûxelatê
 Ti wek gula li civatê
 Sebir û hedan bite hatê
 Mi di xwest ez Te bixwazim
 Da e bidilê rihet razim
 Dûrî tebi m ez di kazi m
 Nêzîk bûnê ji Te dixwazi m

Mi go mamo ka qîzate
 Berê mi ketye malate
 Gote mi lawo qîz gihate
 Sed pîroz bê ji bonate
 bavê felatê axaye
 ji got naxwe vegeyaye
 Dibê ez qîzaxwe nadi m
 Kurê Meta wê hevaye
 Heger hebane male mi
 Wê qî bi kêf dabane mi
 Lawik kiriye pêşiyê
 Jibo dot mamê nedê mi

VA kir her dem kiryê mi tê
 Nedan mi û ne kurê metê
 Ez xistim nava hisretê
 Heta roja qiyametê



Sernivîs

Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê

Xorşîd Şûzî

Desteya birêvebir

Abdilbaqî Huseynî

Ezîz Xemcivîn

Lawîn Şêxo

Pîr Rustem

Derhêner

Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhemên kurdi:

kurdi.penusanu@gmail.com

Jimarên "Pênûsa Nû" Tev ji vî Emêlî derxînin:

www.penusanu.com

